



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 8 Hejmar - 41
Adar - Avrêl 2012

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Editor - Redaksiyon
Feratê DENGİZİ- Omer FİDAN

Mizanpaj û Berg:
Elihan LORAN

Wêneyê Bergê
Paşa ÎMREK

Şêwirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: +90 412 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiye
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê IBAN'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Serpêhatiya çîrokê - **Îlhamî SÎDAR** / 3
- Xew û hiş-yarî - **Welat DILKEN** / 7
- Dilketiye - **Azîz NESÎN** / 8
- Ke ti şêrê rijiyeno no şaristan - **Ahmet TELLÎ** / 11
- Allah-û ekber - **Amed ÇEKO JİYAN** / 12
- Hikaye - **Ayhan MERETOWAR** / 15
- Tiliyên bi taya jibîrkinê ketine - **Evin ŞIKAKÎ** / 18
- Bêritan - **Îlhamî OZER** / 19
- Rabin - **Kamran SIMO HEDİLÎ** / 20
- Gelo çima - **Rêzan NAS** / 21
- Holik - **Berfo BARÎ** / 23
- Destar - **Feratê DENGİZÎ** / 24
- Rojek ji van rojan - **Gabriel Garcia MARQUEZ** / 26
- Meşa dereng - **Robert FROST** / 28
- Keça serhildêr - **Çekdar SAVÛR (Dogan AYDIN)** / 29
- Dilawer Zeraq - **Berken BEREH** / 30
- Ji helbestên lerzerdê - **Sidiq GORÎCAN** / 31
- !-;...(),.?":' - **Îmad BERNAS** / 32
- Dosye - **Wênêkêşîya kurdan** / 34
- Kurtenêrînek li ser dîroka wênêkêşîyê li Kurdistanê -
Dêrsim OREMAR / 35
- Paşa Îmrek: wênêkêşê 'Deq'an - **Hevpeyvîn bi Paşa Îmrek re** / 38
- Di bin siya dîrokê de Kurdistan- **Mehmet Masum SUER** / 40
- Dîrokî wêne le Kurdistan - **Rênas NEWROZÎ** / 41
- Wênêkêşîya Kurdan û çîroka 'em ên winda' - **Veysi ALTAY** / 43
- "Wêne cemidandina demê ye" - **Hevpeyvîn bi Mehmet Masum SUER re** / 45
- Wêne ji belegeyeke mang û sakîn ta bînahiyeke tevgeran e -
Teymûr EVDIKÊ / 49
- Berken Bereh, helbestkarê ku evîna xwe bêcîwar nahêle -
Dilawer ZERAQ / 54
- Hesretên "tu li ku yî" - **Rêdûr DÎJLE** / 58
- Demsala xeyalan - **Ehmed BELEK** / 59
- Bêdengî qêrîn e - **Salih BADILÎ** / 60
- Tûzik- **Omer KURT** / 64
- Sanikê binî dêsî - **Îsmail GUVEN** / 67
- Sêvê - **Tahir URPER** / 70
- Lawêsîna kevokan - **Kurdjan SORÎ** / 71
- Ez Cizîr im, dayîk im - **Bahadîn ROBAR** / 73
- Gola xezalan - **A.Selam BARAN** / 75
- Dengvedana heyamekê - **Şivan ZEREN** / 78
- Xaçpîrsa dengbêj û dengbêjiyê - **Hîlmî AKYOL** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji edîtor

***Xweşgotinek zarokîn coşiya bihara azadiyê û diyarî we ye;
Lovka piso,
Nan gariso,
Dergistika Hiso,
Wer(e) ji mi(n) re...***

Bila azadî bê ji me re... Adar û bihara kurdan mişt dagirtî ye; wek jiyana wan ku her tim li benda jîndarî, bişkuvîn û vejînê ye. Ligel êş û azaran û ligel sar û seqemê berê me li biharê ye. Bihara dilan û ya azadiyê... Her çiqasî zivistana bêar û qeşaya reşemiyê dixwaze hêviyan bicemidîne jî, evîna azadiyê ew ê tevayê cemedan bihelîne û dil û mejîyan bi tava pîroz germ bike.

Bi hewldanên xwendekar û evîndarên Wêjeya Kurdî Kovara W(e) ji çilê xwe derket û edî li hember jiyana dijar bihêztir û xurtir e. Ev evîn wê leza ciwaniya wêjeyê hêjatir bike. Berê me li Newrozê ye, li sersal û pîroziyê ye. Ji niha ve dilê ciwan bi germahiyê vedije.

Wêjevanê hêja, kedkarê Kurdî Evdila Warli û wergêr û nivîskarê navdar ê kurd Îbrahîm Yunisî çûn ser dilovaniya xwe, em sersaxiyê ji malbatan û wêjehezên kurd re dixwazin û dibêjin bila ciyê wan bihuşta baqî be. Domdariya xebatê ew ê sozdariya mîrateya wan be. Dîsa em komkujîya Helepçe û komkujîya 12'ê adarê ya Qamişloyê şermezar dîkin.

Û Newroz hat!

Bi hemû kelecana, hêbet û agirê xwe tîn da me, agirê dilê me geş kir. Agirê vê Newrozê bû kujerê tirsê û banga dilê gel, banga dilê kurdan a azadiyê ji Amedê berz kir, kir qîrîna azadiyê û bû lehî ku êdî pêşî lê nayê girtin. Dilê azadiyê bi nêzikî lê dixê.

Em 21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayikê yê Cîhanê, damezirîna Akademiya Zimanê Kurdî ya Ehmedê Xanî ya Amedê pîroz dîkin. Akdemî li ser xêrê be û bi hêviya ku kurdîhez ji dil û can lê xwedîbin... 8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê, ligel hemû zordariyan, bi hêviya azadiyê, pîroz be. Dîsa bi germahiya kurdewariyê bi ya Konferansa Ziman a Neteweyî, dilgermiya biharê û hêviya yekîtiya kurdan û dilcoşiya Kongreya Netewî;

Newroza we Pîroz be...

Ev Newroz, Newroza azadiyê ye...! Newroza Jiyanî û Jiyana Newrozîn...

Em dixwazin jiyan bi dilê we be û afirîna wêjeya me canlîdar be; bi vê hêviya Newrozî em li benda hêzdayîn û xebatên we ne...

Mijarên dosyayên me li benda ked û xebatên we ne; li gorî bernameya me;

* Ji bo hejmara Gulan & Pûşberê, mijara dosyeyê **Hevrêtiya Pênûs û Firçeyê; Fewzî Bîlge** ye, amadekarên vê dosyeyê Berçema Mişrîtan (berchema@gmail.com) & Kovara W ne.

* Ji bo hejmara Tîrmeh & Gelawêjê, mijara dosyeyê **Cizîra Botan** e, amadekarên vê dosyeyê Kovara Hawara Botan (kovarahawarabotan@hotmail.com) & Kovara W ne.

* Ji bo hejmara Rezber & Kewçêrê, mijara dosyeyê **Sînemaya Kurdan** e. Amadekarên vê dosyeyê Akademiya Çand û Hunerê ya Aram Tîgranê & Akademiya Çand û Hunerê ya Cegerxwînê & Kovara W ne.

Da ku peyv û heyva me hilê...

Serpêhatiya çîrokê

Îlhamî SÎDAR



Em bi hêsani dikarin bêjin ku serpêhatiya çîrokê bi serpêhatiya mirovî re di heman cihokê de diherike, lewra ew kesên ku hêj di heyama “nêçîrva-niyê” de dijiyan, gava serpêhatiya nêçîrên xwe ji hev re vedigotin, di esasê xwe de çîrokek dihonandin. Bi vî hawî destpêka çîrokê diçedemên berê ku hêj nivîs nehatibû kifşkirin, lewma jî her çiqas çîroka îro, ji bûyer û aksiyonên dûr bikeve jî, tu car jî mirov û ji serpêhatiyên mirovan serbixwe nayê ravekirin.

Helbet çîrokên berê ne xwedî pergala û sazûmanekê bi rêk û pêk bûn, ev yek cara ewil di çîrokên ajalan ên wekî “Pança Tantra”yê Hindî, ku bandora xwe ji fablên Aisopos bigire heta fablên La Fontaine-yî nîşan dabû, hate avakirin. Ev çîrok li rojava bi navê Kelîle û Dimne bandor da, piştî em rastî “Çîrokên 1001 Şev”ê hatin ku, ev ne bi tenê li ser çîrok û romana rojhilatî, lê di heman demê de di çîrok û romana rojavayî de jî bûbû xwedî bandoreke mezin. Îroj heke Edgar Allen Poe henaseya çîroka xwe bi şeweyekê postmodern li ser hîmen “Çîrokên 1001 Şev”ê ava kiribe û heke îro em di wêjeyê de qala surrealîzm û postmodernîzmê bikin ev yek teqez bi van çîrokan ve girêdayî ye, lewma ew kesên ku dil hene dest bi nivîskariya çîrokê bikin divê her deh cildên van çîrokan bixwînin û ew jî xwe re bikin nexşerê, çawa Poe ev yek bi dîlnîzmî kiribe, divê em jî bikin.

Heke em berê xwe bidin destpêka çîrokên nivîskî, em ê ewil laqayî “Decameron”a Boccaccio û “Çîrokên Canterbury”a Caucher werin. Jixwe em dizanin ku, li ber Boccaccio minakên weke dastanên “Aeneas”a Vergilius û “Komedyaya Îlahî”ya Dante hebûn. Dante Allighieri zimanê italî jî bindestiya latinî xilas kiribû û wê bi rêkûpêk kiribû, ev yek jî ji Petrarca û Boccaio’yan re rê vekiribû, ji ber vê di hîmê çîrok û romana rojava de Dante ciyekî giring digire û divê di cîkirina çîrok û romana nûjen de ev yek jî ber çavan neyê dîrxistin. Bi rastî li vir minaka balkêş jî “Decameron” bêtir “Çîrokên Canterbury” ye. Geoffrey Caucher, ku ligel Milton û

Shakespeare damezrênerê wêjeya Îngilîsan bû, çîrokên xwe bi forma “çarçove-çîrok”ê û bi awayekê helbestî rêz dikir. Ev form di bingeha xwe de teşeyekê rojhilatî bû û bi koka xwe digihîşt heta destnîvisên Misrê û çîrokên Hindê yê berhemên wekî “Pança Tantra” û “Çîrokên 1001 Şev”ê. Di vê warî de em dikarin bêjin ku bandora Ovidius jî li ser Caucher û Boccaccio çêbûye, lewra wî di “Metamorphoses”a xwe de vê formî berî wan bi kar anîbû. Caucher xwedî hunerekê û xwedî vegotineke bi di-siplin bû, ji keleşor û daneheva serdema navîn sîde wergirtibû û bi sentezekî li gor hunera xwe uslûbeke resen ava kiribû.

Herwiha çîroka nûjen pêngavên xwe yê herî mezin di sedsala 19’yan de avêt. Ji ber zêdebûna rojname û kovaran, nivîskar berê xwe bêtir dabûn çîrokê, lewra çîrok di rojname û kovaran de bi hêsaniyê dihate weşandin. Jixwe cudahiya novel û kurteçîrokê jî, wê demê derkete holê. Di vê serdemê de Li Fransa Maupassant, li Rusya Çexov û Gogol weke hosteyên çîrokê derketin pêş.


Çîrokên ku Maupassant lê dikirin wekî çîrokê bûyerî ango klasîk dihatin navandin; klasîk lewra bi teybetmendiyên xwe yê bingeşîn ji çîrokên berê venediqetîyan, bes bi şeweyê vegotineke nû ji ya berê cudatir bû. Tevî her tiştî Maupassant di riya nûjenîyê de gaveke mezin avêtibû. Di şewaza Maupassantî de bingeşa çîrokê jî bûyer, çîrok û entriqayên pêk dihat. Çîrok li dor bûyereke sereke geşedida, vehênan li ser disîplîna “destpêk-girêce-nam”ê ava dibû û çîrok xwe bi anasîrên weke stres, heyecan û meraqan li ser piyan disekinand. Di vê nêzîktêdayînê de fikara “çi vegotin” derdiket pêş, fikara “çawa vegotin” ne giring bû. Di vê qonaxê de nêzîktêdayîna Çexov bîr û boçûnên berê jî binî ve hilweşand. Bi rastî jî wî bi şeweyê vegotin û bi honandineke cuda di çîroknivîsiyê de nêzîktêdayî-nên berê serobino kiribû. Di kurteçîrokên Çexovî de cudahiya herî mezin çîrokan ji serdestiya bûyeran xelas kirin bû. Di çîroka klasîk de dînamîkên sereke bi her awayî bûyer û honandina bûyeran bû.

Kurteçîrokên Çexov rû nedida van dînamîkan; jiyînên jirêzê, jiyînên demî, rewşên rojane, rewşên cuda cuda yên mirovî, li ber herikîna jiyanê û li ber rapêçana subjeyan bertekên mirovî, derbirina ruhî navenda nêzîktêdayîna wî pêk dianî. Di vê şêwazê de çavdêrî, stres û bibîrxistin derdiketin pêş, rewşên ku di jiyînên rojane de mirov her gav bi wan re rûbirû dima dihate honandin. Bi kurtasî jiyînên mirovan û derûniya wan derdiket pêş. Bi vê yekê re disîplîna klasîk “destpêk-girêk-encam” jî dihate terikandin û çîrok berê xwe dida rewşên derûnî a mirovan. Di cihê vegotina bûyeran de vegotina, “dem”an û “helwest”an derdiket pêş, di encamên çavdêriyan de helwest û bertekên ku dihatin nîşandayîn, navenda vê çîrokê pêk dianin. Bi saya vê pêşketinê jî xeynî çîrokkirinê “estetîk” jî dibû pirseke sereke, lewra çîrok êdî ji qonaxa “çi vegotin”ê derbasî qonaxa “çawa vegotin”ê bûbû.

Gava Gogol, bi “Sako” û “Bêvil” derkete qadê, li wêjeya cîhanê rengêkî din ê cuda çirûsk veda. Piştî ku Akaki Akakiyevîç “sako”ya xwe li xwe kir û derkete kuçeyên St. Petersburgê, çarenûsa çîrokê jî bi xwe re guherand. Bandora ku “Sako” digel edebiyata Rusî, li ser edebiyata cîhanê kir meteloka Dos-

toyevskî ya “Em giş ji “Sako”ya Gogolî derketin.” diçespond. Cudahiya Gogol lêhûrbûna wî ya li ser enîvîsa “mirovên biçûk”bû. Heta wê demê kul û derdên mirovên jirêzê di çîrokê de ne xwedî giringiyekê bû. Berê, lehengên çîrokê bi gelemperî ji nav kesên bijarte, kesên payebilind, arîstokrat û kesen ku di civakê de berbiçav bûn, dihatin hilbijartin. Gogol bi nêzîktêdayîna xwe ev rêbaz xera kir. Piştî Akakî Akakiyevîç, çarenûsa mirovê biçûk, êdî li edebiyata Cîhanê bûbû bûyereke giring. Jixwe ez bi hêsanî dikarim bêjim ku, Gregor Samsa jî sîtaveke Akakî Akakiyevîç bû (Dibe ku ev tespîta min ji xwendevanan re hinek xerîb bê, lewra heta îro tesbîteke wiha nehatibû kirin. Ez di vê tesbîta xwe de bi israr im, bi israr im û dixwazim bi vê yekê gotina xwe ya destpêkê “serpêhatiya çîrokê bi serpêhatiya mirovî re di heman cihokê de diherike” biçespînim.) Akakiyevîçê ku di nav pergala burokrasiyê de hatibû eciqandin û bêkesayetkirin û bi şûn de jî bi mirineke trajîk li kolanên St. Petersburgê veguheziyabû xeyaletekê, di pêvajoyê de bi navê Gregor Samsayî derketibû pêşberî me. Samsayê Kafka jî wekî Akakiyevîçê Gogol di nav pergala burokrasiyê de kesekî ku di nav çerxa jiyanê de bûbû diranîtek û ew qas hatibû bêkesayetkirin ku dawîya dawî veguheziyabû kêzîkekê, xeyaleta Gogol bûbû kêzîka Kafka, jixwe tekamûla çîrokê heya îro her bi vê awayê bûye.

Maupassant bi şêwe û vegotina xwe, di derbirîna rewşên ruhî de gelek cuda û serkeftî bû, lê ji ber ku çîrokên xwe li ser bingeha bûyeran dihonand, li cihekî ma. Şêwaza ku xwe gihande heta îro bêhtir li ser hîma Çexovî geşe da. Sedemên vê yekê pir in lê ya herî giring jiyan bixwe ye, pêvajoya diroka civakî ye. Ji ber ku serdema endustrî û kapitalîzmê di jiyana mirovî de bi lezeke stêrkî veguherînên mezin pêk dianî, mirov hêdi hêdi li derveyî her tiştî dima. Ewîl makîne û piştî jî alav û amûrên teknolojîk, her çû insên bi keviyê ve dehf da, ji navenda pergale bi dûr xist. Berê bi alav û amûrên xwe xwezayê xistibû destê xwe, lê piştî kapitalîzma hov digel ajal û nebatan ew bixwe jî bûbû amûreke pergale (weke lehengên Kafka.) Bivê nevê insanê ku ji navenda jiyanê dûr diket didît ku tevî dorhêla xwe bi rapêçandinên pergale, di esasê xwe de li vê dinyayê bi tena serê xwe ye. Eve çîroka îro jî ev çîroka insanê ku bi tena serê xwe maye ye, lewma îro tu çîrok naşibin hev, lewma îro di çîrokê de şêwe û şêwazên ji hev pir cuda dertên holê. Çîrokên berê bi gelek awayî dişibiyan hev, lewra bîzavên insanen bêhtir li gor pergala civakê dimeşîya, her kesek elementekê civakê bû û hema bibêje bi heman perspektîfî li bûyeran dinihêrt. Bajarên mezin mirov di xwe de heps nedikirin, qadên jiyanê



berfirehtir bûn, têkiliya karkeran bi karkeran re, rewşenbîran bi rewşenbîran re, têkiliya her kesî bi hev re gelekî xurt bû û kesî bi hêsanî xwe ji civakê tecrîd nedikir, insan nezi hev bûn û lewma jî dişibîyan hev. Lê ka iro em li dora xwe binêrin; insan çiqas ji hev dûr ketine, jixwe tu pêdiviya parvekirinê nemaye; kompitûr, televizyon û medyaya civakî kes ji hev veqetandine. Di vê aloziyê de yê ku êşê dikişîne dibe nivîskar, nivîskar êdî bi tenê dikare çavênîya xwe bike, ji jiyanê kerixiye, bi çavekî cuda li jiyanê mêze dike bi çavekî biyanî û yan wekî Kafka li xwe diqufile, yan wekî Camusî takekesekî bi tena serê xwe li berxwe dide, yan jî wekî Woolf, Plath û Pavese destê xwe ji jiyanê dişo û çîroka xwe ya dawîn dinivîse. Ew kesên li keviyê, yan jî li qunca xwe li jiyanê mêze dikin ne mumkin e ku merezoyî nebe, çîroka îro, ji ber vê merezoyî ye. Ji ber teslîmbûnê, ji ber radestîbûna pergalê, rika insanê hestiyar ji mirovan diçe, carinan dixwaze wê tune bike, carinan gunehê xwe pê tîne û li xwe vedi-gere, bi piranî li xwe dinêre, xwe hûrhûrî dike û hêviya xwe ji vê insanê qut dike (dibe ku ev jî teslîmbûnek be, an jî hêsanîyek), têkiliya xwe bi subjeiyên dorhêla xwe, bi ajalan û bi nebatan re xurttir dike.

Pîvanga awêneya çîrokê ji ya romanê biçûktir e, lewma heya ji dest tê derfetên ziman bi asteke bilind bi kar tîne, bi vê rengê xwe nezîkî helbestê dike, îroniya balkêş li vir ew e ku çîrok fonksiyona xwe dewrî romanê dike û diçe li dora helbestê digere. Di hîn minakan de çîrok di aloziya vegotinê de ewqasî winda dibe ku ji mirov tirê çîrok tu tiştî venabêje. Beckett jî ji wan hûtan e ku mirov weke Godot li bendê ye ku bila tiştekî bibêje, lê tu ciyawaziya vê bendemayînê, ji bendemayîna Karl Rossman tune ye, dawiya dawî mirov pê dihise ku mebesta wî ew e ku ji me re tiştekî nû bibêje. Belê pîrsgirêkê sereke ya çîroka iro şeweya vegotinê û honandina zimên e, weke ku di pirtûka Silêyman de jî tê gotin, "Li ser rûyê erdê tiştekî nû tune ye." Nexwe mesele, ne gotin, lê vegotin e. Vegotineke nû, çîroknûs li pey vê ye, lê forma çîrokê cî lê teng dike ew jî lewma xwe li helbestê digire û ji helbestvanan rol didize, ji ber ku helbest bandora xwe ya qedîm her diçe winda dike, li ber êrişên çîrokê nikare li ber xwe bide û her diçe bi qorziya xwe ve vedikişe. Çîroknûsê îro hewl dide ku têkiliyên girîft û berfireh bi tevahiya xwe veçirîne, li vir jî bêgav xwe dispêre zimên, lewra tenê zimên dikare bi dinamîkên xwe, têkiliyên vê serdemê yên tevlihev ji hev veçirîne û ev ziman teqez ne zimanê dengbêjan e û ne yê Maupassant û Çexovan e jî. Ziman organizmayeke zindî ye ku kemilîna xwe bi kemilîna hiş û ramana mirovî re muwazî dimeşîne û weke ku me




berê jî gotibû hiş û ramana îro bi çarmedorên xwe girtî ye; têkiliyên çêkirî jiyanê ji her alî ve dagir kirine, qadeke xalî nemaye, tenê stareyek maye ji afirîner re, ew jî şikefta kakilîn a mirovî bixwe ye, eynî weke roja ewil mirov disa li şikefta xwe ye, dê diwaran xêz bike, tenê bi fêrkekê ku tûrê wî/ê bi têra xwe tije ye, ji tabletên Sumerîyan bigire, papîrûsên Misrê, heya pirtûka Musa û "MS. Found in a Bottle" (Destnivîsa ku di Şuşeyê de Hate Dîtin) a Edgar Allen Poeyî bi tecrûbeyên dewlemend xemiliye. Ji xwezayê direve, li xwezaya xwe vedigere, lewra xweza weke ku Baudelaire angaşt dikir bi têra xwe cinawiran afirandiye, mirov tu teqet nemaye ku li ber xwe bide, bi rastî xwezaya mirov jî ji van cinawiran para xwe hilgirtiye û xesirîye, lê ev xesirîn bi xwe derfeteke bêhempa pêşkêş dike, bi tecrûbeyan sabît e ku, hişeke şîlo ji bo afirineriyê bêtir guncav e, hişeke zelal vekirî ye, mirov li pey lêgerina naxîne; ew hişê xesirî di nav tevliheviyan de carna riyên wisa nuwaze kifş dike ku nivîskar bixwe jî li xwe heyirî dimîne, weke ku qudreteke îlahî pê dabe nivîsandin. Ev jî nîşan dide ku li vir a giring ne heqîqetên dinyayê, lê îdraqkirina wê ye. Çîrok di vê macerayê xwe de rêwitiya zimên a hundirî xweş nîşan dide. Bes ez ê pasajek ji Sema Kaygusuz ku li

ser welidandinekê hûr dibe bigirim ku ev tesbîtên me çawa şênber dike, “Jinên ku hêkên wan mirî ji ber wan diçin. Hundirê wan mirî, laşê wan zindî. Wekî ku tu giyan nikaribe bimire, wekî ku hemû qalikên hişk nikaribin giyanekê nermîn ji dinya-yeke bizinar biparêzin. Dibê qey bes bi welidandinê pêk tên giş. Jin, jin... Keçên dendik stewiyayî ên li ber siya darhejirên nêr ên fêkiyê wan xav û bi şîrên jehrînî tîr firkandin ku bi tu awayî nikarin biwelidînin.” Eşkereye ku nivîskar vê vegotinê ne li gorî zagonên xwezayê lihevaniye, ev vegotinê berhema hişke xesirî ye, digel idraqkiri-neke takekesî, tûrê xwe bi tecrûbeyên ji Sappho û vir de heta dev tije kiriye. Jixwe ziman bixwe ye ku van elementan giş li hev tîne.

Belê çîrok ji xwe re riyeke nû vekir, ev rê jî xwendevan û çîroknûsan kir yek, îro ew kesê ku dixwînin giş dinivîsin jî, di navbera xwendevanên klasîk û çîroknûsan îro de mesafeyekê berbiçav pêk hat. Di nav vê cîhana îronîyan de her kesek çîrokeke xwe ya seyr heye, bingeheke xurt derfeta nivîsandinê dide her kesî, pirs di afirandinê de ye; her çiqas şêwe jî hev cuda bin jî weke ku dubarekirinek xwe bide der: bîranîn, demên destkeftî, binehiş, jiyînen li hev qelibî û hurgilî, hurgilî, hûrgilî... Jixwe ev jiyana vê demê ye, lewra bi xwezayî nujenîyekê ava dike. Çîroknûs ji roja ewil heya îro tim li pey lêgerinan bûye, li pey teşeyên nû, dengên nû li pey derfetên nû ketiye, ev jî kiriye ku çîrok bi rêbazên nû bêrawest xwe veguherîne. Ji Mupassantî bigire heya Çexov, Gogol, Poe û Borgesî her yek bi rengên xwe çîroka cîhanê bi pêşve birine. Maupassant zor da derfetên çîroka klasîk, bi vegotînekê cuda riyeke nû vekir; leheng, bûyer, cih û dem bi lêhûrbûnekê hesas li hev anî û li paşxaneyê çîrokê felsefeyekê ava kir. Çexov bi şoreşekê edebî bûyer û demê daxiste asteke minimal ev jî kir ku çîroknûs bi awayekî kûr li ser çîrokê hûr bibe, bi çavdêriyan, bi bîrxistinan, bi stresên navxweyî, riya çîrokê ber bi aliyekî tîkel ve kaş kir; jî alî din jî xwerûtiyek, sadetiyek anî çîrokê. Beckett awayê Maupassantî bi teknîka macerayên hundirîn bipêşxist. Joyce bi “Dublinî”yan re bû dengê bajarên lixwe qefaltî, trajediya kesên ji rêzê di çarço-

veya “lixweqefaltin”ê de derbirî. Borges bi dengê otantik çîrokê bi tarîx, felsefe û bi daneheva edebiyatê re xemiland, Kafka jî tengavî û bêçaretîya insan-kan kaosekê ava kir. Di vê pêvajoyê de jî çîroknê “klasîk” ber bi aliyê çîroka “helwest”ê, jî çîroknê “portre”yî ber bi çîroka “razber” û heya çîroka “derbirîna hiş” û ceribandînen pirdengî û postmodern bi awayekê gellek berfireh geşe dane.

Bi kurt û kurmancî em dikarin vê bêjin ku, cîhan çiqasî bi pêşve diçe insan jî ewqasî jî xwe dûr dikeve, jî rih û giyanê xwe dişiqite û dibe elementekê mekanîk a sazûmana jiyane. Ev jiyana a kê ye, ev jiyana ku di esasê xwe de bi tu awayî naşibe kakilî insan-bila kesekî heyirî nehêle, lewra tekamûl baqî ye; insanê ku di pêvajoya hebûnê de jî bakteriyên yekçavî veguheziya teşeya xwe ya îro, wesfên xwe yê bingehî her bi pêşve dibe û ev pêşveçûn insên jî nixrên xwe yê kakilî dûr dixê. Tirsê min ew e ku rojek bê em xwezîya xwe li Gregor Samsayê jî bînin, lewma bila kes gîlî û gazinan jî çîroka îro neke (Berî her kesî ez bi xwe, lewra ku ez hinek giyanperwer im, yanî ligel ewqasî zanîne helwestekê min a hişk li ber di-yalektîka nivîsê heye, weke li ber kemilîna gerdûnî bi hewldanên bêxude li ber xwe didim, weke Don Kişotê ku li ber heyameke xerîb û biyanî, xwe li heyamên berê digirim) û bila kes ser-pêhatîya Mirze Mihemedan jî nepê, mixabin ew li rez û parêzan man û rez û parêz jî di nav pêt û agiran de. Weke ku Heraklîtos jî digot “Di heman avî de du caran soberî nabe.” Ji bo çîroknûsiyê jî ev rêbaz derbasdar e, “Heke dem gavên xwe li gorî te neavêje tu mecbûrî gavên xwe li gorî demê biavêjî.”



Xew û hiş-yarî

Welat DILKEN



(Malbat)

Di hûrguliyên de nixumandiye rastiya rastiye
Dil maka hestan, mejû bav
Di canî de razaye, navnîşana dapîr û bapîrê rastiye

(Berbang)

Xewna di şevê de razayî, perdeya lîstika xwe kişand
Berbang, bi şiyarbûna rojê re hîlbû ser xwe û got:
Of! Çi şeveke pir tarî, pir xewgiran bû
Xewneke soravî bû; “dengê dilopan, şîp şîp şîp dibariya
Ser zeviya şeva xewkêş”

(Şev)

Bêxewê di xewnê de serhişk bû, rikdar bû
Qey pir binketiyên xwe hebûn
Pir dixwest, ku di vê olîmpiyada dilop jimartinê de
Jixwe bide jibîrkin din

(Xewkêş)

Bi berbangê re hîlbû ser xwe
Gavekê re xwe avêt ber deriyê der
Li ber deriyê der qiriya, bi hundir de, bi der de çû û hat
Bû nasnameyeke bêdeng
Li ber çavên wî, ji dilopên baranekê pirtir dilop
Ji sorîniya xwînekê sortir sor
Ji tazîtiya bedenekê, tazîtir tazî

(Totî)

Li ser koka darê, deng ji titûn tehlîr
Rastiyeke tehl, bersiva qirînên xewkêş

(Dîrok)

Ji vê xew û xewnperestiyê û hişyariyê
Axeke ku ew bi pê de herin, nema êdî
Ji xeynî binê axê

Dilketiyê

Azîz NESÎN *Ji tirkî werger: Şêxo FÎLÎK*

Yê mirî ew bû, yan ez bûm? Ew ê di behrê de xeniqî û mirî ji me kîjan bû? He ku niha ez dikarim van tiştina bifikirim, nexwe ew ê pencî û çar salan berê di behrê de xeniqî divê ne ez bim. Xeniqîna wî kurikî niha bi min çiqas tiştekî lê şaşmayî û bi êş tê. Li ser rûyê erdê, tu kesî ku wî nas dike wê nemabe. Ne zewicî bû ku zarokên wî hebin û wî bi bîrbixin. Dê û bavên wî jî wê ji zû de ve miribin. Wê li ser rûyê dinyayê ji bilî min tu kes nema be ku wî kurikî bi bîrbixe. Ê min jî, navê wî jî nema tê bîra min. Belkî wê çaxê jî min navê wî nadizani. Lê a niha bi hemû lewendî, xweşikî, bi rûkeniya xwe ya tim û dayîmî û bi laşê xwe yê atletîk ve li ber çavên min e. Ku ez jî bimirim li vê dinyayê tu kesî ku wî dizane û bi bîr bîne wê nemîne. Li ser navê yên li vê dinyayê naskiriyê wan nemane û li ser navê yên ji vir pê ve wê naskiriyên wan nemînin, wî bi bîr tînim.

Ez di pola yekem a dibistana amadehî de bûm û ew di ya dawîn de. Nexwe du salan ji min mezintir bû. Li dibistanê, em bêhtirî hezar xwendevan hebûn. Ji nava ew çend xwendevan de min ew ji xwe re mînak wergirti bû. Lewre ew yê zîrektîrîn pola xwe û belkî jî yê dibistanê teva bû. Yê werzîşvantişîrîn dibistana me bû. Wî pê nedizani ku min ew ji xwe re hem mînak hem jî hevrik wergirtiye, dilê xwe dipijînim wî û dixwazim mîna wî bibim... Em bi hev re careke tenê jî ne axivîne. Min bizanîbûya ew ê bimire, min ê zêdetir xwe nêzî wî bikira û ez ê pê re bixivîbûma.

Dibistana me li ber qiraxên behrê bû. Li pêş rê, li hêla din a rê jî sekû (rixtim) hebû. Dibistanê li ser sekûyê bircek xwe hilavêtinê ava kiribû. Bilindiya bircê deh mitro hebûn, an na di wan salan de bi min ew çend bilind xuya dikir... Li birca xwe hilavêtinê bi bilindiyên cûda sê textikên hilpekîne hebûn. Hildikişî ser textikê hilpekîne yê herî bilind û bi her awayî xwe diavêt behrê. Gava ku piştî xwe dida behrê, li banî du perende diavêtin û bi masikî noqî binê avê dibû, ez hêngî heyran dimam. Ji wê bilindiyê wisa noqî binê avê dibû ku, qet av nedipişiqand. Her awayî, bi hosteyî avjenî dikir. Digotin ji pêşbirkan de xelat jî wergirtine. Ya ku herî zêde ez şaş dihiştim û heyran dihelam, maweyekî dirêj di

binê avê de mayîn û avjenî kirina wî bû. Ku ew noq dibû, em ên li qiraxê, me bi awirên meraqdar li behrê mêzi dikir bê ka ew ê kengî û ji kû dera avê de derkeve. Di her noqbûnê de, ji devereke cûda û pir dûr de derdiket. Min hîs dikir ku heyran mayîna me bi xweşiya wî jî diçê lê wî hêsta xwe aşkere nadikir. Min xweziya xwe bi hûnerê wî yê di behrê de tanî lê ji min nedihat. Min li bani tenê perendeyek diavêt û noqî avê dibûm lê foşiniyeke erjeng bi avê diket, ava ku min dipişiqand ên sekûyê jî şil dikirin.

Di noqbûna wî ya dawî de, min li ser textikê hilpekîne yê herî jêr xwe dabû ber tavê. Ez hê nû ji behrê derketibûm û mayoyê min î şil bû. Hinên ji wan bi mayo, hinên ji wan bi cilan em sîhî zêdetir zarok li wir bûn.

Li ser textikê hilpekîne, wekî her car milên xwe bi her du aliyan ve kirin, piştî ku bêhna xwe berda, çend bêhnên kûr standin, sînga xwe bi hewa werimand û weke masikî noqî behrê bû. Çavê me li ser behrê digeriyan. Kê ewil serê wî bidîta wekî her car wê biqîriyaya û bigota "Wa li wir e!" Çirk û deqîqe derbas dibûn... Naxêr, çi dibe bila bibe tu caran ew çend di binî avê de nadima. Me yê ji kû bizanîbûya ew noqbûna wî ya dawî ye.

Ji bo lêgerînê yê ku ewil xwe avêt avê ez bûm. Di pey min re zarokên din jî xwe avêtine. Behr di qiraxê de ji nişkave kûr dibû, belkî şeş-heft mitro. Di noqbûna ewil de ji ber ku min bêhna xw baş nestandibû ez noqî binê behrê nebûm. Lê piştî ceribandina sêyemîn ku min sînga xwe bi hewa werimand, bi qeweta xwe ya heyî min bi kevir û kevzerên binê behrê re girt. Tê bîra min ku, navberekê min ji ber dîlkêşiya binê behrê ya rengîn, ji bîr kir ku ez çima noqî binê behrê bûme. Her du tiliyên min ku mîdyeya birîbûn bi xwîn dibûn.

Em bi hev re di bin avê de, bi qasî bîst metreyan li der û dorên textikê hilpekîne li wî geriyan. Ne he-nasa me ne jî qeweta me têrê dikir ku em li ciyên dûrtir û kûrtir lê bigerin. Me hew dît.

Rêvebirên dibistana me jî hatibûn. Bi me dan zanîn ku divê em ji behrê derkevin. Pêşî kelekê û peşê motorek anîn. Heta tarî daket erdê jî lê geri-



yan. Ku nehat dîtin jî gotin; 'Dibe ku li wê derê ava binê behrê boş biherike û laşê wî bi xwe re biri be.'

Me li dibistanê şevêk bi jan û bêdeng derbas kir. Ez ne bawer im ku tu kes bi qasî min li ber xwe ketibe: Ew merivê ezîz ku min bi dizîka ji xwe re mînak wergirtî û wekî hevrik hesibandî mirî bû.

Noqarên ku serê sibê anîndin dabûn, piştî lêgerînek dirêj di binê avê de cesed dîtin. Nehat famkirin bê ka çawa miriye û bi wê ve çawa di binê avê de maye. Nayê bîra min ku pîsporan cesedê wî mua-yene kirin an na.

Em hemû xwendevan tevî merasîma cenaze bûn. Ji bo ku di dema veşartinê de ez wî nebînim, bêtî ku bigihêjim ser goristanê di rê de vegeriyam. Hê jî ji bîra min neçûye, gava ku ez li pey cenaze diçûm min kulm û diranên xwe digûvaştin. Min dixwest li dijî tişteki ku ez pê nizanim serî hildim.

Li dibistanê çend rojan behsa wî hat kirin.

Mamosteyekî me yê xwezazaniyê hebû. Mamos-teyekî cûda bû. Bûyerên xwezayî yên ku me jiyana û yên ku em ê bijîn wekî ders ji me re vedigot. Bi xwe kêr vedigot, pîrî caran bi me dida vegotin. Me bi gengeşî û nîqaşan mijar hîn dikir.

Mamosteyê me xeniqîna wî jî kiribû mijara dersê. Wê mijara hanê bi qasî çend dersan dom kiri bû. Mamoste pêşî di avê de xeniqîn çawa qewimî-neke biyolojîk e bi me da zanîn şûn de, ji me xwest ku em bifikirin bê ka ew çawa xeniqî ye û çawa cesedê wî di bin avê de maye. Hevalên min ên polê li ser dibetiyên cur bi cur axivîn. Ê min cara ewil bû

ku ez tevî nîqaşekê nedibûm.

Bi noqbûnê re, ji ber cûdatiya derûdorî yan jî ji ber dilgirtinê divê dilê wî sekinîbe. (Mamoste lê zêde kir ku ji ber vê sedemê di behrê de pîr caran dil disekine.)

Dibe ku ji ber bi hêz noqbûye serê xwe li tişteki hişk xistibe. (Mamoste di cêsed de tunebûna birî-nên lêxistinê bi bîr xist û li ser dibetiyê xwîn derki-rinê sekinî, heke wisa be jî divêtiya derketina cêsed a ser avê lê zêde kir.)

Dibe ku ji ber xwînariya mêjî miri be, nexwe divê dîsa cesed bi ser avê biketa.

Li qiraxê, di binê behrê de mîdyeyên gir hebûn. Dibe ku mîdyeyê an jî lawireke behrê yên qalikî bi porê wî re girti be. Di binê behrê de bi por re girtin, derneketina ser avê jî rave dikê. Wê çaxê jî ev pîrs tê bîra meriv: Ew ciwanê bi hêz çawa çê bû ku porê xwe ji dest mîdye xilas nekir, heta mîdye jê nekiriye û dernêxistiye?

Hemû dibetiyên ku wê bûbûn sedema mirina wî hatin nîqaş kirin şûn de, mamosteyê me pîrsa kî ji we vurxûn xwarinê (derbxwarin!) pê dîzanê li me kiribû. Me tu kesî nadizanî. Mamosteyê me ji me re qala vurxûn xwarinê ango vurxûna behrê kir. Vur-xûn bêhtir li nêçirvanên sînger û duran (încî) dixê. Ji ber pîr zêde noqî binê behrê bûnê û di bin behrê de zêde mayînê dibê. Ji ber ku pesto di binê behrê de ji ya ser behrê û ya di hewa de pirtir e û her ku binî ve diçe zêdetir dibê, azota di xwîna meriv de bi bandora pestoya zêde ya di binê behrê de ron dibê.

Ku carekê xwîna yê di binê behrê de ron bibe, her ku ew hilkişê jor ango her ku pest kêmbibe çewsa xwîna wî wê zêde bibe, wê biqilqile û wê wisa êş bi-kişîne ku, naxwaze hilkişê jor ve, da ku ji êşê xilas bibe, berevajî hilkişîne wê noq binî bibe û bêhtir noq bibe... Cureyekî şeydatiya kûrahiyê ye ev. Yanê meriv xelasiya xwe di mirinê de dibîne û bi mirinîyê ber bi mirinê direve. Nêçirvanê sîngeran ku di binê behrê de rehên sîngeran yên mezin bibînin, dikevin azweriya ku hemûyê bi dest bixin, zêdetir noqî kûrahiyê dibin û li wir zêdetir di binê avê de dimînin, hêngî jî azota di xwîna wan de ron dibe û êdî hew dikarin hilkişin jor, bêhtir noq dibin. Ku derkeve bejahiyê vûrxûn li wan dikevê, ya ji xwîn jêçûyîna damara qelişî yan jî ji xwînfişiqîna dev û poz ew dimire. Ku siûda wî hebe kûd (seqet) dimîne. Ku di binî de dimîne vê carê di avê de dixeniqe û dimire. Yanê xelasiya yên vûrxûn lê ketî nîn e.

Berî ku bi awayekî zanistî vûrxûn lê ketin wekî ron bûna xwînê bê fêhmî kirin, ji vûrxûn lê ketiyan re digotin serxweşiyên kûrahiyê. Serxweşiya kûrahiyê ku digotin wekî bûyereke helbestî dihat fam kirin. Yên ku zêde noq dibin, xweşikiya di binê avê de dibînin û dil dikin wê bedewî û xweşikiyê, ku mirin be jî dawiya wê, noqî kûrahiyê dibin.

Ew bûyera helbestî ku mamosteyê me jê re digot serxweşiya kûrahiyê, wexta ku ez di binê behrê de li wî digeriyam li min wisa bûbû. Nexwe ku henaseya min, hêza min pê bikira û ber dîlkêşiya xweşikiya binê behrê ketima, min ê jî vûrxûn bixwara. Gava ku mamoste vedigot, bi min wisa dihat ku yê di binê behrê de xeniqî ez im. Lewma ji xwe dipirsim: Yê mirî ew bû yan ez bûm?

Sedemên vûrxûn xwarinê hatin famkirin û pê ve, tu helbestiya bûyerê nema bû çawa ku însan çû hevyê şûn ve tu helbestiya wê nema...

Yên vûrxûn lê ketî, ku taviê bigihînin kona oksîjenê û hevkeşeyên pestoyê pêk bên, dibetiya ku ji mirinê xelas bibe jî heye. Bi raya mamosteyê me mirina wî dibe ku ji ber vûrxûn lêxistinê be. Hem wiha digot hem lê zêde dikir ku mirinê şûn ve derneketina wî ya ser avê vê dibetiyê jî ji holê radikê.

* * *

Delala U.....m

Bi min welê tê ku bi vegotina vê bûyera dilsoj ku pêncî û çar salan berî niha qewimiye û ragihandina ravekirinên mamosteyê me yê xwezanas ên bi qasî ku di hişê min de mane, gotinên ku ez dixwazim bibêjim ancax karim bibêjim

Em ji hêlekê ve (ji hêla xwe ya herî girîng ve) pir dişibin hev. Delala min, ev hêla me ya mîna hev, em bi xwe kirine dîlê xwe. Ne tu, ne jî ez êdî em ni-

karin hev û du bi tu kesî re parve bikin; em ji bextewariya xwe li hev dabeşkirinê bê par in. Dizanîm, tu jî car caran wekî min dixwazî xwe bi hezekê ve parve bikî. Lê ev jî bo me her duyan jî ne gengaz e. Êdî pir dereng e... Lewre em pir daketin kûrahiyên tenêhiyê. Xwe bi hezekê ve parvekirina me, ji kûrahiyên tenêhiyê de, ber bi jor hilkişîna me ye. Hem dawiya wê nîn e, hem jî em ê êşên mezin bikişînin. Lewre ez û tu wekî serxweşên kûrahiyan bûne serxweşên tenêhiyê. Yên vûrxûn lê ketî ber bi jor ve hilkişin jî çawa ku nikarin bijîn, dîlketiyan tenêhiyê jî ku ji kûrahiyên tenêhiyên xwe ber bi jor ve hilkişin, hew dikarin bijîn.

Di bin şertên asayî de merivek, naxwaze û nikare di binê avê de zêde bimîne. Lê yên li dijî dîlkêşî û xweşikiya bê hempa ya di binê avê de xwe ranegirtî û vûrxûn xwarî jî naxwazin ji kûrahiyan derkevin, wê bêhtir û hey bêhtir hewl bidin ku dak-evin binî û di wê xweşikiyê bixeniqin.

Te jî, min jî me nedixwast ku em tenê bimînin. Me dixwest em xwe dabeş bikin, xwe parve bikin. Lê dîsa jî em çiqas bi tenê mabûn. Ew çend ku em bi tenê bimînin, em bi xwe bûbûn tenêhiyê û hînî xwe bûbûn. Her ku çû em di kûrahiyên tenêhiyên xwe de jî xwe vedişêrin. Hin bi hin ew tenêhiyê ji ‘tenêhiyê’ yê derketî bû û bûbû ‘tenêhiya min’, tenêhiya min, tenêhiya min a xweşik... ez hînî tenêhiya xwe ya xweşik bûbûm, tu jî hînî tenêhiya xwe ya xweşik bûbûyî... Kêngî em noqî binê kûrahiyên tenêhiyên xwe bûn, em hingî hay jê xweşikiya tenêhiyên xwe bûn. Em ji dîlkêşiya xweşikiya bê hempa ya di kûrahiyên tenêhiya xwe de xilas nedibûn, me nadixwest em xelas ji bibin.

Delala min, em serxweşên tenêhiya xwe, dîlketiyan kûrahiyên tenêhiyê ne. Em dizanin ku em ê ji xweşikiyên di kûrahiyên tenêhiyê de bixeniqin.

Divê em bibijêrin delala min.

Tu kîjanê dibijêrî?

Ez?

Ez dixwazim bextewar bim delala min. Lewma heta ku ji min tê dadikevim kûrahiyên tenêhiya xwe ya xweşik. Ji bo ku nexeniqim, ji bo xwe xilas bikim jî bi xwe, xwe hembêz dikim: Hembêz bike piyên min, xwe hembêz bike...

Tu dixwazî hilkişê jor, dixwazî noqî kûrahiyên tenêhiya xwe ya xweşik bibe.

Bi xatirê te delala min, bi xatirê te...

30/06/2011
Êlih

Ke ti şêrê rijîyeno no şaristan

Ahmet TELLÎ
Acarnayox: Netîce ALTÛN

Ke ti şêrê rijîyeno no şaristan, mîrçikî zî şinê
Ez do vengê xo bibirnî deltayê riyê to de, sey royêke
Ma adresanê şaşan de bî, belki ma bêkesî bî
Temamê roşinan bîyê zerdîyêka miheyî
Gelo ma tena bî, varan varê bêsekn
Gelo bi ma recefîyê gama ke çiçekê hinaran lertzê?

Ke te şêrê kam do rihanan aw bido
Mîrçikî çi ca de setar benê gama ke bibo şan

Ez nika goştariyê bêvengî kena û nefesê to
Tay çi şikiyenê cayêkê ti vengê xo nêkena de
Caddeyan ra ez vana vindertiş, ti kuna xeyalan
Nameyê to nûsena tamamê dînganê otobusan de
Cayê ke ma lew na yewbînana heme bi namê to yenê yadkerdene
Û ez to erzana serê bêvengîyanê xo

Ma bê selam û bê hurmet kuçeyan ra bigêrim
Belki do bi ma roşin bêro temame waroşan
Do zindanî bimanê ma dima, serdê zengarînî
Tenê dostê ke ma namanê înan nêzanê manenê
Ma înan genê zerrê zerrîya xo, kenê germin
Ma nêşkenê bibim gardîyanê emrê xo her şew

Ke te şêrê do vewr bivaro miyanê lepanê mi
Û etya de, eşqî do bibê bêvengîya xezalêke

Panoyanê reklaman de roşinê biforsî takunê
Roj bi roj dewam kenê cîneyetê kerdex-mechûlî
Û mîrçikê merdeyî roşiyenê tamamê çiçekroşan de
Herinda mamûşag û nêrgizan de mîrçikê merdeyî
Enka dûrî yo vengê aw û vengê yew rihane
Etyara pey adirî areno vîrê merdeyanê ciwanan

Dûyêke arabesk qahvexaneyanê bûlvaran de
Xokîştîş û mij kuno sero tamamê bîraxaneyan
Kuneyê nê şaristanî bellî yo henî
û bêvengîyê to
Beno serewedartiş milyon reyî, la qey ez qet nêzana?
Ti buko verarê mi, wa destê to germin bimanê
Reyna dewriyeyî erzenê serê kêyan

Ke ti şêrê no şaristan rijîyeno mîrçikî zî mirenê
Ez bena tofanêk her cayê kê ti bêveng manena de



Allah-û ekber

Amed Çeko JIYAN

Ji ber ku seydayê Aramê biçûk rojekê berê gotibû wî, ew ê negihîje banga sibê, jê xwestibû ku ew banga sibê bide. Aramê 14 salî ku ev sê meh bûn derbasî xwendina Quranê bûbû, şevêqê zû li mizgeftê amade bû.

Dema ku ji bo destmêjê li ser kursiya kevirîn î sar ê desmêjxaneyê rûnişt û bi ava sar destmêj girt, nava wî xera bû. Ji ber ku fêr kiribû dê nikaribe bi vê êşa navê heta piştî nimêja sibê li ber xwe bide, careke din çû tuwaletê. Piştî derketina ji tuwaletê, destmêja xwe nû kir û çû ciyê seydayê xwe yê li nava mizgeftê.

Aram li demjimêra xwe nihêrt, hê ji bangê re li dora pazdeh xulekan mabû. Ji bo ku di vê demê de darsa xwe ya rojek berê dubare bike, Qurana xwe ji çentik derxist û danî ser XXXê. Dema ku darsa xwe dubare dikir, kêliyê carekê li demjimêra xwe dinihêrt. Bi vî awayî heta dema bangê darsa xwe dubare kir.

Gava ku dema bangê hat, bi heyecan çû ber mîkrofonê. Cara pêşî bû ku seydayê wî destûr dabûyê ku bang bide. Bi vê serbîlîndiyê, wekî ku seydayê wî nîşan dabû, gupika cîhaza mîkrofon pê ve girêdayî zivirand. Bi zivirandina gupikê re çizîniyek ji hoparlora li ser mînareya mizgeftê hat û di kêliyê de dengê çizîniyê bîliya.

Wekî seydayê xwe kire kuxekux; qirika xwe paqij kir û dest bi bangê kir:

- Allah-û Ekber, Allaaah-û Ekber!

Allaaah-û Ekber, Allaaaaaaaaah-û Ekber!

Eşhed-û E la Îlahe Îllellah!

Eşhed-û E la Îlahe Îllellah!

....

Piştî ku bang da, dîsa li ber Qurana xwe rûnişt. Çavekî li darsa roja berê gerand. Mixabîniya xwe anî ku Quranê dixwîne lê jê fêr nake. Lê zêde li ber neket. Ji lewra dema seydayê wî wateya gotinên bangê fêrî wî kiribû, jê re gotibû piştî Quranê ew ê Mewlûda Kurdî fêrî wî bike û piştî jê ew ê hêdî hêdî dest bi fêrkirina pirtûkên wekî Bîna û 'Îzî û bi wan re jî ew ê dest bi fêrkirina Erebbî jî bike.

Bi wê eşqa ku ew ê rojekê dema Quranê bixwîne di heman demê de ew ê jê fêr jî bike, her ku dengê bangê dibihîst, wateya wê ya ku seydayê wî ew fêr kiribû pêre pêre digot:

Xwedê mezin e, Xwedê mezin e!

Xwedê mezin e, Xwedê mezin e!

Ez şahidiyê dikim ku ji Xwedê pêştir xudan tune ye!

Ez şahidiyê dikim ku ji Xwedê pêştir xudan tune ye!

...

Demeke kin piştî bangê, cemaeta nimêja sibê ku hemû jî zîlamên kal bûn, hêdî hêdî ciyê xwe yê li mizgeftê digirt. Zîlamê ku dikete hundir, wekî ku wî pîroz bikin, bi çavên biriqî lê dinêrtin û dibeşîşîn. Ji dema ku dest bi hatina nimêja sibê kiribû ve, gotina seydayê xwe ya ji bo wan kesên di nava mizgeftê de xwe hîni şer dikirin çetir fêr dikir. Bala wî kişandibû; ew kesên ku seydayê wî têkiliya wî ya bi wan re qedexe kiribû, tu carî nedihatînim nimêja sibê. Nava rojê, piştî nimêja nivro dihatin, bi cemaetê re nimêj dikirin, piştî ku demeke ne dirêj dersê Elîfbê û 'Emayê didane hev, dest bi karateyê dikirin.

Zîlamêkî ku her bi tenê şevêqê ji bo nimêja sibê di hate mizgeftê, hate cem wî, destê xwe bi serê wî da û gotê:

- Te banga îro da?

- Erê, apo.

- Seheta te xweş. Dengê te gelekî xweş e.

- Xwedê ji te razî be, apo.

- Xwedê te bihêle, lawê min.

Zîlamê kal kêliyêkê bédeng ma, bêhneke kûr kişand û gotina xwe dewam kir:

- Neviyekî min jî heye, di emrê te de ye. Dema em li gund bûn, min ew danîbû ba meleyê gund. Xwedê te û wî bihêle, çawa ku me bar kir û em hatin bajêr, wî dev ji xwendinê berda. Çend caran min şîret lê kirin ku xwendina xwe dewam bike. Lê bavê wî nehişt. Dibêje mizgeft ketine destên şeytanokan.

Pêşî ji gotina "mizgeft ketine destê şeytanokan"

tênegihîşt. Paşê bîr bir ku mebesta wî ji şeytanokan ew kesên ku seydayê wî têkiliya bi wan re qedexe kiriye ne. Dema ku zilamê pîr diaxivî, çend zilamên din jî hatin tevli wan bûbûn.

Aram hê bebik bû bavê wî miribû. Ew û diya xwe mabûn. Kalê wî û pismamên wan biryar dabûn ku diya wî bi apê wî yê biçûk re bizewice. Lê diya wî ev qebûl nekiribû û çûbû mala bavê xwe. Demekê piştî jî dîsa mên kiribû. Piştî ku diya wî mên kiribû, Aram danîbû ba malbata bavê wî. Ji ber ku Aram sêwî bû, her kesî kêfa xwe jê re dianî. Zilamê kal ku wekî kesên din ên cemaetê kêfa xwe ji Aramî re dianî, dîsa dewam kir:

- Bavê wî ew li mektebê qeyd kir. Lê mekteb jî nexwend. Xwezî wan bi ya min bikira ku wî jî wekî te xwendina xwe dewam bikira.

Dema ku monologa wî û zilamê kal dewam dîkir, seydayê wî hat li cem wan rawestiya û got:

- Seydayê Mele Aram ji xwe re heval çêkirine.

Aramê ciwan ji ber gotina "Seydayê Mele Aram" fedî kir. Ji ber fedîyan hinarîkên wî sor bûn, tîneke şor da çavên wî û serê xwe tewand ber xwe.

Seydayê wî destê xwe bi serê wî da û got:

- Xwedê xêra te qebûl bike. Tu wisa bang bidî êdî cemaet bi banga min qayîl nabe, ew ê timî bixwazin tu bang bidî.

Aram vê carê di ber xwe de kenîya.

Seyda bi dengê tijî got:

- De ya Allah, û bi ber XXXê ve çû. Cemaet li paş wî rêz bû û dest bi nimêjê kirin.

Piştî nimêjê cemaet belav bû. Tenê seyda û Aram man. Seyda bang li Aramî kir:

- Aram, tu dersa do hîn bûyî?

Aram bi kêf rabû ser xwe, ber bi Qurana xwe ve çû û got

- Belê seyda.

- De ka nexwe were li ber min dubare bike.

Aram hat û li ber seydayê xwe dersa xwe ya rojekê berê dubare kir. Seydayê wî pir jê qayîl bû:

- Kuro tu agirê sor î. Dersê didime te wekî teybê digirî. Ka ez dersê îro jî bidime te. Qasekê dubare bike û here malê.

Aram li gel Quran û XXXê li ber seydayê xwe rûnişt. Seydayê wî dest bi dersê kir. (divê li virê





sûreyeke derbarê qetlê de be. Qet nebe divê derbarê mirovhezîyê de be.)

- , tu jî li pey min bêje.
-
-
-
-
-
-
-
- Aferim, Aramê zîrek. Niha here ciyê xwe û dersa xwe dubare bike.
- Seyda?
- Bêje. Dersê dubare bikim?
- Na. Ez dixwazim tişteki din bipirsim.
- Çi bipirsî?
- Dixwazim dema Quranê bixwînim, jê fêhm bikim.
- Seyda bi vê gotina wî kenîya:

- Hê ji bo vê zû ye. Min berê jî gotibû, her tişteki wexta xwe heye. Gava min jî nû dest bi Quranê kiribû, min jî jê fêhm nedikir. Lê gava wext hat, seydayê min hînî min kir. Kengê wext hat, ez ê hînî te bikim.

Aramê ku bi redkirina daxwaza xwe xemgîn bûbû, serê xwe tewand ber xwe. Xwe çeng kir ku rabe, lê seydayê wî bi milê wî girt û gotê:

- Baş e, lê ez ê bi têne maneya dersa te ya îro bibêjim. Paşê wekî her car em ê dewam bikin.
- Baş e seyda.
- Dersa te ya îro, ayeta XXXa a sûreya YYYê ye.
- Dibêje
- De niha here ciyê xwe û dersa xwe dubare bike.
- Baş e seyda.
- Piştî ku Aram çû ciyê xwe, dest bi dubarekirina dersa xwe kir:

-
Hem dersa xwe dubare dîkir, hem jî wateya wê. Demeke xweş wisa derbas kir. Dema ku êdî dersa xwe girt, li nava mizgeftê nihêrt; tu kes tune bû, seydayê wî jî xuya nedikir. XXX danî quncika ku kitêb lê ne, Qurana xwe xist çentikê wê, çentik kir stûyê xwe û derket.

Dema ku di sikak û navbirên teng ên navbera avahîyan de bi ber malê ve diçû, ji aliyekî ve jî wateya dersa xwe ya îro dubare dîkir:

-
- Allah-û Ekber!

Ji qorziya sikaka li pêş dengê van gotinên ji wî ve nas hat. Gavên xwe hinekî sivik kirin û ber bi ciyê deng jê hat ve bi lez meşiya. Dema qorzi xilas kir, dît ku li qorziya li hember yekî hema bibêje di temenê wî de li erdê dirêjkirî ye. Bi heman gavên sivik ber bi wî ve çû.

Gava hinekî nêzikî zarokê li erdê bû, dît ku serê zarokî nivî bi nivî ji laşê wî bûye û ji qirika wî xwîn difisike. Aramî xwe negirt, li ser her du çokên xwe kete erdê û vereşiya.

Vereşana wî ya ron bi çentikê Quranê û derdorê ve reşiya. Qasekê li wirê bi kuxtekuxt parî û qurtên dawî yên di mîda xwe de vereşiya. Ji hember ve dengê bêtêlan û motora siyarekê hat. Guhên xwe mûç kirin û li aliyê ku deng jê ve tê nihêrt: Otomobileke spî hêdî hêdî ji hember ve dihat. Di cî de ji ciyê xwe çeng bû, Qurana xwe ji çentikê lewitî derxist, xist bin çengên xwe û di navbira herî nêzik re xwe ji ber çavan winda kir.

Hîkaye

Ayhan MERETOWAR



Ji nivîsên ku hin bûyerên qewimîne yan di rengê bûyerên qewimîne de ne, ku digel nîgarên kesên bûyerê, dem û cîyê bûyerê, bi awayekî kurtane vedibêjin re şaxê edebî yê kurteçîrokê / çîroka nû tê gotinê.

Mebest bi şaxê edebî ew e ku, li ber çavan raxistina bûyeran û pirsgirêkên ferd û civakê ye. Armanca kurteçîrokê, hizirandin / ramandina xwendevanan e.

Di Edebiyata Dunyayê de Dîroka Cûreyên Hîkayeyê

Di nav cureyên edebî de hîkaye, piştî romanê tê. Berî cureyê romanê jî, çeşnê fablê hebûye. Wê hingê çeşnê çîrokê/metelê yan jî xeberoşk hebûye.

“Serê pêşî, ev çeşn, di sedsala 16’han de, li Îtalyayê, di pey Bizava Ronensansê de, bi navê *Hikayeyên Dekameron*(*Dekameron*) dest pê dike. Bi gotineke dî, çeşnê hikayeyê, bi awayekî hemdem, ji aliyê Giovanni Boccacîoyê Îtalî ve, cîyê xwe di nav çeşnên edebiyatê de digire. Di edebiyata Cîhanê de, mînakên pêşî yên çeşnê hikayeyan, bi vê berhema Dekameron a “Boccacio” dest pê dike.¹

Di sedsala 18’han de, Voltaire (Volter) jî di ber çeşnê hikayeyê de kedê dide. Heta sedsala 19’an, hîna nû çeşnê hikayeyê, digihîje wan taybetiyên xwe yên rastî û karakterî. Di vê serdemê de ew bizavên edebî, Romatîzm û Realîzm, rê li ber gurgêşbûna vî çeşnê hikayeyê vedikin.

Êdî peyre edîbên Frensî yên navdar ên mîna Alphons Dautet, Guy de Maupassant jî, di vî warî de gelek berhem didin.

Hetta di edebiyata Frensî de Guy de Maupassant wisan bi pêş dikeve ku di edebiyata cîhanê de li ser navê wî, terzek/teherek derdikeve: Tehera Maupassantî ya hikayeyê. Ev awayê Maupassant, di edebiyata cîhanê de, weke tehereke kevnepî/kilasîk jî hatiye qebûlîkirin. Di vî terzî de, bingeha hikayeyan, “bûyer” e.

Nûnerê herî binavûdeng ê edebiyata Turk ê

di vî terzî de, Omer Seyfeddîn e. piştî wî, Refîk Xalid Karay, Reşad Nûrî Guntekî û Yakub Kadrî Karaosmanoglu ye.

Di pey Maupassant de, li cîhanê, di edebiyata Rûsî de çeşnê hikayeyê serî dide. Edîbê Rûs/Ûrûs Anton Çehov, li ser terzekî nû yê hikayeyan xebitiye û çeşnê hikayeyê, xistiye merheleyeke nûjen/modern. Hetta bi navê Çehov jî tê binavakirin. Di vî terzî de bigeha hikayeyê, li ser “rewş”ê ye. Di hikayeyên bi vî terzî de fikir û ramanên ferdî û civakî, hest û xeyal derdikevin pêş.

Di edebiyata Tirkî de Memduh Şewket Esendal û Saîd Faîk, bi vî terzê hikayeyên xwe nivîsandine²

Bi dîtina min **Fuat Temo** ku di rojnameya Rojî Kurd de em rastî hikayeya wî tî, li ser vî bin-



gehê ye. ³

Di Edebiyata Kurdî de Dîroka Çeşnê Hîkayeya Modern

Heke em pêşî behsa edebiyata Kurdî ya Kurmancî bikin, helbet divê em serê ewil behsa kovar û rojnameyên Kurdî bikin ku cara pêşî, wan hîkaye dane çapkirin û weşandin. Di nav van kovaran de, pêşî em rastî rojnameya *Kurdistan, Rojî Kurd, Hawar, Ronahî* û kovara *Rewşenê* tên. Digel van, kovara Nûbiharê jî, bi derfetên xwe yê gewre, ketiyê milekî karên Kurdî û bergê li ber çapkirina hîkayeyên Kurdî vekirîye. Gava em bi dîroka derketina van weşanan bizanibin û nivîskarên wan nas bikin, bê guman em dê bêhtir bi rehetî bi dîroka çeşnê hîkayeya modern a Kurdî serwest bibin.

Îca digel ku qenaeta gelek lêkolanan heye ku Fuat Temo, mîmarê pêşî ya hîkayeya Kurdî ya modern e jî, van salan diyar bûye ku Mela Mehmedî Bayezidî, di salên 1856'an de, cara pêşî, li ser daxwaza sefirê sefaretxaneya Împeratoriya Rûs Aleksandr Jaba, hîkayeya modern a Kurdî nivîsandiye. Navê wê hîkayeyê jî, *Mem û Zîn* e. Berî sedsalê û nivê...

Peyre, Fuat Temo, di salên 1913'an de, bi navê *Şewêş* hîkayeyeke li gor rêbazên hîkayeya Ewropî nivîsandiye û di kovara *Rojî Kurd* de daye çapkirin.



Em
ji
ko-
vara

“Jîn” ku di sala 1918'an de li Stenbolê derketiye, hîn dibin ku şanûnûsê pêşî yê Kurdî, Evdîrehîm Rehmî Hekarî, bi Tirkî, çend hîkayeyên li ser jiyana kurdan nivîsandiye.

Van salên me, li Bakurê welêt, bi xêra kovara *Rewşen, Nûbihar, Nûdem, Tîroj, W, Çîrûsk* û *Nûpelda*, gelek hîkayenûsên ciwan gihîştin. Ji van, Dilawer Zeraq, Yaqûb Tîlîrmenî, Behlûl Zelal jî, berhemên hêja dane û didin.

Li Ewropayê jî, Enwer Karahan, Firat Cewerî û Hesenê Metê, têra xwe hîkayeyên nû yê modern didin.

Îca ji xeynî van berheman, heq heye ku em behsa hîkayeyên Kurdî yê nezmî/menzûm bikin ku yek jê, ji aliyê Feqîyê Teyran ve hatiye nivîsandin.

Li Başûr Hîkaye û Pexşan*

Cara pêşî, di salên 1920'î de, Mergesonê îngîlîz, ku sala 1920'î, li Silêmaniyê hakim bûye, ji edebiyata Îngîlîzî, komê hîkaye wergerandine Kurdî û di rojnameya xwe ya bi navê *Pêşkewtin* de, li Silêmaniyê derxistiye.

Li Silêmaniyê, Cemal Saîb, bi navê *Le Xew ma*, ango “Di Xew De” berhemeke hîkayeyî nivîsandiye û di rojnemaye *Pêşkewtin* û *Jîyan Nêwa* de daye çapkirin. Ev berhema, di Kurdiya Soranî de, destpêka pexşanê ye ku di hiyama Şêx Mehmûdê Berzencî de derketiye. Sal, 1925 e. [Di Xew De, Cemil Saîb, (2009) Stembol, Weşanên Avesta]

Wekî dî, Ahmed Muxtar Begê Caf jî, sala 1927'an, bi navê *Meseley Wijdan*, berhemek daye ku dişibe hîkayeyeke dirêj. Dema ku qaymeqamtiya Helebçeyê kiriye, Şêx Mehmûd ew zindanî kiriye. [Ehmed Muxtar Caf, (2009) Stembol, Weşanxaneya Avesta]

Ji xeynî van, di salên 1930'yî, hîkayenûsên mîna Dr. Huznî Mukrîyanî, Eladdîn Seccadî û Pîre-

mêrd û Şakir Fetah, berhem dane.

Dîsa em pê haydar in ku Ferhat Pîrbal, di hêla çêşnê hîkayeya Soranî de gihîştîye merheleye baş.

Li Kurdistanê Îranê Hîkayeya Kurdî

Li Kurdistanê Îranê, gava hîkaye tê gotin, Hesên Qizilcî tê bîra me. Peyre, Heme Kulî Arîfî, Mistefa Salih û Ehmed Mihemed Îsmailî tê bîra meriv.

Li Kurdistanê Sûriyeyê Hîkayeya Kurdî

Gava em behsa hîkayeya kurmançî ya serdema me bikin, helbet berî gelek kesan, Helîm Yûsuf, Kamîran Haco û Fewaz Huseyn tîn bîra mirov.

Bi rastî Kamûran Haco jî, hêjayî behsê ye; lê belê Kamîran Bedirxan, Celadet Bedirxan, Nûredîn Êsuf-Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Can, ew pêşeng in wan di wextê kovara *Hawarê* de, rê li ber çêşnê hîkayeya modern a Kurdî vekiriye.

Ji destên Helîm Yûsuf, bi navê Mirî Ranzîn, Jinên Qatên Bilind û Mêrê Avis, çend berhem derketine. Berhema Kamîran Haco ya bi navê “Kelevajî” sala 2001’ê, di nav weşanên Avestayê de derketiye. Fawaz Huseyn jî, bi navê Siwarên Êşê (1994-Stokholm) û Amîdabad (Stenbol-2001) çend berhemên xweş dane.

Di Edebiyata Dimilkî De Hîkaye

Di edebiyata Kurdî ya dimilkî de jî, “Antolojiya Hîkayeyên Kirmanckî” hatiye çapkirin. Di nav wan de Malmisaniy, Serdar Roşan, Huseyîn Karakaş, Mehmet Uzun, Roşan Lezgîn, Îhsan Eşpar, Munzur Çem û çendekî di hene.

Berhema R. Lezgîn a bi navê Halîn, sala 1006an, di nav weşanên Komalê de derketiye. Helbet gelek berhemên nivîskarên di jî hene.⁴

* Bi dîtina min navê vî çêşnê hîkayeyê, nabe çîrok. Çunkî ji qedîmî zeman ve Kurd, jî çêşnê “masal” ê re dibêjin çîrok. Navê çîrokê, li hin ciyan metelok an jî xeberoşk e. Di Kurdiya dimilkî de jî estonek e. Ev peyva estonek jî, di edebiyata erebî de jî Estone ye. Îca hem ferhenga Z. Farqînî hem jî ferhenga Koma Vate, li ber navê “öykü” ya Tirkî, peyvika “hîkaye” qebûl dike. Heta digel ku peyvika “öykü” li ber peyvika “hîkaye” hatiye danîn jî, dîsan heta niha ev kelîmeya “hîkaye” tê bikaranîn. Tercîha min jî di edebiyata Kurdî de “hîkaye” ye.

¹ Weke qerfêkê, ez li ser vî navê pêşî yê hîkayeyan weha difikirm: Ev edîbê Îtalî ku navê wî Giovannî ye, bi Kurdiya kurmançî, navê wî dibe Gavan. Îca navê berhema wî ya “Decameron” jî, bi Kurdiya dimilkî ye. Lewre xwendina Decameron, Desameron. Jixwe wateya vî peyvê jî ew e ku “Hîkayeyên Deh rojan”. Bi dimilkî, deh, des e. Peyvika “ro” jî tê de heye. Eve bû Dehrojan. Di devoka dimilkî ya Çewlikê de herfa “a”, bi “o”yê tê bilêvkirin.

² Ciyên jêderên van agahiyan, LYS Edebiyat, Weş. Analîtîk; LYS Edebiyat Weş. Güvender, çapa 2010’an in.

³ Cara pêşîn, di Edebiyata Kurdî de hîkaye ji aliyê kê ve hatiye nivîsandin, hîna jî ciyê mereqê ye; lê belê Mela Mehmûdê Bazîdî, hin metelokên Kurmançî daye çapkirin. Wekî di, Fuat Temo, sala 1914’an ev çêşn, bi awayekî modern daye destpêkirin. Ku em hîkayeya Kurdî bidin ber hîkayeya Tirkî, em rastî tiştêkî seyr tîn. Ew jî, diroka hîkayeya Kurdî ye ku gelek kevnar e. Cara ewil hîkayeya Tirkî, ji aliyê Ahmet Mîthat Efendî ve hatiye nivîsandin. Navê berhema wî jî: Letaîfê Rîwayat. Peyre, Samî Paşazade Sezaî, bi berhema xwe ya “Küçük Şeyler” hîkayeya modern a bi Tirkî nivîsandiye. Salên 1890’î. Serdema Tenzîmatê ye. Îca rewşa hîkayeyê di Edebiyata Kurdî de û di Edebiyata Tirkî de, li ber çavan e.

* Min ev agahî, ji ber hevpeyvîna/mulaqata S. Veroj ku bi Ferhat Pîrbal re kiriye û di hejmara 10-11’an a Kovara Bîr de weşandiye, weke mîfa girtiye.

⁴ Kovara War, hejmar: 10-11, rp: 59-60, 2001

Tiliyên bi taya jibîrkinê ketine

Evîn ŞIKAKÎ

Ka ji min re bêje...
 tu bi qedrê Xwedê kî...
 Xwedayê di dilê te de diji...
 çawa xwe fêrî hatinên poşmaniyê bikim ?
 çawa ev kewên li ser dilê min difrin
 fêrî melevaniyê bikim ?
 çawa lehiyê fêrî sebir û hedanê bikim ?
 ka bêje min ?
 ez xatir xwestina te bi kîjan pêûsê binvîsînim?
 li ser çi rûpelê xêz bikim?
 Ma ne destên min bi taya jibîrkinê ketine
 û bêhna gazinan ji wan tê!
 tiliyê min ji weriyane!.
 De bêje loo
 dil bi kulo loo....
 mane te narînkên xwe jî ne gotin
 (bûkê delalê rabe xwe karke
 şûşa miskê bi serê xwe dake
 zava şêrîne xortekî pak e)
 erê...
 te narînkên xwe jî negotin!
 vedenga dilê te ji erbaneyên derwêşa dihat
 xewnên daşta hesinan ber bi ava Seqlanê Mema û Kaniya Xeyda ve diçû.
 hêviyên dilbikûl xwe sipartin darê miradan.
 Erê...
 te helbesta herî şêrîn
 ya li ber dilê xwe jî ne got
 (şoxo şengê zûhre rengê.. dil ji min bir dil ji min
 awerîn heybet pelingê.. dil jimin bir dil ji min)
 erê loo
 dil bi kulo loo!.
 ka ji min re bêje...
 ez xatir xwestina te bi kîjan salê...
 bi kîjan bûyer û malwêraniyê ve girêbidim?
 bi salên koçberiyê ve ?
 bi salên perfa sor û zivisatanên sar ve ?
 yan bi salên enfal û kîmya baranê ve?
 ka bêje
 ewleya te bi kîjan ronahiyê tê?
 ma ne rohnahiya heyvê jî ne ji ya evîndarkî bendemayî bêhtir e.
 de bêje...
 bêje
 ez çiyayekî westiyayî me
 lê çiya me
 çiya...

Bêrîtan

Îlhamî OZER

Bêhenek ew bayeke ji herîr
 û şewlê bû
 Êşnasiya ku ketibû para wê
 qesra xêz û xemlê bû
 Rûpoşa tariyê
 wê avêt hundirê agirekî
 dîlbijok
 lewre
 Îzaha wê xwezayiyê,
 ligel welatparêziya wê
 çûbû zeyiyê
 Tu tevgernasên cihanê
 yekbibûna ji
 Avsûna wê kêliyê
 nikarîbûn binavbikarana
 lewre
 Navika wê li ser çîyan
 bi sebra dirokê
 hatibû birîn

2011-09-11

Fewzî Bîlge

DEMA YEZDAN DIBÎŞIRÎ

Roman



Êvara Perwaneyê

Bextiyar Elî

avesta



Rabin

Kamran Simo HEDILÎ

ji bo tîrêjên hungirê Sumeran
fermana Ferîdûn
jankêşîya Mîtanîyan
û ji bo bêhna birîna dîrokê
newroz e
îro newroz e werin dîlanê

ji bo tenêtiya kêlên Huriyan
pêlên meyandîna hevîrtîna jînê
tehlîgewriya Gotîyan
û ji bo paqîjîkirina efnîka mêjî
newroz e
îro newroz e werin dîlanê

ji bo birûskên mehşera Medan
hêviya tofana meydanan
axîna têkçûna Astiyag
û ji bo ronîkirina bîra kor
newroz e
îro newroz e werin dîlanê

ji bo zanîna zayîna nûvejînê
sîrûda nivê şevê
çîrûskên kenê komê
û ji bo qêrîna ser rûreşîya felekê
newroz e
îro newroz e werin dîlanê

ji bo şadiya zarokan
armanca lehengên bînav
serxweşîya zikirê derwêşan
û ji bo dîtina dengê serkeftinê
newroz e
îro newroz e werin dîlanê

ji bo çemê çavên Rindêxanê
tariya çûna zivistanê
gulavdana şewata baranê
û ji bo berxwedana sê darikên pîroz
newroz e
îro newroz e werin dîlanê

ji bo çiyayên li ser çokan nerûniştin
çavên girava bêbextan şostin
dîlovaniya vîna Viyanê
û ji bo dûrxistina bêhna
girîza keftaran
newroz e
îro newroz e werin dîlanê
ji bo reqsa agirê laşê şîrmîjan
êşa zîmanê xwîna xwe xwerî
xatîrxwestinên bêramûsan
û ji bo nehiştina êşa mîlşîkandinê
newroz e
îro newroz e werin dîlanê

ji bo tola giyandayîna
kulîlkên biharê
awirên tîtola evîna Şîlanê
tola çêja vê jehrê
û ji bo tola bêhna vê zilindarê
newroz e
îro newroz
rabin werin serhildanê

22.03.2008

Gelo çima

Rêzan NAS

“Ezîz lawo ka birayê te, gelo li ku ma?”

“Gava te ji ba rêz da rê wî jî da dû te, ma ne hatiye malê?”

“Ez rebena te bim va ye tariyê jî xwe bera erdê da, ew xortê wiha xweşik, ez ê çawa bikim, çi teniyê di xwe bidim? Mala min xera bibe, çavên min birjin.” û di ber xwe de digot û dibiland, ji ber tifika paşiya hêwanê rabû û berê xwe da deriyê hewşê. Ji bêheşiyarî sola xwe nexist lingê xwe û xwas berê xwe da şivarêka ba rez. Bê rawestan deng li kurê xwe yê panzdeh salî dikir; “Dijwaar! Dijwaaar! Dijwaaar! Ma tu li ku yî lawo? Dayîk bi qurban!

Xana reben bûbû weke dînan û bi çolan ketibû. Çarika serê wê ji serî şeqitibû û pê nehesiyabû. Di wê tariya şevê de her bang dikir û wek sewsiyan digeriya. Qîza wê jî bi pey ket û li diya xwe rast nehat, bi şûn de vegeriya. Gundî, xort, ciwan pîr û kal, bûk û keç tevde bi şopa wê ketin lê li wê rast nehatin.

Xanê her dikir qêrîn û bang dikir. Lê deng ji kevirê çol û çiya dihat, ji Dijwarê wê deng nedihat. Xanê gava ku gihaşt çala binya şivarêkê, rast berê xwe dayê û çû ser çalê, çal zêde ne kûr bû, ji bêxwedîtî xitimî bû. Wê xwe vexwar kir û li hundirê çalê nerî. Bi dengê bilind bang lawê xwe kir. Dengê wê di hundirê çalê de olan dida. Bi hêviyeke xurt xwe bera çalê da. Gava xwe bera çalê da li ser komê hestî ket û bi ketinê re hestiyek bi şid li guzeka wê ket. Xanê bi dîtina wan hestiyarî bû weke dîneke har, û xwe hol kir ji çalê derket. Bi dengê şewat wê her digot; “dayîka we bi evdal be, ez evdal im Dijwarê min” û her hêstir dibarandin. Li wan çolan digeriya, li stûyê deviyarî siwardibû, li keviran hildikumî. Wê her li derdora xwe dinêrî û gazî dikir. Şev tarî bû, te tilî di çavên hevdu rakira kesî kes nedidit. Bi hêrs ber bi mehsera nava rêz de baz da û lingekî wê di pijekî de aliqî û bi dev çû erdê.

Bi taştîyek bilind re hat ser hişê xwe, dev û ruyê wê di nav xwînê de mabû, behitî bû. Dîsa rabû ser xwe û bi lez berê xwe da mehserê, li nava mehserê geriya tişteke nedît. Li bayê bezê berê xwe da kokela nava rêz, gava ku di derî re xwe li hundirê kokelê qeliband, di paşiya kokelê de bişirînên weke bişirînên Dijwarê wê li ber çavên wê çêbûn. Bê hêviyek xurt bi ber de çû ku himbêz bike.

Destê xwe avêt ku li stûyê wî biheblîne, destê wê li qafekî seriya ket. Rahîştîyê, lê nihêrt hestî kevn bû. Ji tirsê re avêt ser koma hestiyarî û zû zû paşpaşî ji kokelê derket. Dest bi gotina zêmara kir. Hestî ne yên lawê wê bûn. Lê ew hestî ne bêxwedî bûn, dê û bavê wan jî hebûn. Di ber xwe de digot û dibiland û digot: “Ma kesek ji ber deviya nehatiye” Êdî wek berê nikarîbû bilezîne, hêdî hêdî diçû û difikirî ka bê Dijwarê xwe li ku bibîne. Ji nişkê ve êtûn hate bîra wê, berê xwe da êtûna nava zeviya newalê. Bi hêviya ku Dijwarê xwe li wan deran bibîne ber bi êtûnê ve baz da. Dema ku havînê li zeviya nik êtûnê paleyî dikirin, Dijwarê wê bi zarokî tim diçû li ber êtûnê dilîst. Gava ku gihaşt ser qiraxa êtûna kevnare ku hilkumişîbû, hinek kinc û pêlavên mirovan bi ber çavên wê ketin. Gava ku wê gava xwe ya pêşî avêt, kevirê bin lingê wê gindirî û ket, heta binê êtûnê qulobinî hev bû. Serê wê şikestibû, lê pê hay nebû. Hêdîka rabû, destê xwe avêt wî kincî û bi ber xwe ve kişand, kinc riziya bû, hestiyekî milê mirovan bi destê wê ve hat. Wê hestî ji destê xwe avêt û bi herdu destan kevir dan vî alî û wî alî. Piştî avêtina keviran xelas bû hestî derketin. Wê çîqa hestî didan alî qoqê seriyan, dest û çîpê mirovan derdiketin. Hingî ku digiriya ji rondikên çavên wê xwîn dihat xwarê. Bi tirseke mezin ji nava êtûnê derket û reviya lê nizanîbû bê bi ku ve diçe. Wê li ser Dijwarê xwe her zêmar digotin.

Ji tîbûna pişka wê ziwa bûbû, zimanê wê weke yê çûkekî ji devê wê kişiyabû. Hima bêhemd sarınca avê kete bîra wê û raste rast berê xwe da sarincê. Roj esreke teng bû gava ku gihaşt sarınca ku di pala nezêr de di zinarekê de hatibû çêkirin, bê-





hemd di pêlikê wê re xwe avêt hundirê sarincê, li ber avê çok da û xwe dirêjî avê kir. Heta ku karibû vexwar. Wexta av vedixwar di binê avê de tiştêkî spî bi ber çavên wê ket. Destê xwe avêtê û ji binê avê ew tiştê spî kişand. Dît ku hestiyê însana ye bi sew-teke dijar di hundirê sarincê de kire qîrîn, dengê wê tê de li hev vegeriya. Di wê navberê de wek dengê kurê wê bi ber guhên wê ket û paş de vegeriya xwe li xwediyê wî dengî girt. Dengê di zinaran de olan dida: “Dayê ez li vir im! Ez li vir im! Ez li vir im!” Xanê baz dida. Li kevîr û qirşikan diterpilî lê tiştê nedidît; her ku deng di guhên wê de olan dida û wê jî baz dida. Gihîştibû ser berqefa di nava zinaran de û xwe lê vexwar kir, guhê xwe da ser berqefê; ka bê deng ji wir tê an na? Deng tune bû lê loda hestiyar wekî loda êzingan li ser hev komkirî bûn. Xanê êdî ji hal ve ket û nema zanibû dê çi bike. Destên xwe avêt ber sînga xwe û kirasê xwe çirand û ji wir baz da. Gava li pêl ku derê fikir hestî derdiketin, destê xwe davêt ku hestî bi destên wê re dihatin. Destên xwe ber bi jor ve kir; “Xwedayooo! Xwedayoo! Axa vî welatî tev de bûye hestî, ma tu

nabînî, çem xwîn diherikin, şikeft û berqef bi hestiyar hatine dagirtin? Çi gavên ez davêjim li hestiyar diherrepilim. Aax, ax, ma ev çi tofan e hate serê me? Ma heta kengî em ê li gorê bê nav û bê kêlik rast bên? Ma tu nabînî tu nabihîsî? Bes e, bes e, beseee, beseeeeee!”

Xanê edî bi şev û roj li daristan, çol û çiyar digeriya. Ne xwarin ne vexwarin dihat e bîra wê. Bêrawestan digeriya. Malbatê her ku wê tanî malê jî, li mal nedisekinî. Êdî karê wê bûbû gera çol û çiyar û gotina li ser hestî û wendayîyan. Heşê wê nemabû, wê her zêmarên xwe digotin û dibilandin. Bi hêviyên rojekê ku li gora Dijwarê xwe rast bê yan jî xebereke xêrê jê bigire, bi wan xeyalan wek însaneke nîvmirî dijiya.

Êlih
05.12.2011

Holik

Berfo BARÎ

Ji Xwedê re çav dişkênand
Holika bi bayê re di reqsê de
Şingeşinga kevçiyar
Newayek henûn jê difûriya


Bi kovaniya êvarê ve
Çiroka Mîrze Mihemed dadileqand
“De êdî ew û Xwedayê xwe”
Heta ku xewê li derî dida

Di paşila stêrkan de
Li pey xewnan
Zarokeke/î diya xwe
Mêrekî jina
Ezebekî balîfê xwe
Keçikekê dildarê xwe
Pisikekê xwediyê xwe
Holikekê kazoxê xwe
Kazox bana xwe
Hembêz kiribû bernedida

Da ku beyanî başiyê dida
Şorbe dikeliya
Zarok digiriye
Mêrik diqêriya
Holik dikeniya
Şev û şevê diqediya

21.12.2010





Destar

Feratê DENGİZÎ

Mirov, çawa bû mirov? Gelo, gav bi gav pêşde-
çûyin bi çi astê bû? Çi kir ku di bedenê de guherîn û
veguherîn çêbûn? Pirs xweş in û sedema hebûnê
ne.

Li gori zanyariyê, rola zad; ceh, genim, nîsk û
herwiha û rola tirî, ava tirî, ava ceh û zeytûn û zeytê
û tewaş zehf girîng û jiyani bû.

Bala te her li ser zad e, lewra ev hebûna we û de-
rûdora we ye.

Ku zad ket bîra te, destar jî li dû ye. Dest+ar,
Destar; yanî bi 'dest'an 'ar' tê çêkirin. Dest arvan
çêdikin; ar, arî, arvan... peyv û daringên bingeha
hebûnê; ax yanî xak, av, hewa û agir (ar) bi bîr
tanîn; arvan, bingeha hevîr, a nan, a xwarina sereke
û esasî ya bedenê, bedena mirov... Ku pê hiş û mejî
jî pêş diçû, digiha. Yê ku arvan bi destan çêdikir;
destar; du kevir in. Du kevir; ê li jêr pehn û di nê-
reka wî de darekî kin î şayikî xweşidandi heye, yê
ser pehn û nêreka wî qul e ku dikevin ser hev qula
yê jor dikeve wî darê şayikî. Destikê yê jor jî li kê-
leka wî ye û zexim e. Dora qula jor carinan bi hevîr
mîna bedena Amedê dorpêç kirî ye. Zad di vê qulê
re dikeve navbera herdu keviran, yanî herdu feran
û hûrêrî dibe. Hilbet ku fêra jor bi xêra destê ze-
riya te bigere! Ew destên xweşik, afirîner û pîroz
destar dihêrin mîna qedera te, mîna qedera we ya
me... Û herdu fer jî ji kevirên aşan in, (Aş, xwarin e
û xwarinçêker e.) Pir sert, tund, hişk, bixurî, mîna
hestem in. Ew dihêrin û zûbizû nahelin. A, ev des-
tarekê biçûçik bûye bingeha aşên avê ku zemanekî
palûke, pewlîke yanî febrîqaya dema feodaliyê bûn
û bûn bingeha karxaneya moderîn. Arê, arvanê vî
destarî mejiyê te xurt kir, mîrê min! Arvanê ceh,
genim, nîsk û bulxwir... Te (we, me) ji ajalîyê xelas-
kir û ber bi mirovahiyê ve anî.

Vê sibeha mehlûm a zivistana Amedê ku, Bayê
Qerejdaxî bi sar û seqema xwe poz û rû li te kiriye
sêva sor berê hişê te da ku!

Ev nivîsa te ya yekem ku te ji bo hejmara nû ya
rojnameya bi zarê te ya tim qedexê nivîsandibû,

divê bigihata destê wê. Tu û hevalên xwe di lezû-
bezê de ne.

“Hê Mihê ecele bike. Şenol xwe nehejîne...”

“De bise lo... Xoce, ez dişemitim. Her der cemed
e. Min dused danî cem Daşo.”

“Baş e.”

“Wele, her bijî... He, he hele binêrin! Te topê
rojnameyê daniyê pişt guhê xwe. Ev jî tevdîreke nû
ye? Ma gule bi rojnameyan ve naçe?”

“Henekê xwe meke. Hê xwîna rojnamefiroşê li
ber bazara mast ziwanebûye!”

“Divê ev rojname berî qedexê û hevdanê belav
bibe. Em xwe bigihînin Mêrgehmedê.”

Ew di nav laqirdiyan de ne. Tu li pey hişê xwe yî.

We hê ji zaroktî pir ji hev hezîdikir. Ku we karik
û berxikên xwe li guheran diçêrand û çav li qertelan
diketin. Awaza we mîna qorneya qemyona Welîko
ya xerabe hildibû:

Teyro teyro tilûrî
Girara bavê te fûrî
Tiştê neket wî hûrî
Ji xeynî nankî tenûrî...

Jixwe ku qemyonekê berê xwe dabûna gund hûn
bi keviran, ew jî di nav koma we de, di êrîşê de bûn.
Bi ducarî û teqla xweşgotinoka: “Temafla dewletê.
Topa Xwedê lê ketê...” we qemyon dida ber keviran.
Hê jî tu nizanî we çima wisa dikir!

Ku we bi hev re nan ji pîrikên xwe re dibir şkefta
dolabrêsan, hûn tevlî dûrika wan jî dibûn:

Vîng vîng dolabê
Singê'm xware pê nabê
Birê'm çûye Intabê
Dolab nanî kurik anî...

Hesreta pîrika te ya birayekî bi vê dûrikê wek
hevgotina kurdan î ji bo zarokê kur bû. Tew ku êva-
ran hûn diçûn şev bihêrkên hev, lîstika zarokan ên
malê tevan a berî razanê li dar bû. Hûn tev li tenîştê
hev bi rêzê rûdiniştin û we lingên xwe dirêjdikirin,
ling tev li ba hev. Bi hejmara “yek dudo, bawer sisê,
çeqla fisê, qesra Elî çarde derî, xulxule ye barûde ye



bîst li te ye...” yê ku bîst lê diket, derdiket yek dima paşê. Wî yekî radihişt şiveke kinik an jî stûpaçeke sergirêdayî ya bigupik û ling dihejmartin:

San axa santir axa
Kun axa kundir axa
Qan axa qantir axa
Hilifi, milifi, çarçûlifi
Benê sor, kete vî
Min ji vî, ev dibê...

Ku digot “ev dibê”, ew ling derdiket. Wisa, wisa heya ku lingek dima dawî. Îjar ew ling bi şivikê yan jî bi bi gupika stûpaçe dida ber derban. Ku lingên xwe vedişart, îjar dadida dest û tiliyan û bi ber re digot, “pîrê dibê tilorka veşêr... pîrê dibê tilorka veşêr...” heya ku dest û ling li rebenê / rebeno sor dikirin.

Belê zaroktî xweş bû, lê xortanî na! Qehr û kezebreyê di xortaniyê de serî li we gerand, wek tevayê emrê we.

Wexta ku ew bi serê xwe yan jî bi qîzîkên hevalên xwe re dihatin destarê we, ku destarê we bitenê hebû li gund, tu bi rûsorî û dilgermî guhdar û carinan tevlêkarê dûrikên wan bûyî. “Bihêre, destar bihêre...” û “Kêzîzerên gundê me...” dûrikên we yên hevpar bûn. Rast e, ew êdî kêzîzer bû û bitenê bi saya destar we hevdu didît. Dilê te bi hezar sondî digot, dilo pepûko dilo bi hezar baweriyî digot, “Wele tu horî yî, tu perî yî, tu zerî yî kêzîzera min... Horiya ji bavûkalên me Hûrriyan mayî ya li ser pelên Qur’anê. Periya bi perûbask î li ezmanê xewnûxeyalên min. Zeriya gundê wêranî kêzîzer... Tu

dîlbera Feqî yî, ez dilê berê te, ez dilê sêngûberê te... Tu pesn, tu meth têra te nake, te nîne ser zar û zîmanan.” Lê mixabin; neyartiya ji bavûkalan a li ser vê axê, dexsiya tûpîşkî ku mijokdar û serdestan kiribû havênê nanê we, dirî bû, diriyê çalo bû di navbera we de. Destar jiyana we dihêra mîna genim, bilxwir, nîsk û herwiha. Hûn negihan, nagihên hev. Hûn kedkar û xwedî ax û xwêdanê... ew xwedî şûr û xencer û zordar û talanker, xulamên axa û began, êrîşker û cerdevan... Evîna te, evîna we bêsiûd bû, evîna dêrana warê bînav, dêrana Feratê bêwar... We ne ji emrê xwe ne ji evîna xwe têr xwar!

Lê niha! Lê niha! Tu dibêjî; “Horiya min... Hûn tev horî, perî, zerî, kêzîzer û dîlberên serê çiyê ne, milyaketên çiyê... Karxezal û mîşêrên çiyê ne... Artêşa we evîna pîroz ya Şîrînê û Zînê ye. Min ev jî dît, bes e... êdî aşê me rast digere. Destar êdî jiyane ji me re dihêre. Destên ku destêkê destar girtine û dizivîrînin ew destên narîn û nazik û milyaketî ne.”

Bi teqîna derbeya dijwar a rihgeniyên serkumik tu û rojname tev li erdê dirêjkirî ne. Xwîna sor rojname kirine gula sor, wek şemla gulabidûn li ser rûyê te... Dilopa bîra te ya dawî li ezmanê Deriyê Ruhayê bi mijê tarî du hevok dinivîsand:

“Gelo wê ev nivîs xwend?! Gelo wê bixwîne?!”

15.02.2010-Amed

Rojek ji van rojan

Gabriel Garcia MARQUEZ
Wergera ji îngilîzî: Azad EKKAS

Elenda duşemî germ bêbaran hil hat. Oreljo Eskovar, diransazekî bê bawernamê û zûrabekî çalak bû, klînika xwe di demjimêr şeşan de vekir. Ji merkanekê rahişt çend diranên çêkirî, ew hîn li qalibên xwe cesê siwarkirî bûn. Û li ser maseyekê de destke alavan li gor mezinahiyê rêz kirin, mîna ku di pêşangehê de bin. Kurtikekî bêberstû yê ravrav li xwe dikir, li ber stûyê wî, ew bi qopçeke zêrîn hatiye girêdan, û pantolonekî bi bendeşalekê ber jor kişandî ye. Diransazê rep û çermelaq, nêrîna wî kêmcaran li gorî bûyerê bertek dida; bi nêrîna kesên şer.

Dema tiştên xwe rêz kirin, behrema (şixab) ber kursiya diransaziyê kişand û rûnişt da ku diranên çêkirî berdax bike. Xuya dibû ku, qey ew bala xwe nade karê di nav destan de, lêbelê bi ahengdarî berdewam dikir, pê li pedala behremê dikir ta jî dema pêdivî pê nîn bû.

Piştî heştê hinekî rawesta da ku di pencere re li asîmên seyr bike, çavên wî li du sîsarkine endîşedar

ketin, wan li ser karîteya xaniyê kêlekê bin tavê xwe ziwa dikirin. Vegeriya ser karê xwe tevî wê ramana ku berê firavîne wê baran dîsa bibare. Dengê tûj ê kurê wî yê yazdehsalî baldariya wî tevlihev kir.

“Bavo!”

“Çi?”

“Şaredar dixwaze zanibe gelo tu yê diranê wî hilbikî.”

“Jê re bêje ez ne li vir im.”

Wî diranekî zêrîn berdax dikir. Ji xwe dûr kir û ew bi çavên nivgirtî seh kir. Ji odeya bendewariyê ya biçûk kurê wî dîsa qêriya:

“Ew dibêje tu li vir î, çimkî dikare te bibihîse.”

Diransaz hîn diran seh dikir. Hetanî wî diran bi teşeya xwe ya dawîn danî ser masê, hînga tenê got:

“Dê hîn baştir be.”

Behreme dîsa vexist. Wî çend pireyên diranan ji quteyê karton derxistin. Tê de tiştên temam nebûne rêz dikirin û dîsa dest bi berdaxkirina zêrê kir.

“Bavo.”

“Çi?” Wî çehreya xwe qet neguhert.

“Dibêje ger te diranê wî hilnekir dê guleyekê berde te.”

Bêyî ku bilezîne, û bi liveke bi carekê ve aram behreme sekinand, ji kursiyê bi dûr xist. Berkêşka jêrîn a masê rind kişand. Şeşderbek tê de bû. “Baş e,” wî got. “Bêje bila were û guleyê berde min.”

Kursiya xwe ber bi diwêr ve kir, destê wî li ser keviya berkêşkê bû. Şaredar li ber derî peyda bû, wî aliyê çepê ya rûyê xwe teraş kiribû, lêbelê li aliyê din ê nêpîxî û biêş, rîheke pêncroji hebû. Di wan çavên damirandî de diransaz çend şevên bêgaviyê dît. Berkêşkê bi gûmikan girt û bi nermî got:


“Rûnê.”

“Beyanî baş.” Şaredar got.

“Beyanî baş.” Diransaz got.

Heta ku diransaz alavan bikelîne, şaredar kiloxa xwe da balgeha serî ya kursiyê û hinekî vehesî. Henaseyên wî cemidî bûn. Klînîk xizan bû: Kursiyê textî a kevn, behrema pedalger, sendoqeke belûr tede şûşeyînê kaşîn hebûn. Li hember kursiyê pencereyek hebû, perdeyê digihê milê mirov lê bû. Dema ew bi nêzîkbûna diransêz hesiya, ling dan hev û dev vekir.

Oreljo Eskovar serê şaredêr ber bi roniyê ve kir,



û piştî ku diranê têşe seh kir, erzinga şaredêr bi hê-dîka girt.

"Divê ew bêbenc were hilkirin." Got.

"Çima?"

"Ji ber ku ba te kînor heye."

Şaredar li çavên wî nêrî. "Xem nake." Got û hewl da bigirniye. Diransaz bişîrîn lê venegerand. Wî le-gana alavên paqijkirî anî maseya xebatê, û bi mû-çingeke sar û bê lez ew der dixistin. Û bi keviya qonderê tîfdank da alî û çû destên xwe ser destşokê bişon. Evên hanê tev de bêyî li şaredêr binihêrt, kir. Lê çavên şaredêr her lê bûn.

Diranê aqil ê jêrîn bû. Diransaz ling jev vekirin û diran bi kelpetana germ girt. Şaredar kursî pihêrt girt û zora xwe da lingan, û bi kuneke cemidî di gurçikan de hesî, lêbelê tu deng jê nehat der. Diran-saz tenê bazendê xwe livand. Ne tenê bê tu kîndarî, lê di ser de jî bi dilnermiyeke tûj got:

"Niha tu yê berdêla kuştîyên me yê bîst bidî."

Şaredar bi qirpîniya hestiyên erzingê hesiya, û çav jî tijî hêstir bûn. Lê wî henasek berneda ta tîgî-hîşt ku diran hatibûye hilkirin. Dû re di nava hêsti-ran re wî diran dît. Xuya dibû ku diran ji êşeka wî gelek biyanî bû bi awayekî ew tînegihîşt raza êş-kenceya pênc şevên borî.

Xwe bi ser tîfdankê de xwar kir, xwê dida, he-nase vedidan, bişkojên êlekê teng vekirin û dest

avêt berîka pantolon, ji bonî mendîlê. Diransaz pê-çikeke pak dayê.

"Hêstirên xwe vemale," wî got.

Şaredar jî wergî kir. Ew dilerziya. Hetanî diran-saz destên xwe şûşt, çavên şaredar li ser arika li ber ketinê ye gerandin, tevnepepekeke hebû tevî hêk û kêzikine mirî tozgirtibû. Diransaz vegeriya destên xwe ziwa dikirin.

"Here nav nivînan," wî got, "û bi ava xwêyê xer-xere bike." Şaredar li pê bû, tevî silaveke leşkerî xatir xwest, û ber bi derî ve meşiya, ling dixuşan-din, bêyî êlek bigire.


"Fatûre bişîne." Şaredar got.

"Ji te re yan jî ji şaredariyê re?"

Şaredar lê nenihêrî. Derî girt û di çavika derî re got:

"Eynî gûxwarinê ye."

Marquez, G. G. . "Collected Stories." Trans. J. S. Bernstein. Vol. 3rd. London: Penguin, 2008. 98-100.



Meşa dereng

Robert FROST
Ji Îngîlîzî: Rizgar Elegez

Gava di zevîyên dirûtiyê re dibihurim,
Dûmahî bêserî,
Nerm-raxistî fenanî aşanê şilavî,
Şiverêya baxçeyê nîvvekirî.

Û kata hatim nav baxçeyî,
Çivteçivta çivîkên hayjixwe
Bilind dibe ji giloka pûşê zenûn
Bikesertir e ji hindek kelîme.

Darek li ber dîwêr bi tenê,
Lê belge xwe girandike li zerbûnê,
Sergêj, bêşik, ji şayîşa min,
Tên xirtinî hêdika ji binê.

Ji derçûna xwe ya dûr re dawînîn im
Ji hîlbijartina avgona şîn ê
Ya şûnmahîyên dawî yên kulîlkên keştîyê
Bînim ji te re bişînim

Keça serhildêr

Çekdar SAVÛR (Dogan AYDIN)

Ji bo wê xweha min î ji bilî wêneyan ku min ew qet nedîtiye;Rojhelat...

Çi xweşik in ew çavên wê(!);
Mîna ava ku li lûtkeyên çiyê dihêwirin,
Mîna gulên fiskanî,
Tena û dilniwazî...

Çi xweşik e porê wê(!);
Mîna hetavek bişîrîn e,
Dirêjkin î şemalî
Mîna ahenga, guldesteyek melodiyên bimesal,
Mehzûn û hafi...

Mîna camêriya tebî'etê: ku di qedimîne nuwazan;
Ji pembûyan mîna pembû
Çi germ û nermikin ew destên wê...

Çi raperîer in ew awirên wê(!);
Sîtembar û asê...
Mîna zarokê serîhildaneke dîrokî
Ji wan zarokan;
Ew keçeke serhildêr.

2002 Botan

DILAWER ZERAQ

Dilapek barane pênûs
Dihêrîke di xake dilên nêgar de

Kalmek esman anî bi xwe re
Derdêk hestiyên zarokên enfalê

Her demsalek mariyek keske fireh dibe li dilê
Ji rengê azadiyê ye pencereyên di tîrê dinîhêre
û mirovahi nêwazêk bi ax û figan

Her êş e bariye li ser rûyê bajarê wî
Ji ar û pête wek şevê di hête isq
Bilind dibe di warê tenêtiyê

Jiyan li ser pênûsa wî beytak û nêrgîz e
Teyreke di bin baskandê bahozên bextewariyê
û her ji taldeyên helbestê nêmeyan verêdike
Ber bi kesên ji emrê xwe nezanî

Derwêşêkê ew

Konê xwe

Li dilê me, li esmanê kurdiye danî
12.01.2012

Berken Bereh

B. Bereh

Ji helbestên lerzerdê

Sidîq GORÎCAN

Zîpik

lawiko
herkes kon û zexîre dixwaze
li vî gundê hejrûxandî û xirabe
tu ji min wê tiştê sor û sifnestêrk dipirsî
ku dixûyê di paşîya texsiyê de
ha ji te re xwarzê
ew zîpika keçîka min e
dest î lê şikestî ye lê tişteke nabe
bide ber vî bayî
bila bizivire bi têra dilê xwe
hêj ku baran neketiye lezê
hêj ku avzêmî heye li melhezê

25 Kewçêr 2011- Wan

Veger

çîroka 'mesela wijdan e' xelas
gêj û bê hal im niha
bi dilê xwe yê tektonîk û bilave
dîsa divegerim perava dilê Kurdistanê
heyîva ku li aliyê Başûr
li ser mil û çiyê ve direwniqe
dişibe heyîva zarokatiya min
ku diçûm maldoriya li ber pez carcaran
wek şivaneke/î biçûk
wek zarokeke/î ji dildaran

Berfanbar 2011 -Tetwan

Perav

li bajarokê artemêtan li devê behrê me
melûliya bajarê hejê
ketiye bin sermaya zivistanê
para zelaliya avpêlên biçûk bûye ax û lorîn
balafirek jî hiljor dibe û dikeve bi ser ewran
winda dibe ji bînahiya çavan
zemîna bin pê min
çanê ku bilive, dibe
nizanim, dibe ku ji lêdana qelbê min be
mala minê
xasxaska ku dixwaze kêsa xwe li nêçîra xwe bîne
ne mîna berê ye
ew jî çeng û per lê şikestî ne

Berfanbar 2011 -Wan

! - ; ... , () . ? ” : ‘

*Îmad BERNAS***(‘rastiyek û çîroka vê nivîsê’**

-ev beş ji devê yê ku ev nivîsa nivîsiye hatiye nivîsîn-

Di serî de ez rastiyekê bêjim û bi rastî dest pê bikim; ez nizanim ez ê çi binivîsim lê li hêla din dixwazim binivîsim jî, ji bo çi dixwazim binivîsim? Ne ku mijar li ser Wêjeya Kurdî ye, ji ber ku mijar nivîse/ nivîsandin e û... her çi qas ez nizanîbim ez ê çi binivîsim jî ji peyva ‘wêje’ yê çavên min zîq bûn û yekser ev çend gotinên ku li derdore tîna guhê min ; “min ev roman e xend zor zor mûkemmele kaka”, “ev helbestên vî camêrî bi kêrî tiştêkî nahên”, “bi rastî min ev çend berhamên vî camêrî yên çîrokan xwendin lê tu bawer biki ev berhemên vî camêrî tunebin jî tiştêk ji kurmanciyê kêr nabe”, “ev berhema ‘...’ duyemîn a ‘...’ gelek jêhatî û serekeye min jî nû xwend teqez gere tu jî bixwinî heyran”... ez xistim nav ramanan û min jî gote xwe ka tu jî çend gotinan bêje heyran!)

Destpêkeke Eletewş;**Kurdî... wêje... xwendevan... çav...**

-ev beş bêxwedan e-

wêje: herf, tîp, peyv, hevok, paragraf, helbest, çîrok, ceribîn, roman...

xwendevan: dev, dest, pî, mil, çîp, por, lêv, diran, guh, zik... Çiyê wî/wê ji nivîskarekî/ê kêmtire. Nizanim jixwe ev ne mesele ye lê xwendina wî/wê ji ya nivîskêr pitirtire(?) ji ber ku xwendekare yanî kesê/a ku dixwêne.

kurdî: k, u, r, d, î.

çav: retina, kornea, îrîs, pupilla, palpebrae... welhasil dîtin.

(navê vê dosye yê çima ‘bi çavên xwendevanan wêjeya kurdî’ ye ‘ji pênûsên xwendevanan wêjeya kurdî’ bûya wê xweşiktir nebûba ma? Nav ne probleme lê em navê dosye yê bikin ‘ji devê xwendevanan wêjeya kurdî’ û li ser navê kovara W’yê panelekê lidar bixin wê xwendevan bêhtir bala xwe nedinê gelo(?)!? Dibe ku herkesek nikaribe binivîse, bêhe- nek.)



**‘bi çavê xwendevanekî’ an jî
‘ji pênûsa xwendevanekî’
çend gottinên bêserûber:**

-ev beş bi devê yê ku dixwêne hatiye nivîsîn lê qebl neke jî dibe-

Pîvanên ‘baş’ û ‘xarabê’ çi ne? Ev pîvan ji bo çi ne? Van pîvanan kê/kî li gor çi amade dike?...

Dema ku min kirasê pirtûkekê-berhemekê rakir û daxilî ser çermê wê bûm pel bi pel; ji xeynî vegotin û zimanzaniya nivîskar (ev jixwe gere yekser hebin) û herikbariya berhemê (nebe jî dibe), ew pirtûk-berhem-roman ku bikare di nav mejî yê min de mentalîteyeke nû avabike û yan di jiyana min de, ber bi ‘baş’iyê ve, tiştina biguherîne û bikare min veguherîne ev/ew berhem li ber dilê min şêrîn û rengîn dibe û bo min dibe pirtûkek-berhemek (çîrok, novel, helbest, roman...)

'baş'(baş û xerab-li gor kê û li gor çi, ev ne xeme).
Bo nimune du berhem û du nivîskar;

1) Romana Helîm Yûsiv 'Tirsa Bê Diran';
dema ku mirov kirasê vê berhemê radike û daxilî
ser cendekê wê dibe gav bi gav mirov rastî 'tirs'ê tê
û 'tirs'ê nas dike, bi dû re nivîskarê romanê pêşiyê
bi rêya lehengê romanê xwendevanê xwe hêdî hêdî
hînî 'tirs'ê dike û piştî ku mirov hînî tirsê bû û ew
nas kir mirov bi rêya serbûriyên lehengê romanê
hînî 'netirs'îyanê dibe. Ev roman li ser tirsê ava
bûye lê rûyê tirsê ji serûçavên mirov paqij dike û
tirsê radestî mirov dike. Di vî warî de ez bi raya vê
berhemê dikarim di jiyana xwe de xwe radestî tirsê
nekim. Çiqas rast e ev para min e. Ma ne we rê ye?
(Te ev roman xwendiyê, tu çi dibêjî, dibe ne wisa be
jî? ...)

2) 'Mîrname'ya Jan Dost; romaneke diro-
kiye ev berhem. Di vê berhemê de nivîskar, kariye
cenabê Ehmedê Xanî wek kesekî wê serdemê ve-
bêje û nîşanî me bike ku ew jî mirov bûye û mîna
me bi xwîn û can û laş û qam û bi cil û berg bûye...
û kariye bi halê cenabê wî ê di nav jiyana rojane de
takekesiya wî û felsefeya wî û tesira wî ya li ser gel
bi mentalîteya romanê bi me bide naskirin. Hewce-
darî bi gelek gotinan nîne axir-kelam di vê berhemê
de nivîskar, şexsiyeta cenabê Xanî û felsefeya wî bi
şêwazek serketî radixe ber me. Û bi ya min ku ber-
hemek bikare şexsiyetekî mîna cenabê Xanî bi awa-
yek serketî bide ber min bo min ew/ev berhem dibe
berhemek 'baş'. An na? (Ji bo te çawa ye? Tu ji
kê/kî dipirsî û çima? ...)

A rast li ser berhemek 'xerab' ango ne'baş'
ez nikarim tişteki bibêjim, jixwe herkes li ser
'baş'an diaxivin navê başa dibêjin lê dema dem hate
xerabê ne nav xuya ye ne jî berhem!
pesindarê 'baş'a pirin lê rexnegirên 'xerab'a nînin
hebin jî xuya nînin...
Bo nimûne du berhem û du nivîskar;

3) Ev roman "... " ku nivîskarê wê ev e "... "
bi kêrî tişteki nayê. Min xwend heta min du caran
xwend lê min tişteki jî jê fêhm nekir. Ez nizamim le-
hengê romanê jî kê/kê ye. Heyfa wextê min bi vê ro-
manê ve derbas kirî. Kuro ma roman wisa ne? Wisa
tên nivîsîn?... Belê wisa ne û wisa tên nivîsandin û
her romana tu jê hez nekî û jê fêhm nekî û lehengê
wê nas nekî romaneke xerab e ma? (Te ev roman
nexwendiyê ne wisa? ...)

4) Ew berhema "... " a ku ji pênc beşan pêk
tê a bi navê "... " hema nebe jî dibe. Zêde dirêj
nakim serê te naêşînim tu bixwînî tu yê bibînî ka
çawa ye, lê şîretê li te wextê xwe pê ve winda
neke. Tu vê bixwînî baştir e tu poşman nabî. ... Serê
min neêşîne jixwe navbera min û kurdiyê qet tune
ev berhem û ew berhem li te û li kurdiya te pîroz
bin. (Te jî niha pirtûkên wisa xwedine û rastî kesên
wisa jî hatiye, ma ne we rê ye? ...)

Dawî

-ev beş ji devê yê ku dixwaze çend gotinan bêje û
çend pirsan bike hatiye nivîsîn-

Belê mirov nikare pîvanên baş û xerabiyê
di hunerê de bi gelemperî aşkera bike. Berhema ji
bo min baş li ber dilê te xerabe, ya li ber dilê te
yekta ji bo min ne tişteke. Gelo mesele 'baş' û 'xe-
rab'îya berhema ne? Berhem ewqas pîrbûne ku êdî
em baş û xeraban ji hev cuda bikin?
Em ê berhemên wêjaya kurdî yeko yeko bidin ber
hev an jî em ê bi 'yên din' re bidin ber hev, çawa, bo
çi? Hewce ye mirov berhemana bide ber hev? Me-
best? Baş? Xerab?
Kilasîkên kurdiyê li ku?

*Nîşe: li ciyê ku peyva berhem/roman lê derbas
dibe ku lê bê hûn dikarin wek helbest, çîrok, pex-
şan hwd. jî binirxînin/bibînin*



Dosye : Wênekêşîya kurdan
Amadekar: M. Masum SUER & Omer FÎDAN

Kurtenêrînek li ser dîroka wênekêşîyê
 li Kurdistanê
Dêrsim OREMAR

Paşa Îmrek: wênekêşê 'Deq'an
Hevpeyvîn bi Paşa Îmrek re

Di bin siya dîrokê de Kurdistan
Mehmet Masum SUER

Dîrokî wêne le Kurdistan
Rênas NEWROZÎ

Wênekêşîya Kurdan û çîroka 'em ên winda'
Veysî ALTAY

"Wêne cemidandina demê ye"
Hevpeyvîn bi Mehmet Masum SUER

Wêne ji belegeyeke mang û sakîn
 ta bînahîyeke tevgeran e
Teymûr EVDIKÊ

Wêne, di hemû welatên cîhanê de ji bo hişmendiyeke, mêjiyê an jî têgihîştînek hevbeş bê afirandinê tê bikaranîn. Divê gelê Kurd jî wêne û wênekêşîyê ji bo vê armancê bi kar bînin. Pêdiviya Kurdan ji her demê bêhtir bi vê yekê heye. Û bi vê yekê ve girêdayî arşîveke hemdem û hevbeş a Kurdan heta niha tune ye. Bi vê tevgerê wê arşîvê jî derkeve holê.

A duyemîn jî, şîrovekarên hunerî dibêjin, "Zimanê wêneyan zimanekî navneteweyî ye". Ev yek pir rast e. Ji bo ku wêneyek bê fêhm kirin pêwîstî bi wergerê tune ye. Ji ber vê taybetîyê wêneyan, gelê Kurd, pîrsgirêkên û daxwazên xwe, çand, mirov û erdnîgariya xwe bi hêsanî dikarin bi saya wêneyan ji gelên cîhanê re vebêjin û ji bandorkerîya wêne sûdê bigirin.

Kurtenêrînek li ser dîroka wênekêşiyê li Kurdistanê

Dêrsim OREMAR

Wêne, hewara duh, bêdengiya negotiyan...

“Mirov bi dîmenan dijîn û herçend ziman bi peyvên cuda û netewe bi rengên cuda mirovan ji hev cuda dike, lê bi hezaran sal in du zimanên sere-tayî, hê jî zimanê hevbeşê mirovan in: Muzîk û wêne.

Wêne cîhana peyvên negotî û xwedî çirokekê ye. Gelek caran wêneyek bêhtir ji tekst û nivîsan rastiyan digihîne muxatebên xwe. Wêne berovajî nivîsan derfeta hizirîn, şirove û nirxandinê bo bîneran dihêle da ku ew bixwe rastiyan bibînin, binasin û şirove bikin.

Huner di rastiye de afirandin e. Lê wênekêşiyê xwe li pan û berînatîya afirandinê werpêçaye.”

Fotografia (φωτογραφία) peyveke yewnanî ye



ku ji du peyvên “Phos” û “Graphi” pêk hatiye. Foto ji peyva “Phos” bi wateya ronahî û grafia ji peyva “Graphi” bi wateya nivîsandinê tê ku wateya fota-grafia dibe: Nivîsandina bi ronahiyê.

Di rastiye de odeya tarî bû sedema peyda bûna wênekêşî û makîneya kamerayê. (1)

Wênekêşî ji sê beşên ilmî, senetî û hunerî pêk tê û weke bûyereke ilmî ji dayik bû, weke senetekê berfireh bû û weke hunerekê hate tesbît kirin.

Di serdema beriya îslamê de kurdan xaniyekî tarî çêdikirin û kuneke biçûk tê de dihêlan, ger xwestibana wêneyê zilamekî bikşînin li hember vê kunê radigirtin û resamekê/î di hundurê xanî de risim dixiste ser tiştêkî meqlûb û bi qelem mijûlê kişandinê dibû. (2)

Bi wî awayî aşkera dibe ku gelekî beriya ku kameraya wênekêşiyê li Ewropayê bê çêkirin di serdema pêş îslamê de kurdan bi awayekî pir sade dest bi resimkirinê, kirine.

Husên Huznî Mukiryânî yekemîn nivîskarê kurd e ku di sala 1925'an de wêneyê xwe di kitêbeke Kurdî de bi navê (Xunçey Beharistan) ku li bajarê Helebê çap bûye de belav kiriye. (3)

Yekem makîneyên wênekêşiyê li Kurdistanê

Kameraya wênekêşiyê di destpêka sedsala 19'an de hate nav çiyayên asê. Biyaniyan ev emraza nû anîbûn. Ev kamera bi dest, wêneyên şah, derûzeker, axa, kirmanc, serokeşîret, mehkûm û dîmenên sirûştî yên herêmê dikişandin.

Gerîdok, mîsyoner û rojhilatnasên biyanî, ango gerîde, bazirgan, dîplomat û sîxurên ku bi wefde dihatine Kurdistanê yekemîn kesên ku kamera anîne Kurdistanê tên hesibandin. Navdartirînê wan kesan ku makîneya wênekêşiyê anîne Kurdistanê û wêneyên gel, awayê jiyanê, xwezaya Kurdistan û mîmarîya bajaran bi kamerayên xwe qeyd kirine: Kurdnasê navdar ê Frensî Henri Binder di sala 1887'an de, Lokunt Duşulê di sala 1892'yan de bûne.

Helbet kişandina wêneyan bi rêya kamerayê piştî çêkirina wêneyên destî bi qelem û firçeyên gerok û rojhilatnasên wek Mistêr Riç di sala 1820'an û Turnefort di sala 1717'an de hatine kişandin.

Piştî Henrî Bînder û Duşulêtê Frensî di sala (1887-1892) bi dehan rojhilatnas û kurdnasên din hatine Kurdistanê û bi sedan wêneyên curbecur ên kurd û Kurdistanê kişandine. Heta digehîje Hamêlton, W.R.Hîe, û Mîcêrsun di salên 1910 û 1920'an de. Herçendî ev kes li her derên Kurdistanê negeriyane û wêneyên bi sedan kesayetiyên kurd li ber dest nîn in lê di rastiyê de ger kameraya wan kesan nebûya niha gencîneya wêneyên derbarê kurd û Kurdistanê de li ber destên me nebûn. (4)

Kameraya wan rojhilatnasan tenê li ba wan û ji bo karên wan bûye û piştî bi dawî hatina karên xwe ew jî bi xwe re birine û çî studiyo-yên dikanên wênegiriyê li çî bajarên Kurdistanê venekirine. Herçendî wan hunera wênekêşiyê nîşanî kurdan nedane lê çawa jî be ew makîneya balkêş û nû anîne herêmên çiyayî û şarên Kurdistanê û dikarin serokeşîretên kurdan ku li her du aliyên sînorê Îran û Osmaniyan de dijîn bînin pêşîya makîneya efsunewî û wêneyên wan ên mayînde ku niha beşek ji rûpelên dîroka me ne bikişînin.

Kurdan kengî hunera fotograf û kameraya wênekîşandinê nasîne?

Li gor agahiyan heta dawîya sedsala 19'an jî tu belgeyek di dest de nîne ku kurdan kameraya wênegirtinê nasîbin yan tu studyoyeke wênekîşandinê li Kurdistanê hebûbe. Belgeya selimanidîna wê rastiye jî ew e ku wêneyên tu navdarên kurdan, helbestvan û axayên kurdan li ber dest nîn in û nehatine dîtin.

Wêneyên babê Şerîf Paşa (Seîd Paşayê Xendan), Ebdulrehîmê Hekarî, Îshaq Sikutî û çendîn navdar



û kesayetiyên din ên kurd di navbera salên 1887-1920'an de li Stenbol, Bexda, Qahîre yan jî li Parîs, Jênev û Londonê hatine kişandin.

Cihû û ermeniyên ku li Kurdistanê dijiyan (bi taybet li bajarên Hewlêr, Silêmaniyê û Kerkûkê) roleke wan î girîng û pêşeng di belavkirin û pêşxistina wê hunerê li Kurdistanê hebûye û yekemîn kesên ku di sala 1930'yan de li bajarê Silêmaniyê studyoya wênekêşiyê vekirine ermenî û cihû bûne. (5)

Yekemîn wênekêşên kurd

Yekemîn wênekêşê kurd ku li Kurdistanê studyoya wênekêşiyê damezirandiye û hunera fotografê di nava kurdan de belav kiriye û wênekêşî kiriye pîşeya xwe, Mihemed Yûsif Sîdîq Xeznewî ye ku di navbera salên 1894 û 1964'an de jiyaye.

Mihemed Yûsif Sîdîq Xeznewî, ji xelkê bajarê Akrê bû û li heman bajarî studyoya wênekêşiyê vekir û wek yekemîn wênekêşê xwedî studyo tê hesibandin. Wî yekem wêneyên xwe di salên 1912 û 1920'an li Behdînanê kişandine, ku wêneyên: Şêx Ebdulsalam Barzanî, Sultan Mehmûd Xanê Efxanî, Tekiyeya Şêx Ebdulêzîzê Geylanî, Xecê û Beybûn û...hwd li ber dest in. (6)

Bi wî awayî jî sala 1912'an û pê ve Mihemed Yûsif Xeznewî, yekemîn kurd e ku kameraya wênekêşîya taybet a wî bi xwe hebûye û studyoya wênekêşiyê li Kurdistanê damezirandiye.

Piştî Xeznewî, dîroknivîsê navdarê kurd, Husên Huznî Mukiryânî yek ji kesayetiyên pêşengên meydana hunera fotografê ye, navborî di sala 1915'an de dema ji Almaniyayê vedigere Helebê, kamerayeke wênekêşiyê ligel xwe tîne û di çapxaneyê xwe ya li Rewandîzê de dadimezirîne û ji bo karê wênekêşîya rojnamevaniyê û belavkirina wêneyan di pirtûkan de sûdê jê werdigire.

Mukiryânî di wê derbarê de dinivîse: cara yekem li Stenbolê li cem Almanan bi rêya kurdan hinî "Qîl û fotolîtuxirafê" bûm. Li Hicaz, Şam û Helebê min ev kar dikir lê nivco bû. Li çapxaneyê Harûniyeyê ya li Helebê li ba gerînendehê wê, Selîm Meter Efendî min hewl da û nêzîkî 30 lîreyan dirav serf kir û hinî wî karî bûm... (7)

Piştî H. Huznî, birayê wî Gîwî Mukiryânî li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê wî karî berdewam dike û bi kameraya xwe çendîn dîmenên zindiyên jiyan, xweza û kesayetiyên Kurdistanê tomar dike û jî tunebûnê rizgar dike.

Piraniya wêneyên bajarê Hewlêrê ku



di navbera salên 1920'î heya 1955'an li ber destan in bi kameraya rehmetî, Gîwî Mukiryanî hatine kişandin.

Gîw di gotareke xwe ya di kovara Zarî Kurmanciyê de derbarê çûna Rojhilat wiha dinivîse: "Ez bi biryara xwe û birayê xwe çûme Sabilaxê (Miha-badê), piştî çend mehan li bajarê Tewrêzê ji aliyê eceman ve hatime girtin û... Ji neçarî min kel û pelên nav malê û kerê xwe firotin û hin tiştên wênêkêşiyê pê kirin. Li Sabilaxê min dest bi wênêkêşî û fêkirina zimanê Frensî di kurseke taybet de kir. (8)

Wêneyê yekemîn di nava çapemeniya kurdan de

Yekemîn rojname yan jî kovara kurdî ku cara pêşîn wêneyê fotografi belav kiriye Kovara "Roja Kurd" e ku li Stenbolê di sala 1913'an de, derketiye.

Kovara navborî di hejmara 3'yemîn de di 1.08.1913'an de wêneyekî "Husên Kenan Paşayê Bedirxanî" li ser rûbergê pêşîn ê kovarê belav kiriye. Herwiha di hejmara duyem û sêyem a kovarê de jî, wêneyê Selahedînê Eyyûbî û bajarekî Kurdistanê belav kiriye.

Duyemîn kovara kurdî ku wêne belav kirine kovara "Hetawî Kurd" e ku di sala 1914'an dîsa li Stenbolê derketiye, piştî li heman warî kovara "Jîn" û "Kurdistan" ev kar domandine. Piştî kovara "Diyarî Kurdistan" a ku di sala 1925'an de li Bexdayê

wêne belav kirine, hejayî gotinê ye. (9)

Weşandina wêneyan bi wî awayî di kovar û rojnameyên Kurdî de, bi taybet li Kurdistan Başûr di salên (1930)î de dest pê dibe û êdî weke teknîk û berhemeke rojnamegeriyê tê bikaranîn.

Jêder û çavkanî:

- 1.Înternet.
- 2.Huznî Mukiryanî, Husên. *Mêjûy Ekassî û firuatî/Hejmara 20 a kovara Zarî Kurmancî* (17.08.1929). Çapa nûya hemû hejmarên kovara Zarî Kurmanciyê, Amadekar: Kurdistan Mukiryanî.
- 3.Pîrbal, Ferhad, *Mêjûy hunerî Fotograf le Kurdistan da/2009*
- 4.Jêdera berê.
- 5.Mehmûd Salihe Reşe, Ekrem. *Dîroka bajarê Silêmaniyê*.
- 6.Malpera Radyo Newa, 07.04.2009
- Huznî Mykiryanî, Husên. *Wênegerî û kulîn, Zenguxirafî/ Çapa nûya hemû berhemên H.Huznî Mukiryanî-cilda duyem/ 2011 weşanxaneya Aras.*
- 7.Ji pêşekiya çapa nûya hemû hejmarên kovara Zarî Kurmanciyê, Amadekar: Mukiryanî, Kurdistan.
8. Pîrbal, Ferhad, *Mêjûy hunerî Fotograf le Kurdistan/2009*

Paşa Îmrek: wênekêşê ‘Deq’an

Hevpeyvîn: Mehmet Masum SUER

Hunermendê wênekêşiyê Paşa Îmrekê ji Rihayê, dîroka “deq’an ku hê jî li ser laşê jin û mêrên Riha, Mêrdîn û Sêrtê tîn çêkirin, bi wêneyan kir belgefilm. Pêşangeha “Deq’an ku meha borî li Parîsê hate pêşandan û eleqeyêke germ dît, dê payîza bê de wê li Belçîkayê bê pêşandan. Îrmek diyar kir “deq” jî serdema qebîleyan ve tîn çêkirin, got ku deqa li beşên cuda yên laşê mirovan tîn çêkirin wekî nivîsên pîroz tîn dîtîn û heta roja me jî li Mezopotamyayê ji hêla kurd û ereban ve tîn domandin.

M. SUER: Silav. Beriya ku em dest bi hevpeyvîna xwe bikin, ji kerema xwe tu dikarî xwe bi xwendevanên Kovara W bidî nasîn?

P. ÎMREK: Ez li Hîlwana Rihayê ji dayik bûme, min Fakulteya Zîreatê kuta kiriye û li beşa Sosyolojiyê xwendekar im. Ez endamê koma fotografan a Redê me û bi awayekî serbixwe

xebatên xwe dimeşînim, wêneyên bi naverokeke civakî dikişînim. Xebatên min ên bi navên “Dogunun Çocuk Yuzleri” (Rûyên Zarok ên Rojhilat), “Deq”, “Çingeneler”, (Cengene), Çoplûkte Yaşami Aramak” (Li Ser Sergo Lêgerîna Jiyanê) û “Goçerler” (Koçer) hene, min pêşangeha xwe ya pêşîn bi navê “Deq” li Parîsê vekir. Min 16’emîn Xelata Şehîdên Çapemeniyê û Rojnamegeriyê ya Mûsa Anter a 2008’an wergirtiye û li Tirkîyeyê jî gelek pêşangeh vekirîye.

M. SUER: Te kîngê dest bi xebata wênekêşiya deqan kir û te ev xebat li kîjan bajaran meşand?

P. ÎMREK: Beriya dest bi wênekêşiyê bikim, ez li Rihayê gelek caran leqayî jinên bi deq dihatim. Ev çand û kevneşopiya bi pîr û kalan re, bi ciwanan re tunebû. Ev her tim wekî projeyekê di mejiyê min de bû û min dest bi kişandina wêneyan kir.



Li gelek derên ku ji bo kişandina wêneyan ez diçûmê, digotin, “xwezî tu par bihatayî, her dera pîra min deq bû lê wefat kir.” Min wêneyên xwe li sêqozîya Riha, Mêrdîn û Amedê kişandin. Ji du salan zêdetir e ku dixebitim. Difikirim ku di rojên pêş de di derbarê dîrok û wateya deqan de pirtûkekê amade bikim.

M. SUER: Gelo tu dikarî derbarê dîroka deqan de agahiyan bidî?

P. ÎMREK: Ne pêkan e ku mirov dîrokeke teqez bide, lê bi deh hezaran salan e ku li vê erdnîgariya ku kurd û ereb lê dijîn, deq hatine çêkirin. Tê gotin ku ji dema qebîleyan tê; deqa her qebîleyê cuda bûye û di qebîleyan de deqa her kesî li gorî karê wî/ê cuda bûye. Piştî pêşketina feodalîzmê, ev di eşîr û olan de tê dîtîn. Zanyariyên teqez hene ku her olek û her eşîrek deqek xwe heye. Ev deqên li ser laşê mirovan wekî nivîsên pîroz hatine dîtîn.



M. SUER: Ciyê deqê yê di çanda kurdan de çi ye? Deq ji bo kîjan armancan tîne çêkirin?

P. ÎMREK: Armancên deqan ên roja me û armancên di serdemên kevn de ji hev cuda ne. Di demên berê de ji bo sêrê, ji bo nezerê, ji bo hezkiriya/ê xwe li ser laşê xwe bide jiyîn, ji bo nîşaneya eşîrê deq dihatin çêkirin. Hin kesan jî ji bo xweşîkbûnê deq çêdikin



M. SUER: Heta niha te pêşangeha deqan li ku nîşan daye?

P. ÎMREK: Li Tirkiyeyê ez çûme gelek galeriyan, lê bersiveke erênî nedane min. Piştî bi alîkariya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, li Parîsê hate pêşandan. Ji ber karên vîzeyên min nekarî herim pêşangehê lê gotin ku eleqe germ bûye. Li ser gelek malperan jî hate nîşandan. Le Monde Diplomatique Kurdî jî ev xebata min xwest, min ji wan re şand. Dê di hejmara pêş de biweşînin. Payîza bê jî dê li Belçîkayê bê pêşandan.

M. SUER: Çi taybetiyên kesên deqan çêdikin hene?

P. ÎMREK: Divê yê deqan çêdikin ne jinberdayî yan jî mîrberdayî bin. Divê tenduristiya wan li cî be û divê zarokên mirî neanîbin û zarokên wan nemirîbin. Bawerî ew e ku qedera xerab a kesên deqan çêdikin, derbasî kesên ku li ser laşê wan deq tê çêkirin dibe.

M. SUER: Di gelek wêneyên te de tê dîtîn ku jin lêva xwe ya jêrê bi deqan dikin kesk. Wate yan jî çîrokeke vê heye?

P. ÎMREK: Hema bêje hemû jin li ser erçena jêrê deqan çêdikin. Wateya vê ew e ku lêva jineke carîye ji hêla mêrekî ve hatiye geztin û reşûşin bûye, hemû jinan jî lêva xwe ya jêr bi deqê girtiye û bi vê yekê bertek nîşan dane. Piştî wê çalakiyê, ev bûye tiştêkî ji rêzê. Em dikarin bibêjin dibe ku ev yekem çalakiya femînîst a jinan be.

Di bin siya dîrokê de Kurdistan

Mehmet Masum SUER

Di dîroka kurdan de gelek bûyer û serpêhatiyên kurdan, ji aliyê wênekêşan biyanî ve hatine kişandin. Yek ji van wênekêşan jî wênekêşê navdar a Emerîkî Susan Meiselas e. Susan, yek ji endamê ajansa herî mezin û navdar a wêneyan Magnum Photosê ye û bi wêneyên xwe yên şer ê ji gelek welatên Cîhanê weke Nîkaragua û El Salvador tê nasîn. Susan xwediya xelata zêrîn a 'Robert Capa' ye û endama Weqfa MacArthurê ye.

Susan Meiselas a ku wêneyên wê di gelek kovar û rojnameyên cîhanê de tên weşandin, di sala 1991'ê de piştî Şêrê Kendavê çû Başûrê Kurdistanê û bi qasî sê salan bi du hevalên xwe yên antropolog re li vir xebitî. Ji aliyekî ji eniyên şer, ji aliyê din ve jî ji jiyana rojanê ya kurdan gelek wênekêşand û lêkolîn kirin. Di vê navberê de derbasî Bakur û Rojhilatê Kurdistanê jî bû û li van herêman jî gelek wênekêşandin. Susan, bi Rêxistina Şopandina Mafên Mirovan re tev de di projeyekê de ci girt û di vekirina gorên tomerî ku laşên bi hezaran mirovên kurd jê derketin de amade bû û ji van goran gelek wênekêşand.

Susan Meiselas xebatên xwe di vegera xwe ya Emerîkayê de di sala 1997'an de bi navê **'Kurdistan: Di Bin Siya Dîrokê de'** kir pirtûkê weşand. Di pirtûka ku ji 470 rûpelî pêk tê de li ser

sê beşên Kurdistanê gelek agahiyên dîrokî, berfireh û wêneyên nû û kevin ci digirin. Beşek pirtûka Meiselasê ji Îngilîzî hatiye wergerandin zaravayê Soranî û Tirkî jî. Di pirtûkê de ci hate dayîn î xebatên antropolog, leşkêr, rojnamevan û gerokên kevin ku li Kurdistanê geriyane. Dîsa di pirtûkê gelek belgeyên weke bîranên kesan, raporên dewletan û nexşe jî ci digirin.

Wênekêşê navdar, di 40 salên vê dawiyê de bi

wêneyan sê projeyên girîng pêk anî û qedand. Yek ji van projeyan wêneyên wê yên ji şerê Emerîka Navîn bûn. Ya duyem, bi navê 'Baweriyên kevneşopî' bû ya sêyam jî ya li ser kurdan e. Her sê projeyên Susan Meiselasê li Cîhanê dengvedan lê xebata herî ku balkişand jî ber ku kurd di destpêka salên 1990'î de di rojeva Cîhanê de bûn xebata wê ya li ser kurdan bû. Susan, di rojên weşandina pirtûka xwe de li Emerîkayê pêşangehek wêneyan jî vekir û bi vê pêşangehê jî bal kişand ser kurdan.

Susan Meiselas, li ser weşandina pirtûka xwe wiha diaxive: "Ji bo

fêhmkirina îro divê em duh zanibin. Beşeke girîng a meji yan zanebûna duh jî wêne ne. Ji bo fêhmkirina dîrokê wênekêşan pir giranbûna ne. Îro kurd li ser rûyê erdê gelê herî qelebalixê ku bê welat e. Li çar parçeyan jî kurd êşên mezin dijîn. Min xwest ez cîhanê bi êş û pîrsgirêkên kurdan bihesînim."



Dîrokî wêne le Kurdistan

Rênas NEWROZÎ

Le Kurdistan bo yekemcar kamîra be rêgay paşakanî Iran û gerîde rojawayîekan û hêzekanî Rusiya û mesîhiye mujde bexşe Amerîkî û Almaniyekanewe le nîwey diwemî sedey 19 geystote Kurdistan û her ewanîşin yekem wênekani Kurdistan kêşawe. kontrîn wênekani Mrovî Kurd û şarekani Rojhelatî Kurdistan henûke le albumêkî taybetî le mozexaney zanîngay (Harvard)y Amerîkî dandrawe. ew Albume le layen (Alî Xan Walî Qacar) 1845-1902 amadekrawe û wênekaniş le layen xoyewe gîrawin. Alî Xan ke le binemaleyekî fermanrewa bûwe u bo xoşî fermanrewayî çend nawçe û herêmêkî kirdwe le Iran. ew be Kamîrakey xoy wêney zorbey şarekani Rojhelatî Kurdistan û zorbey gundekanî deverî Mukiryani girtwe, legel wêney jimareyekî zor le kesayetiyekanî ew katey rojhelatî Kurdistan: (mîr, serok hoz, jin, mindal, cengawer, cutiyar, rawçî) le albumekey xoyda koykrdunetewe. beşêkî albumeke taybete be rojhelatî Kurdistan û beşêkîşî taiybete be sercem Iran û Azerbaîcan.

sercem wênekani naw albumeke le nêwan salî


1960 heta 1900 gîrawin û albumeke le 1412 wêney orjînal pêkhatwe û le ser 450 laperey pêwane gewre dandrawin.

hewerha wênegr û şwênnewarnasî Frensî (Ernest Chantre) 1813-1924 le salî 1897 le kitêbêkî taybetî xoyda be nawî (Les Kurdes) be wênewe şîkrdine- weyekî wirdî sebarete be reng û şêwe û ruxsar û rûy mrovî kurdî bilawkrdotewe. Ernest Chantre le nêwan salekani 1880-1894 jimareyekî zor wêney mirovî kurdî le Diyarbekir (Amed) û nawçekanî dîkey bakûrî Kurdistan kêşawe.

wênegirî Armenî-Gurcî (Antoin Sevruguin) 1830-1933 le salekani 1890 be diwa deyan wêney mirovî Kurdî Kêşawe, beşêkî zor le wênaney ke be kamîray ew gîrawin, henûke le mozexaney netweiy le şarî Leiden-î Holenda parêzrawin. hêzekani Rusiyaş le kotaiy sedey nozde taweku seretaî sedey bîstem çendan wêney şarekani Kurdistaniyan kêşawe. Mesîhiye Amerîkiyekaniş le şarekani Urmîye, Mehabad, Xuy û çendan şarîtirî ojhelat wêney Kesayetiyekanî Kurd û şarekaniyan kêşawe û her ewaniş le nêwan 1910-1928 govarêkî taybetiyan

eb nawî (The Kurdistan Missionary) le Amerîka derkirdwe. mesîhiye mujde bexşe Europiyekaniş le nîwey diwemî sedey nozde le şarekani Amed, Dîlok, Mêrdîn û Musil da gelêk wêney Kurdiyan kêşawe.

herweha (Mî-norski)y Rus û (Rozvelt) û (Abraham Johanna)y Amerîkî û çendanîtir le geşt û ya-daştekanîyanda taiybet be Kurdistan, deyan wêney Kurdiyan le seretay sedey



Mehabad from 19th century - Photo by Ali Khan Vali Qajar - Harvard University Library



Hewler (Erbil) 1918 - Photo by W. R. HAY

bîstem bilawkirdotewe. cige le ameneş le kotayî sedey nozde û seretaî sedey bîstem çendan geştiyar û Rojnamewan û lêkolerewey Englîz û Frens û Amerîkî û Rus serdanî herême ciyawazekanî Kurdîstaniyan kirdwe û sedan wêne û dîmenî mirovî Kurd û nawçekanî Kurdîstaniyan girtwe û le geşt-name û yadaşt û kitêbekaniyanda blawîyan kirdonetewe. beşêkîşîyan wêne girngekanî Kurdîstaniyan le mozexanekanî Europa danwe.

le salî 1918 be diwa û paş geştîni hêzekanî Englîz bo başûrî Kurdistan, efsere nasrawekanî Engli-zîş be kamîrakanî xoyan sedan wêney şar û çiya û rûbarekanî Kurdistan û kesayetiyekekanî Kurd (Mîr, Axa, Cutiyar, Mela, Cengawer, Jin, Mindal...)yan kêşawe. le naw ew kesane: (Mecer Nuêl), (Major E. B. Soane), (W. R. HAY), (C. J. Admons), (Layn), (Hamilton) u gelêkîtir diway geraneweyan bo birî-taniya yadaşt û bîrewerîyekekanî xoyan legel çendan wêney taybetî Kurdistan û kesayetiyekekanî Kurd û takî Kurd bilawkirdotewe. her Englizekekanîş bûn ke yekem çapxaneyan le başûrî Kurdistan damezranî û hunerî wênegirtîniyan bilawkrdewe. diway ewe le nawerastî sedey bîstem taweku rojgarî emro sedan gerîde û nûser û rojnamewanî rojawayî dîrokî niwêy kurdiyan be wêne û belgewe bilawkrdotewe, lew kesane: (David Adamson), (Chris Kochera), (Martin Van Bruinessen), (Susan Meiselas) û çendanîtir. (Susan Meiselas) be kokirdnewey jimareyekî zor le wêney konî Kurdî le hemu beşekanî

kurdistan, hereweha girtîni deyan wêney rûdawekanî Kurd be kamîrakey xoy tawanîuyetî le albume pir behakeyda (Kurdistan le sêberî mêjûda - Kurdistan In The Shadiw of history) çend lapereyekî belgedar bo netewey Kurd tomar bikat.


yekem wênegirî Kurdîş (Husên Huznî Mukirî-aniy)e, ke her le salekanî yekem cengî cihanî be-diwa be kamîrakey hewlîdawe wêney zor le kesayetiyekekanî Kurd û Rûdawekanî Kurdistan û şarekanî bigrêt. herweha (Bedîh Babacan)îş yekemîn tabilo kêşî Kurde ke hewlîdawe ser û sîma û şewey kesayetiye nasrawe konekanî Kurd bikêşêt. wêne kêşrawekanî Bedîh Babacan emroke bûnete sembolî serekî nasînewey kesayetiyekekan. ew kesane ke huermend Bedîh Babacan wêney bo kêşawîn britîn le (Babe Tahîrî Hemdanî, Ahmedî Xanî, Melay Cizîrî, Şerfxanî Bedlîsî, Salim Nalî, Meulewî, Hacî Qadirî Koyî u gelêkî dîke).

konitrîn filimî tomarkirawî mirovî Kurd, yan Kurdistan, ew parçe dîmeney baxçeyekî şarî Silêmaniye ke le mangî temuzî 1925 tomarkirawe. diway ewîş filimî semakanî şazadey Kurd (Leyla Bedirxan) 1908-1986e, ke le ser texte şanoîyekekanî Parîsî Frensa û Mîlanoy Italiya tomarkirawîn. konitrîn filimî klîpkirdîni muzkî Kurdî le başûrî Kurdistan le layen hunemrend (Şemal Sayîb) berhem hênrawe.

zor şit hen sebarete be dîrokî wênekekanî Kurd bas bikrên, be kurtî demewêt bilêm ke wêne be hemu cor û şewekaniyewe mêju tomar dekat.

Wênêkêşîya Kurdan û çîroka ‘em ên winda’

Veysî ALTAY



Wênêkêşîya Kurdan, piştî salên 2000’î her çiqasî kêmasiyên mezin hebin jî hêdî hêdî pêş ve diçe. Bi dîtina min Wênêkêşîya Kurdan di dema xwe ya zarokatiyê de ye.

Ev raman ne tiştekî xerab e. Em dikarin bibêjin ev dem ji bo wênêkêşên kurd baş e. Helbet ked jê re divê, zanebûn jî lazim e. Lê huner bi tenê zanebûn û ked nîne, afirandina xweşikahiyê jî pêwîst e. Lê dîsa jî mirov nikare bibêje ku bi giştî wênêkêşî di hunera kurdan de li qada xwe ya laîqî ye. Ji bo ciyê hunera kurdan ez dikarim vêya bêjim ku em hîn nû bi cîhanê re dikevin têkiliyên xurt. Heta niha jî ber astengiyên dagirkeran û serdestan em di din-yaya xwe ya teng û xizan de bûn. Ji aliyê wêne, sî-nema, dîtbarî û nivîsê ve em pir li paş bûn. Ez bawerim ku di demê nêzik de, di çanda kurdî de wênêkêşî jî wê ciyê xwe bigire.

Wênêkêşîya Kurdan, wek sînema, nivîskari, xêz-karî û hwd heta niha yan li ser navê tirkî, an jî li ser axa xerîb hatiye perisandin. Lê belê êdî wênêkêşên kurd li ser axa xwe hunera xwe pêş ve dibin. Ez bawerim ku hin derfet zêde ji bo wênêkêşên kurd hebin, gel eleqeyê nîşanî wêneyên wênêkêşên kurd bide, wênêkêş jî bikaribin xwe bixine rojeva gel wê hê jî pêş bikeve. Aboriyek baş, sazî, rêxistinî û li her bajar û navçeyên Kurdistanê holên pêşangehan pêwîst in. Di vî warî de divê şaredarî pêşeng bin û vî karî bi pêş ve bibin. Ji bo ku car bi car bandora wêneyekî ji çekê mezintir e.

Min jî demeke dirêj li ser dayikên têkoşer, xiz-mên windayan xebatekir. Dixwazim naveroka wê xebatê jî bi we re parve bikim.

Kêm mirovan qêrînên wan bihîstin. Kesên ku bihîstin jî ji çîrokên wan bawer nekirine.

Hin kesên ku di nav fikarên bikarhatinê de bûn hebûn. Ji bo ku li kurên xwe, li keçên xwe, li birayên xwe, li hezkiriyên xwe digeriyan, bi êrîşên polîsan re rûbirû diman, hatin lêdan, bi erdê re hatin kişandin, hatin copkirin û binçavkirin. Lêbelê nese-kinîn, sekinandina wan jî nepêkan bû. Ji ber ku derdên wan nehatin derman kirin, derd û kulên

wan zêde bûn.

Li vî welatî di 24’ê avrêla 1915’an de bi destpêkirina feraseta; li Stenbolê binçavkirina ji 200’î zêdetir rewşenbîr, pêşengên civaka Ermenî ku gelek ji wan winda bûn, di serê salên 1980’yî de binçavkirin û windakirina ji aliyê leşker û polîsên dewletê ve, di salên 90’î de li Kurdistanê veguherî windakirinên tomerî.

Di bin çavan de piştî lêpîrsînan hatin kuştin û ji balefiran bi nav daristanan ve hatin avêtin, di bîrên asîtan de hatin tunekirin, di qazanên kaloriferan de hatin şewitandin. Hinek ji wan jî “li ciyên ku nayên zanîn” wekî Mûtîkî, wekî Newala Qesaban di gorên tomerî de bihustek ax avêtin ser wan û ew binax kirin.

Ew hêzên ku ji aliyê dewletê ve hatibûn damezrandin ên wekî Jîtem, wekî Hîzbul-kontra wan hêzên paramîlîter mîna ku li derveyî dewletê bûn xuya dikirin lêbelê hemû çek, pere û hêza xwe ji dewletê distendin mirov qetil kirin, winda kirin. Gotinên wan ên hevpar jî her tim “me nekuştîye û nedîtîye” bû.

Xizmên windayan û parêzvanên mafe mirovan ên ku hemû hewldanên wan bêencam diman, ji bo ku li hember van pêkanînan faşîzan derkevin û ew dîwarên tîrsê yê ku bi destê dewletê hatibûn avakirin derbas bikin û hesabê windayên di bin çavan de bipîrsin, li qada Galatasarayê têkoşîneke bêhempa dan destpêkirin.

Cara yekemîn di 27’ê Gulana 1995’an de bi hejmareke hindik a ku xizmên windayan û parêzvanên mafên mirovan li ber dibistana lîseyê ya Galatasarayê bi navê “Qêrîna Bêdeng” dabûn destpêkirin a bi tevlibûna xizmên windayan ên li Amed, Êlih, Riha, Cizîrê ev 17 sal in didome.

Xizmên windayan ji bo ku tiştên bi serê zarokên wan, hevserên wan û dê û bavên wan de hatine hîn bibin û ji bo darizandina îşkencekar û kujeran têkoşeran.

Lêbelê bi wê wehşeta windayan hezkirî û evîndarên gelek kesan ji destên wan hatin stendin.

Hin kes dema ku li ber mirinêbûn, bi hêviya ku xizmeke xwe li vir bibînê dixwestin ku li goristana bêkesan bên binaxkirin.

Hin kesan dixwestin ku kesên li ber kevirên gorên wan bigirîn hebin.

Carinan jî li gorî agahiyên ku digirtin, li nav dar û beran li gorên hezkiriyên xwe geriyan.

Sed mixabin heta niha tu daxwazên wan bi cih nehatine.

Lewra dewlet tim û tim jî rû bi rûbûna kesên ku kuştine û hestiyên wan, ji hesabdayina kiryarên xwe yê kirêt û pêkanînen xwe yê dermirovî tirsîyaye û ditirse.

Heta ku hesabê demên borî neyê pirsîn, damezrandina dahatûyeke azad û dadmendî ne pêkan e.

Ji bo ku têkoşîna malbatên windayan bê dîtî û li ber çavan were girtin, biçûk be jî min xwest ku ez bîr û binhişê civakê hinekî nû bikim, teze bikim.

Min him jî bo ku çîroka kesên di vê oxirê de têkoşiyane jî zêdetir mirovan re ragihînim û him jî derveyî sînoran jî pê bihesînim jî xwe re ev kar kir armanc. Bi wêneyên ku min li Stenbol, Amed, Êlih û Cizîrê nêzî 15 salan kişandine min ev xebata xwe tamam kir. Bi navê “Em ên Winda” bi sê zimanan (Kurdî, Îngilizî û Tirkî) albumek jî weşand. Ev xebat jî bo min hem deynek bu, hem jî dema ku min ev xebata giran kir ez pir pê êşiyam.



“Wêne cemidandina demê ye”

Hevpeyvîn bi Mehmet Masum Suer re

Hevpevyîn: Kovara Wyê

Kovara W: Silav. Beriya ku em dest bi pirsên xwe bikin, ji kerema xwe tu dikarî xwe bi xwendekarên me bidî nasîn?

Mehmet Masum SUER: Belê ser çavan. Ez di sala 1957'an de li bajaroka Ewîna (Sûrgûcû) ku girêdayî navçeya Stewrê ya Mêrdînê ye, ji dayik bûme. Min Enstitûya Perwerdehiyê ya Amedê di sala 1980'yî de qedandîye û paşê jî li Zanîngeha Es-kîşehîrê li beşa Wêjeyê lîsans xwendîye. Di navbera salên 1976 û 1993'yan de di gelek rojname û ajan-sên bi tirkî de wek nûçegihan xebi-tîme. Di sala 1982'yan de li Amedê min bi navê 'Olay' (Bûyer) rojname û di dûre bi heman navî kovarek heftane weşand. Piştî sala 1993'yan min dev ji rojnamegeriya rojane berda û dest bi lêkolîn û nivîsên li ser ziman, dîrok û çandê kir. Gelek lêkolîn, hevpeyvîn û nivîsên min di dawîya salên 1990'î de di rojname-yên wek Ulkede Gundem, Demok-rasî, Yenî Yuzyl û Siyah-Beyaz û hinek kovaran de hatin weşandin. Deh salên dawîn in li banê rojna-mevaniya azad bi awayekî profesyo-nelî wênekeşiyê dikim. Wêneyên min bi taybetî ji bo nasandina bajar, çand û kesayetên kurd tîn bi-karanîn. Niha jî li Amedê dijîm.



W: Te kingê û çawa dest bi wênekêşiyê kir? Di wênekeşiyê de çi bala te kişand ku te berê xwe da vê hunerê?

SUER: Bi biçûkanî armanca in ya herî mezin, min dixwest da ku ez bibim rojnamevan. Bi ciwan-tiya xwe min ev armanca xwe bi cî anî û di sala 1976'an de di rojnameyek bi tirkî de wek nûçegihan min dest bi xebata rojnamevanîyê kir. Beriya ku ez dest bi nûçegihanîyê bikim di sala 1970'yî de ez bi lêhatinî bûm xwedî wênekêşekê. Û ji wê rojê heta îroj ez bê makîne nemame. Dema ku min rojnamevanî dikir min wêne jî diki-şandin. Piştî salên 1990'î min wênekêşî bi pêş xist lê belê ji ber rewşa şer a xerab ku bajar û welatê me wan rojan tê de bûn, min demek dirêj nikaribû wêne bikişanda. Hem wênekîşandin qedexa bû

hem jî ewlehiya min û hinek hevalên min a ji bo ku di nav bajar û taxan de em bigerin tune bû. Min wek nûçegihanekî gelek wêne kişandin û ji wênekî-şandinê pir hez kir.

Di destpêkê salên 2000'î de min giraniya xebata xwe da ser wêneyên ku ev roj ez dikişînim. Lê tu caran nedihat bîra min ku ez ê rojekê wêneyên bi vî awayî ku ev roj ez dikişînim bikişînim. Yani wêne-yên ku ez ev roj bi nêrîn û teknîkeka hunerî dikişî-nîm. Ji bo nasandina cî û waran û kesan û çanda gelê me...

W: Wek hunermendekî ku ev nezîkî 40 salan e wêneyan diki-şînî û rojnamevanîyê dikî ji bo te wêne çi ye, tê çi wateyê? Ji bo mi-rovahiyê û gelan girîngiya wêne-yan çi ye?

SUER: Wêne bîr e, bîranîn e, mejî ye. Cemidandina demê yan ya dîrokê ye. Hem ji bo mirov û hem jî ji bo ci-vatê pir girîng e. Ji sala 1839'an ku wêne hate dahênan û vir ve dîroka mi-rovahiyê di bin çavdêriya wêneyan û wênekêşan de ye. Di 50 salên destpêka dahênanê de ji aliyê teknîkê ve gelek pêşketin çêbûn. Û piştî destpêka sed-sala 20'an bi keşîfkirina teknîka wêneyên rengîn hat asteke bilind ku heta vê rojê berdewam dike.

Wêneyek, gelek caran, li ser civatê, ji sedan rû-pelê pirtûkekê zêdetirîn bandor dike. Gelên pêşketî û rojava, di jiyana xwe ya rojanê de bandora wêne-yan bi zanistî di propagandayê de bi kar tînin. Di rojname, kovar, pirtûk û weşanên din de mirov di-kare wêneyan bi awayekî erênî jî, neyînî jî bi kar bîne. Ger mirov bixwaze, mirov dikare kesekî yan civatekê bi wêneyan pir xweş jî û pir xerab jî rê bide. Hêza wêneyan zêde ye. Ji aliyê serdestan, ik-tîdaran ve car caran qedexekirina wêneyan yan fil-mên sînema ji vê hêza wêneyan a mezin rû dide...

Di vê navberê de ez dixwazim bala we bikişînim ser xalekê. Bandora wêne li ser civakê ji ya filmên sînema an nûçeyên televîzyonê zêdetir e. Fîlm di ber çav re diherike û ger sahnayek pir balkêş û gi-rîng tune be di bîra mirovan de namîne. Lê wêne ji

ber ku cemidandina demê ye û sahne nayê guher-
tin, di hişê mirov de zêdetir bandora xwe dihêle û
bi cîh dibe, nayê jibîrkin. Wek mînak; wêneyê ji
Helepçeyê kalê ku li ser pêlika ber deriyê xanî xwe
avetiyê ser zaroka xwe, li Wîetnamê dema kuştina
kesekî ji nêz ve, ji Hiroşîmayê keçîka çîpîtazî û laşê
wê şewitî û peritî di nav tirsê de direve derveyî
bajêr û hwd bi hêsanî nayên jibîrkin...

Wek mînakên Emerîka û hinek welatên Ewro-
payê û welatên din, vê bandorê, ji bo guhertina ro-
jeva cîhanê, ji bo ku di dozê de xwe mafdar rê
bide, bi kar tînin. An ji bo ku kesekî xwe yê navdar
bi cîhanê bidin hezkirin, ji bo hinek gel, civat an rê-
xistinan xerab an neheq rê bidin û doza wan pûç
bikin. Carinan jî berevajoyî vê rewşê, gelên bindest
û ku zilmê dibînin, wêneyan ji bo zilm û neheqîya
serdestan an zaliman raxin ber çavên gelên cîhanê
wêneyan bi kar tînin. An ji bo nasandina cî û waran
yanî ji bo turîzmê. Ji bo firotina berhem û malên
xwe yê bazirganî di reklamên de gelên cîhanê ji
bandora wêneyan sûdê werdigirin...

Dijwariya Şerên Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn ji
Parîs heta Moskowê enî bi enî hate cemidandin û
ketin arşîva mirovahiyê. Dîsa di van salan de kirya-
rên qirêj ên Serokê Almaniyaya faşîst a Naziyan,
Adolf Hîtler, jî bi wêneyên dîrokî hatin belge kirin.
Wêneyên ji Hiroşîma û Nagazakiyê, dijwariya bom-
beya Atomê û zilma Emerîkayê raxist ber çavan...

Û dema ku mirov li dîroka kurdan dinihêre ji
wêneyên herî kevn dema ku mirov dest pê dike, van
wêneyan di mêji û dîroka kurdan de cîh girtine û

şop hiştine:

Wêneyên ji serekên kurdan Simkoyê Şîkakî, Meh-
mûd Berzencî, yê Mele Mistefa Berzanî li çiya li ser
hespê bi çek û rext û xençer, dîsa yê Mele Mistefa
Berzanî û Sedam Huseyn ku hev û dû maçî dikin û
destên hev radikin ber bi hewayê ve, yê Şêx Seîd ê
destzincîrkirî di navan leşkeran de, yê Seyîd Rîza û
hevalên wî li salona dadgehê, wêneyên endamên
malbata Bedirxaniyan û endamên Mala Cemîl Paşa,
wêneyê Elî Şêr û hevîna wî Zerîfê ku her duyan jî
rext girêdane û destên wan bi çek in, yê yek ji he-
malên kurd ê navdar Zaro Axa li Emerîkayê, yê Dr.
Nûrî Dêrsimî û gelek wêneyên din...

Wek wêneyên bûyeran jî, wêneyên ji komkujiya
Helepçeyê, wêneyên gelê kurd ê Başûr ku ji zilm û
êrişên artêşa Iraqê revîyan û xwe avetin Rojhilat û
Bakurê welêt û serhildanên gelê Başûr û rûxandina
artêşa dewleta Iraqê... Wêneyên serhildan û New-
rozên ên li bajarên Bakur ên di salên destpêka
2000'î de û gelek wêneyên din...

**W: Di civata me kurdan de bi tevahî hu-
nera wênekêşiyê di çî astê de ye? Bi qasî ku
em dibînin ne di astek pir bilind de ye. Bi ya
te sedema vê rewşê çî ye? Gelo di nav wêne-
kêşên cîhanê de kurdên navdar hene?**

SUER: Di nav Kurdan de, wekî beşên hunerê
yên din, wênekêşî jî hê pêş neketiye. Wek beşên hu-
nerê yê din wek roman, çîrok, helbest û wênesa-
ziyê, wênekêşî jî hê nû ye. Li Bakurê welêt
wênekêşîya hunerî piştî salên 2000'î dest pê dike.



Li beşên dinê jî mirov dikare bibêje di heman salan de dest pê kiriye. Rewşa wênekêşîya kurdan ji asta gelên cîhanê pir dûr e, lê belê bi raya min kurd di her warê hunerê de bi lez û bez bi pêş dikevin. Gavên mezin diavêjin. Di warê wêjeyê de, di warê hunera sînema û şanoyê û her wiha wênekêşîyê jî. Dîsa bi raya min deh salên pêşîya me di warê huner û çandê de wê salên kurdan bin. Wê gelê kurd pir bi pêşkeve. Û wê valahiya di navbera xwe û Cîhanê de dagire. Hinek pêşketinên ku pêk tên vê hêviya min xurt dikin.

Li Bakurê welêt, di warê wênekêşîyê de navdarên kurd ên navnetewî hê tune ne. Li beşên din jî rewş heman e. Wênekêşên kurd ên baş li her beşê hene. Lê di qada navneteweyî de hê nayên naskirin. Aliyek xebata min jî li ser vê xalê ye. Ez bi xwe dixwazim hunera xwe bigihînim qada navneteweyî. Di vî warî de çend ceribandinên min bûn, bi ser ketim. Wek beriya salekê di kovara navneteweyî ya wênekêşîyê 'Light and Composition'ê de 3 wêneyên min di nav wêneyên wênekêşên Cîhanê di rojên cuda de wek 'Wêneyê Rojê' hatin hilbijartin. Dîsa wêneyekî min ku min li Qilebanê (Roboskî) kişandibû, roja 6'ê sibatê, ji aliyê kovara navneteweyî ya herî navdar National Geographic'ê ve di nav '12 wêneyên Rojê' de hate hilbijartin û di malpera kovarê de cî girt. Ev wêne dibe ku di kovarê de jî bê weşandin.

Dîsa hevalên min ên hêja Ihsan Kaçar û Paşa Îmrek li Ewropayê pêşangeh vekirin. Ihsan Kaçar, li Qatalonyayê (Ispanya) sê pêşangeh vekirin û çanda gelê me bi Cîhanê da nasîn. Hevalê Rihayî Paşa Îmrekê ku du salan Xelata Apê Mûsa ya Çapemeniyê di beşa wênekêşîyê de wergirtiye jî, li Parîsê pêşangehek vekir û bi deqên li ser laşê jin û mêran mirov û çanda kurdan da nasandin. Ji aliyê din ve gelek wêneyên Selmet Guler, di kovara National Geographic a ku bi tirkî li Tirkîyeyê tê weşandin cî digire.

W: Mijarên wêneyên te bi piranî çi ne? Tu wêneyên çi dikişîni? Çima ev tişt bala te dikişînin û armanca te ya kişandina van tiştan çi ye?

Bi kinasî yek ji armancên min ên wênekêşandinê nasandina bajar, derûdor û cî û warên me yên dîrokî û nasandina çand û hunera gelê me kurdan e. Hem bi kurdan û hem jî bi milletên Cîhanê ve nasandin, hezkirin... Ji ber ku dîrok û çanda me bi sed salan e di bin çewisandinê de ye û nayê nasandin.. Mixabin nahêlin ku bîst nasandin. Ji ber vê sedemê ji gelên Cîhanê yên din zêdetir hewcedariya me bi nasandina welêt û çanda me heye. Ne bes bi wêneyan, di her warê jiyanê wek muzîk, wêje, sînema, şanoyê, bi her alavê ragihandinê divê em

çanda xwe derxin holê û bidin nasandin.

Armanek min î din jî tiştên ku ez dikişînim wek dokumanter ji bo salên pêş li ser rûyê Cîhanê bihêlim, wek arşîvekê. Ji bo nîşên ku wê li dû me rabin û bişînin. Mixabin di vî warî de yanî ji aliyê belge û dokumantên dîrokî ve jî milletê me xizan e, yanî feqîr e.

Ez bi piranî li ser dîrok û çandê radiwestim. Wêneyên cî û warên dîrokî û çandî, avahiyên kevn ên dîrokî, wek manastir, dêr, mizgeft û berhemên din dikişînim. wek mînak ev 16 sal in ez li ser navçeya me ya dîrokî Heskîfê dixebitim. Vê navçeya me ya ku xwediyê pir berhem û avahiyên dîrokî, çandî û xwezayî ye wê di bin ava bendava bi navê Ilisûyê de bimîne. Ev 16 sal in ez guhertinên li vê navçeyê dişopînim û wêneyan dikişînim. Li ser înternetê jî ji sala 1995'an û vir ve li ser navnîşana hasankeyf.itgo.comê de xwediyê malpera Heskîfê me.

Ji derveyê Heskîfê, navendên giraniya xebatên min Amed, Mêrdîn û Wan e. Gelekê wêneyên min ên van bajaran hene.

Ji bilî van xebatên min, wek projeyekê ez portreyên navdarên kurd ên hunermend û politîkavanan dikişînim, dikim arşîv. Di vî derbarî de min dît ku valahiyek heye. Bi taybetî wêneyên hunermendên me bi awayekî hunerî û estetîk tune bûn.

Wêneyên ku ez dikişînim bi taybetî, di pirtûk, rêber û broşurên tûrîzmê de, di kovar û rojnameyan û qartpostalên ku bajarên me didin nasandin de û di gelek cihên din de tên bikaranîn. Ev du sal in, bajarê me yê Amedê, li Stembolê, di Fûara Tûrîzmê ya Navneteweyî de bi wêneyên min tê nasandin.

W: Her hunermendek û tarza xwe heye. Berhemên xwe ji berhemên hunermendên din cudatir e. Tu di kişandina wêneyên xwe de bala xwe bi taybetî didî çî? Tu wêneyên çawa dixwazî bikişîni?

SUER: Di wêneyên xwe de ez li dû rengên zindî me. Ez dixwazim ji derdora me û ji jiyanê van regnan bi dest bixim. Wêneyên xwe ez ji bo nasandina cî û waran, avahiyan, an bajaran bi kar tînim. Wek ku min anî zimên, wêneyên min ji aliyê şaredarî û hinek saziyan ve ji bo nasandinê wek ji bo tûrîzmê tên bikaranîn. Ji ber vê, bi tenê ez wêneyên xwe vê armancê li ber çav digirim û dikişînim.

Wek ku min got, ronahî, rengên zindî û kompozîsyonên fireh taybetmendiyên wêneyên min in. Ji ber rengê zindî wêneyên min wek 'wêneyên fantastîk' tên zanîn.

W: Cudahiya wênekêşîya kurd ji gelên cî-



hanê yên din çi ye? Di beşên hunerê yên din de di vî warî de cudahiyek heye. Di wêne de jî ev cudahî he ye gelo?

SUER: Carinan ez henekan dikim dibêjim, “Ez wêneyên xwe bi kurdî dikişînim”. Ger çiqas henek jî be rastiyeke di vî peyvê de heye. Di berhemên her muzîsyenî, her romanûsekî, her helbestvanî û her derhênerêkî sînemayê de mirov bi hêsanî dikare çand, dîrok û taybetmendiyên miletê wan hunermendan bibîne. Her hunermendê Cîhanê wek xwezayî, mijarên berhemên xwe jî serpêhatî û jiyana miletê xwe distîne. Wêne jî wisa ye. Mirovekî ku li wêneyên min binihêre fêhm dike ku li kîjan welatî hatiye kişandin û behsa kîjan gelî dike.

Ji aliyekî dinê ve jî; di hunerê de nihêrin, dîtina yanî perspektîfa cuda pir girîng e. Zaten ya ku berhemên hunerî, ji berhemên ji rêzê vediqetîne jî ev e. Perwerdehiya ku dibînin, bûyerên ku di jiyana xwe de dijîn, taybetmendiyên çanda wan û heta ola wan, dîtina mirov an miletan ji kes û miletên din cudatir û taybetir dike. Ji ber vî yekê em dibêjin muzîka ereban an kurdan, an sînemaya Îranî an Îtalî an romana Rûsî an Emerîkî. Her çiqas di wêne de ev cudahî wek beşên hunerê yên din pir dernekevin pêş jî, di her wêneyên wênekeşekî de mirov dikare jiyana, çand û taybetmendiyên gelê wî/ê hunermendî/ê bibîne. Nihêrin, dîtina û şîrovekirina dîmenan vî cudahiyê derdixe holê.

W: Ez bawer im di dema kişandina wêneyan de gelek serpêhatiyên an bîranînên te ku tu ji bîr nakî jî hene. Gelo tu dikarî ji bo xwendevanên me çend bîranînên xwe parve bikî?

Gelek bîranînên min hene. Ez ê behsa ya ku herî min hestiyar û kêfxweş kir bikim. Ez di destpêka salên 1970'yî de zarokbûm û min bi malbata xwe re her êvar li radyoya Êrîvanê guhdarî dikir. Min ji bilûra Egîdê Cimo û stranên cemaetê pir zêde hez dikir. Bi taybetî jî bilûra Egîdê Cimo, bandorek pir mezin li ser min dikir û min hestiyar dikir. Dema ku min guhdarî dikir min Egîd, bilûra wî û Ermenîstanê li gorî xwe xeyal dikir.

Du sal berê, li Wanê, min û hunermendê mezin Egîdê Cimo dît. Hatibû Mîhrîcana Gola Wanê. Ez ji bo şopandin û kişandina wêneyên Mîhrîcanê çûbûm Wanê. Lê armanca min a taybet dîtina Egîdê Cimo bû. Min û Apê Egîd, bi hesreta 40 salî hev himbêz kir. Li Wanê bi Egîd re min sê rojên pir xweş derbas kirin. Hem min têr li bilûra wî guhdarî kir, hem min têr wêneyên wî kişandin û hem jî sohbetên pir xweş min pê re kirin.

W: Zor spas. Mala te ava be.

Wêne ji belegeyeke mang û sakîn ta bînahiyeke tevgeran e


Teymûr EVDIKÊ



Di navbera dîrok dîtin û nivîsê de

Ji mêj ve, li ser devera ku mirov jiyaye wêne hatine dîtin. Peyker, pût, neqîş. Resim xêzikên hundirîn şikeftan. Nivisandinê mirovên bûyerên xwe bi wêneyan vegotine. Rast e ku wêne û nivisandin du şanên sîmyatîk (semyotîk, semiotics)-çandî serbxwe û bi hev re ne. Çendîn em dîrokê bikolin û bi paş de vegerin, em ê pêrgî van herdu sistemen k udi pêdiviya naskirin û sîroveya dîrokê de xwe ferz kirine, werin. Lê wêne weke mîjareke girêdayî bînahiyê di têgihtina mirov a hestiyarde xwe ji gotinê leztir digihîne hiş û xwe şîrove dike, hem jî xwedî derfeteke berfireh e. Dem-deverê derbas dike, zimanê wêneyê navnetewî ye, lê girîngiya wêneyê ew e di vê têkiliya dîrokî di navbera wêneyê û nivisandinê de ku wêne bi xwe kirasê nivisandinê yê kevnare ye. Alfabe ya hîroglîfiya misirê bi wêneyan hatiye çêkirin, ev şêwe jî nivisandinê ne bi tenê tespîtek ji meqamê

wêneyê re ye. Bi qasî ku em dixwazin bibêjin gotinê dengê xwe ji dîtinê biriye, li ba mîletên weke kurda ku erdnîgariya wan, surşta wan taybet e, bi dehan gotinên deng- wênetêne dîtin: xuşexuşa avê, vişevişa maran, guregura ba. Ev dengên ha hemû pêşîn de ji bihîstin û dîtinê hatine birin. Wêjeya kurdan bi van deng- wêneyan mişt e. Zarok ji pêşîn de dibînin, paşê jî diaxivin û dûv re jî bînahiyan şîrove dikin. Dengê wan ê yekem mîkanîkeke xwezayî ye. Di vê dorê de deng qet nakeve pêşiya dîtinê, ji aliyekî di ve jî girêdayî hiş û hestiyariyê wêne belge ye, ji gotinê xwe vediqetîne ku gumana rast an derew bi xwe re tîne holê, wêne weke belgeyekê tu gumanê li holê nahêle. Ev mijar bixwe seranser me têkilî dîrokê dike, dîrok weke zansteke damezirînera ramanê ye û xwendina dîrokê pêwîstî belgeyan e. Nivîs û wêne tevî ku her yek ji wan xwedî dîrokeke taybet û serbixwe ne, wêne ji nivîsê bêtir û leztir xwe diyar dike bi belgeûna xwe. Nivîs





dîrok e lê wêne şîroveya dîrokê ye. Nivîs dikare bibêje berî 3000 salî lê qet nikare pergala vê demê derxe holê, ev karê wêneyê ye. Wêne pergala dema kut ê de hatiye çêkirin baş diyar dike (kinc, çek, alav, berg...)rewşeke zelal ji hinavê xwe dertîne ûdigihîne hişê bîneran. Di dema çêkirina xwe de wêne eynika rewşa xwe bûye, em jî da ku dîrokê vekolin li eynikan digerin.

Tevî ku wêneyê di her serdemekê de rêbaza çêkirina xwe guhertiye jî, lê wezîfeya wê ya sereke di hemû deman de ew bûye ku zimanê bûyerekê an jî çîrokekê bûye, belgebûna wê jî ji xwe ji vir hatiye. Lê gerek her tiştê wêneyê girêdayî belgebûnê nête nirxandin, ji berku belgebûn bi giştî ne mebest bû di demên çêkirina wêneyê de, belgebûn encam e. Ji aliyekî di ve jî ku em her tiştê wêneyê têkelî belgebûnê bikin, em dibin kujerê hunerî di wêneyê de, ev jî dibe sedema kuştina wêneyê bi xwe. Em dikarin neqşên k udi serdema kalkolît de 32000 sal berê li ser dîwarên şikeftan hatine xêzkirin (piraniya wan têkelî mijara nêçîr û berhevkirinê dibin) di vê babetê de bikin mînak. Bêguman ew neqş bi mebesta belgebûnê hatine çêkirin di sistema qebileyê de. Mebesteke wisa ne pêkan e jî,

mirovên wê demê berî her tiştî xwestine çîrokekê an jî bûyerekê vebêji, an go xwestine xwe bibînin. Ku em di vê mebestê de têngihên em hunerê dikujin. Tu mebesta nêçîrvanên wê demê bi mayindebûnê re nîn e, ji berk u dever ne mayînde yeli ba wan, helbet ne pîroze jî. Pîrozahî bi xwe weke mijar bi desthilatdariyê re û bi sîstemê re hatiye, bi afirandina olê re û naskirina xwedê pêdivî bi damezirandina desthilatdariyê û sîstemê çêbû yan jî dijî vê jî rast e. Piştî vê demê û bi hatina desthilatê (serdema pîrozahî) mirovê nêçîrvan yê ku wêneyê xwe çêdikir ji wêneyê hate derxistin, hundirê wêneyê bû perwaza (kadraj) pîrozahiyê: şah an jîxweda, an jî her dû yek in (şahê- xweda). Mirovên ku eynikên xwe çêdikirinbûn karkerên pîrozahiyê. Ev wêneyê pîroz yê ku kete xizmeta hakim û şahan û mirovê welatî jê hate dîrxistin û welatî bi tenê bû hosteyê çêkirina wê, di rêbaza çêkirina xwe de ev wêne kete asteke pir pêşketî. Ji berk u ev wêne (peyker, pût, peykeriyan li ser dîwaran) jiyanekê pîroz şêwe dike, divabû bi şêweyê herî çeleng bête çêkirin. Mezopotamya bi hemû herêmên xwe mişt e, bi vî wêneyê pîroz – ji berî demên someriyîyan ta zayîna Îsa û kiristîyaniyê Mezopotamya zelaltirîn nimûne radestî me kirine; lê di van deman de jî, tevî ku girseyên van wêneyan baş diyar bûn (li ser latan û kevir peykerên pîr çeleng hatine afirandin) wêneyê mezin û yê navê hate dîtin, lê hin kêmasiyên pîvan û çelengbûnê bi temamî nehatibûn sazkirin û rêbaz hîn di kêmasiyan de mabû. Tiştê herî seyr di vê dîroka mezopotamya de ew e: hewldanafirandina tevgerê di wêneyê de an jî afirandina dubarekirina tevgerê. Helbet ev hewldan hewldanekê kevnare ye, di serdema şikeftan de jî ev hewldan hatiye dîtin (deh ling ji gayekî re hate neqşkirin di wêneyekî de ta ku wate û şêweyê tevgerê bide); lê li Mezopotamya de li OROKA kevin 2700 sal berî zayîne wêneyê dîmen derkete holê, wêneyek li ser latek tablo hate dîtin. Bi şêweyêkî pîr taybet hatiye çêkiri, ev wêne ji sê qatan ji jor ber bi jêr ve hatiye neqşkirin (kolan). Çîroka cengekê vedibêje di qatê pêşîn de, li jor şerekî diwar li dar e û di qata navê de herdu layên di cengê de rawestiyane û ketine têkiliyan. Di qatên jêrîn de jî merasîma aşîtiyê hatiye wênekirin. Ev dîmena seyr ya ku sînore wêneyê kilasîk derbas kiriye û çîrokek bi temamî di yek wêneyê de pêşkêş kiriye, ramana herî bingeîn e ji têngiştina mirov derbarî vegotina çîrokekê de bi wêneyan. An go îro nav lê dîkin sînema, em derbarê vî wêneyî li ber dîmenekê ne. Rast e ku tevger weke mijar nehatiye xêzkirin; lê berdewamiya bûyerê di vî wêneyî de me seranser dike çîrokeke ji wêneyan. Mixabin dûv re wê

berdewamiya van pêşketinan li her deverê bidome, bi tenê li van herêmanwê bête sekinandin. Bi hatina Îslamê re afirandina wêneyan hate qedexekirî, Îslamê dubarekirina afirandina pergala mirovan weke karê mirovan nedipejirand. Li gorî Îslamê ev kar karê xwedê bi tenê ye, îslamê weke oleke nûjen xwe li ser wekheviyê ava kiriye (mirov weke hev in weke diranên şeh*) wê, filozofiya koleyê ya berî xwe (pîrozahî û mayîndebûn) red kir, îslamê wêneyên (şah-xweda) nepejirand, lê di encamê de wêne hate veşartin û Îslamê girîng da gotinê (bixwîn**). Îslamê têkiliya di navbera wêne û gotinê de berovajî kir, wêne di gotinê de veşart, gotin vê carê bû kirasê wêneyê; lê li vir rêbaz hatine kuştin, rêbaza çêkirina wêneyan. Di wêjeya kurdan de vê mijarê bandoreke pir mezin kiriye. Wêne li ba kurdan kete zikê gotinê. Bala xwe bidin gotina wek di helbestên kurdan de ji Melayê Cizîrî ta Seydayê Cegerxwîn, Bêbihar, Tîrêj. Her wek'ek wêneyek e. Di dengbêjiyê de jî heman çîrok e. Wêjeya kurdan bû wêjeyeke wêner, vê helwestê qutkirineke pîr mezin xiste navbera misilmanan û wêne rêbaza çêkirina wêneyê. Balkêşiya vê demê ew e ku kiristiyânên herêma jî ji bilî bawerwêneyan*** wêneyên di neafirandin, lê çêkirina eykûnan derfetên rêbazger li ba wan qut nekin. Ev eykûnên ku di hundirê kenîsan de bi tenê diman û ji bilî wan ti mijarên di nedikirin wêne, ez weke lihevkirinekê di navbera desthilata Îslamê û Kristiyanan de dinexînim. Kristiyanê bi xwe giranî dabû gotinê (di pêşiyê de gotinbû****) Kristiyanîyê wênerî qedexe nekir, l'êli van herêman em ji bilî wêneyan wanî olî nabînin, heger ev ne lihevkirineke kirêt be ma gelo ev çi ye?

Wênerî û rêbaza wênerîyê li Oropa (Ewropa) jî ta demeke nêzîk 1850'yî girêdayî pîrozahiyê mabû; lê Oropa wêneyê de berdewamiya xwe ya ku ji wêneya Ixîrîkî (Grek, Yewnana Kevin) û Romana weke du Şaristaniyên çanda Oropî li ser avabûyî biribû, qut nekir, bi hatina Kristiyanîyê. Xweda kete pergala xwe di Kristiyanîyê de dewam kir. Dîsa mijara wêneyê girêdayî xweda kesatiya Îsa-bawermendên wî ma. Peykerên Ziyos (Zeûs) û Afrodêt Apolo bûn wêneyên Îsa, bawermendên wî û kesên pîroz di ola Kristiyanan de, lê tiştê dûv re lê zêde bû taybet piştî demên tarîbûnê ku mirovên desthilat jî weke kesên pîroz cih di wêneyan de girtin. Karên wan jî wek belgeyên mendeşoşoya wan tomarkirin di wêneyan de girtin. Karên wan jî weke belgeyên mendeşoşiya wan hatin tomarkirin di wêneyan de (cengên wan piraniya mijarê birin). Bi giştî wêneyê piştî dema neçîrê û berhevkirinê (3200 sal) ta 1850' ta ku IMPRESSIONNISME û hatin holê di du astan de derbas bûye.



li ba misilmanan û li welatên wan wêne bi yek carê hate rakirin (mijar û rêbaz)

Ev tê wateya ku mirov ji pergala xwe hate dûrxistin. Şeweyê xwe weke hebûneke (girse) wenda kir. Pûtek an peykerek an jî resimek ji zanyarekî, filozofekî yan jî helbestvanekî ên misilmanan, yên kurdan jî di nav de negihaştine me. Dîtina madî ya dîrokê baweriyeke mezin di kesatiya neteweyê de çêdike. Wêneyeke bi tenê yê Selahedînê Eyûbî gihaye me, ew jî Kristiyanê Misirê ku jê hez kirine jê re çêkirine (qubtiyan). Ev mijar di zanyariya çelengbûna ya hemû cureyên hunerê de girîng e, ne bi tenê di wênerîya de. Ger wêneyeke Feqiyê Teyran hebûna, ne bi tenê ew ê dergehê vekolînan ji psîkolojiyê ta fîzîkiya Feqî vebûna, wê helbestên wî jî li ba her yekî ji me bi şeweyên cuda cuda bihata xwendin. Bêguman dîtin weke çalakiyeke hestedar derfetên herî zengîn ji şewegerîyê re vedike. Li dijî vê ew wêneyên ku li kurdistanê hatin dîtin jî ji wêneyên Mîtanî û Sobariyan ta wêneyên Madiyan û Zerdûştiyan pê re jî yên dema îslamê de di nav pirtûkên kurdan de



weke pirtûka Şerefyanê Bitlîsî û pirtûkên zanistiyê weke pirtûka Eliyê Cizîrî ti vekolînên kurdan li ser nehatin çêkirin. Di van pirtûkan de wêneyên balkêş hene di şeweyê xwe de pir teşbîhî Mûnemnema (mînyatur) dibin, di pirtûka Şerefyanê Bitlîsî de jî herî 500 salî zêdetir bûyerên kurdan ên berî dema Şerefyanî jî hatine çêkirin. Weke tabloya Mem û Zîn, dêmeg berê Kurdan ji niha bêtir nîrxê van wêneyan dizanin. Bi gotinê re wêneyê li ba kurdan xwe weke aligireke sîmyatîk di peyamê de ferz dikir, helbet vê hewldanê xwe di pirtûkên zanistî de jî ferz kiribû. Di pirtûka xwe de Eliyê Cizîrî hemû ezmûnên xwe tevî gotinê bi wêneyan jî şîrove kirine. Ev mijar vekolîneke cuda û mezin jê re gereg e. Ev bi xwe ne babeta vî karê me ye, lê ev derhegêk e ji vekolînê re.

Ji ber weke kum e got Kurdan wêne di dema Îslamê de di zîkê gotinê de veşart, pêdivî pê heye ku em vê mijarê baş binirxînin. Di gotinê de de çi qewimî û piştî vê qedexekirinê Kurdan cara pêşîn çawan şeweyê xwe di wêneyê de dîtî? Ji ber ku dengbêjî hunerek cûrereng e û xwedî bingehwariyeke kûr e em ê li ser vê hunerê şîroveyên xwe avabikin. Dengbêjî bê guman hunereke Kurda ya kevnar e. Ew di saz kirina xwe ya bingehîn de nêrîna Kurdan e, ji hemû têkilî û nîrxandinên wan re ye. Kurdan di dengbêjiyê de hemû tiştên xwe gotine û şîrove kirine ji wesfa xwezaya xwe ta danaskirina neteweya xwe. Dengbêjî hunereke netewî ye ji Kurdan re, bi giştî jî ev huner ji laşî jinan ve hatiye çêkirin. Ez bi xwe li ser vê yekê jî bi îsrar im ji ber ku hemû stranên dengbêjiyê xwe ji xwezaya kul ê hatine çêkirin venaqetînin, seranser xwe wênedar dikin. berî her

stranekê wesfa herî zengîn berî ku bûyer di stranê de dest pê dike ji deverê re ye;

Çemê çetelê çemekî sar e
Deşta Pirsûsê deşteke dûz e
Kela Bazîdê keleke lal e

Hemû stranên dengbêjiyê bi hevokên weke van hevokan dest pê dikin.

Ji layekî dî ve jî wênerî xwe li ser şewedana (teşedan) mirovdariyê ji destewerdanê dike.

Bejn û bala te zirav e ji minara Stenbolê

Sîng û bedena Eysana Elî berfa sîpî ne

Ji aliyê avakirina xwe ya bingehîn ve ji bilî şewekirinê dengbêjî hunereke pircûreyê,

dengbêj pêşîn de bûyerê dide nasîn bê stran û awaz (kisakirdin). Dûv re distire, awaza bûyerê dibêje (muzîk, stran), di nav re guftûgoya di nav kesatiyên bûyerê de vedibêje (guft û go, diyalog), dîsan bûyerê şîrove dike bi sedem û mebestan, bê awaz bi gotinan (çîrok). Guft û goyê bi awazê distire (monolog). Li ber vê cûrerengîniyê em li hemberî hunereke diramatîk in ku qet ji wênegiriyê naye veqetandin. Bi tenê ev huner derfet jê re nehatine dîtî ku bête lîstin ta ku xwe ji kirasekî derxe û têxe kirasekî dî. Helbet bi vî şeweyê ku dengbêjî gihaye me, bi ciwantirîn şeweyê dengbêjiyê weke hunereke peyam gihandîye guhdarên xwe, ango peywira xwe bê qisûr di peyamdayînê de kiriye. Ev hunera mendeşî tesbîteke pir mezin e Zimanê Kurdî re weke ragirek ji peyamdayînê re, hem jî destnîşanek e ji zengînbûna gotina kurdî re. Mixabin dagirkerên kurdan di vê zengînbûnê de kûr têdigihiştin û ev zengînbûn rastî talaneke pir qirêj hat. Tirkan bi sedan çîrokên Kurdan kirine film. Bi hatina kapitalîzmê re û derfetên mezin yên ku sînema û TV dikarin bikin Tirkiyeyê encama cengeke serkeftî di van rêbazan de dît û ji ber ku wêneyên wan çîrokan hîn zindîbûn û ji ber ku bircewazî (burjuvazî) derbasî Kurdîstanê nebûye û hîn kurd weke berê dijîn, ji cil û bergan ta vac û pêwendîyan, Tirkan ti astengî nedîtî ta ku wêneyên wan çîrokan jî talan bikin. Her tişt amade bû ji bo talanê wê gavê. Ew film bi giştî pêşeroja derfetên dengbêjiyê bûn, lê ne bi raman ni jî bi zimanê Kurdan hatin çêkirin. Awazên wan jî ji awazên resen ên çîrokên ku jê hatine birin hatine çêkirin; lê dîsa jî ku stranek di wan filman de dihate



gotin awaze wê kurdî bû bi piranî ji Rihayê lê bi zimanê Tirkî dihate gotin. Cil û bergên Kurdan, navên Kurdan ên Îslamî, hemû dihatin bikaranîn lêb i Tirkî. Kurdên Bakur cara pêşîn wêneyê xwe bi Tirkî dîtîn, çîroka xwe bi Tirkî bihistin. Di vê rewşê de hem ziman hem jî wêne ji kurdan hate stendin. Bi çûna van herdu rêgezên simyatîkî yên bingehîn, kurd bi bişaftinê re rû bi rû man, miletekî bê şêwe man. Ev zanebûneke pir dijwar hate kirin, kompergalek bû. Ji talanê ji mûzîkê ta wêneyê ta qirkirina neteweyî (ezê hemû tiştên te bibim, xwe zengîn bikim, tu bixwe jî otomatîk xizan bimînî), ev mebest bû. Ji Mezopotamiya kevin ta dema niha gotine û wêneyê ev rêwîti kir. Ji ber ku nebûne xwedî desthilat di demên nêzbuhurî de piştî hatina Îslamê, ev herdu sîstem hem gotin hem jî wêne di rewşên zor xerab re derbasbûn. Di beşên pêş de ji vê pirtûkê em ê bandorên vê rewşê di çêkirina filman de bikolin.

KIRISTIYANAN

Li Oropa dest nêdan afrandina wêneyê. Ew berdewamiya ku ji Mezopotamiya gihayî (şahê – xuda) û ji ber ku îdî xuda di kesayetiyê Îsa de yekî bi tenê ye, ne komek xwedê ne, ew berdewamî hişktir kirin. Em dikarin bibêjin mirovên nepîroz weke mijar di hundirê wêneyê de ji demên neçîrvanan ta derketina IMPRESSIONNISME û EZMÛNGERİYÊ

(1850) hate veşartin; lê bi derketina van herdu dibistanên hunerî, ew mirovên xwezayî niştecih –nepîroz-li wêneyê vegeriya weke mijar, hem jî xwedî nameya resen ji wêneyê re. Helbet ev veger ne bi hêsanî çêbû, serkêşên van dibistanan pêrgî astengiyên mezin hatin bi taybet ji qesrên şahên Oropa. Di dema ku Împaratorê Fransayê tabloya IDWARD MANIYE (xwarina li ser gîhakê) dihatin derxistin ji Împarator bi xwe re, bi hinceta ku ev tablo tabloyeke ne ji rêzê ye, keçên tazî şewekirine, di vê rewşê de hem MANIYE hem jî WESLÊR salonek nedîtîn ku pêşengehên xwe te de vekin. Serkeftina van dibistanên hunerî mî di dîroka hunerê de di dîroka hunerê de û taybet di dîroka wêneyê de weke şoreşekê ji ber vê yekê tête nirxandin. Huner, wêne dîsa vegeriya hinavê mirovatiyê, hemû sirûştên van wêneyan hestên mirovên vê gerdûnê werdigerînin. Dêmeg em bi van dibistanan êdî ketine rewşa mirovatiyê, astengiyên wê, xemên wê, ev jî serkeftineke çandî û ramaniya pîrr mezin bû. Huner ji şewekirineke xwedayî, bû şewekirineke mirovatî, ji bilî vê yekê di rêbazê de ev hewldan tevî hewldana wêneyê bûyerê yê Mezopotamyaya ya kevnar wê bibine sedem û derfeta wêneyê tevgerane ye sînema.

*: Ayeteke Quranê ye.

**: Ayeta yekem a Quranê û gotina yekem.

***: Eykûn (Îkon, Îkona) Wêneyên girêdayî baweriyên Kirîstiyanan, wekî Meryem û Îsa

****: Ayeteke Încilê ye.

Berken Bereh; helbestkarê ku evîna xwe bêcîwar nahêle

Dilawer ZERAQ

Gava berhemeke wêjeyî li ber destê me be, em bi xwendina xwe ya li gorî têgihana xwe, wê ji nû ve diafirînin; em vê yekê di ser zimên re dîkin tevî ku nivîskar-helbestkar zimanekî arizî xwe ava kiriye û berhema xwe bi wî zimanî (zimanê vegotinê) nivîsandiye; helbet wekî xwendevan heq bi me re ye ku em vê yekê bikin. Ji ber ku nivîskar-helbestkar, ji bo berhema xwe bi çi eger û mebestê ev ziman ava kiribe jî (*mebest ji zimanê avakirî; zimanê gotin û vegotinê ye*); ji bo hayjêbûna xema wî/ê, her em ê berhemê di ser zimanê berhemê re bixwînin; û bi qasî ku em dişên, em ê peyvên di berhemê de hatî bikaranîn û rist û hevokên pê hatine sazîkirin, biferîkînin û wan xwemalî bikin.

Îcar, ku em ji bo zimanê helbestê van raveyên kurtkirî bidin ber çavên xwe, em ê karibin bêjin; a ku helbestê xurtir dike; awayê gotinê **(1)** û her wiha bikaranîna zimên a bi awayekî bilind e. Ger em bala xwe bidin Walter Porzig, em ê sedema awayê gotinê û zimanê bilind çêtir têbigihîjin. Walter Porzig dibêje, 'di zimanê rojane de armanc; tenê sanahîkirina jiyanê ya ji bo wê demê ye û zimanê rojane ji bo meşandina karê rojane, navgînek e,' û wiha didomîne, 'zimanê bilind; astên cuda cuda yên hizirînê dide der, qîma xwe bi vê jî nayîne û pê re jî, digel ku her peyv gava bi tena serê xwe tê bikaranîn hin wateyan di xwe de dihevine jî, -gava bi peyvên dîtir re tê bikaranîn wateyên xuya jê peyde dibin û ev jî geşedana peyvên a digelheviyê ye- wate li xwe û li peyvên dîtir zêde dîkin. Û di zimanê bilind de, peyv, kirû aşkera, zelal, bipuxte û gewrîrastî tê zimên.' **(2)**


Loma jî, piştî van saloxan, wê gava ku em gavekê berpêyî berhemên Berken Bereh diavêjin, serê ewil ev yek bi ber çavên me dikeve. Berken Bereh, berî her

tiştî xwedî hişûbîreke zimanî ye û ew helbesta xwe jî li ser vê hişyariyê ava dike. Ew ne di hewla vedîtina zimanekî de ye; belê di nava zimanê heyî de (zimanê rojane), bêtî ku xwe ji rewaniya zimanê rojane dûr bixîne, ji bo xatirê avakirina wateyên dîtir û nûtir, xwe parîkî ji awayê bikaranîna zimên ê dabî (adetî) û gerdîşî dide alî; çawan helbesta wî bivê, wisan û bi wî rengî xwe jê dûr dike; lê her tim jî di nav xet û tixûbên fêmbariyê de dimîne; rast e ev yek tiştêkî gelek çetin e; ji ber ku xefik û xetere gelek in li pêş bikaranîna zimanekî rewan û fêmbar; berî her tiştî dibe ku helbestkar ji '*şêweyê gotinê*' dûr bikeve û têkeve nav xefîka 'zimanê sakar (basît)' û ziman bo helbestkar ne yek ji armanca berhemê be, lê navgîna berhem û vegotinê be. Lê em dilhêsa ne; Berken Bereh di vî warî de xweş bi ser dikeve.

Ji ber ku gava ew di helbesta xwe de bi zimanê xwe î rewan û fesîh (ku bêhna zimanê rojane jê tê, lê zimanekî bilind e), peyvên digihîne hev, di heman demê de her peyvê bi aliyekî de dişîne; loma jî ew peyv li ciyê ku çûne dibin sembola hin serveyan ku piştî ku vedigerin şûna xwe ya di helbestê de, bi peyvên din re pevrebûnekê pêk tînin û bi wateya ku hildane jî

peyvên dîtir watedar û her wiha helbestê jî xurtir dîkin.

Her wiha xîm û sedemên vê hişûbîriya Berken Bereh, ne tenê ziman e; di heman demê de, helwest û sekneke polîtîk e jî. Ew, li ber wan kirin û lêqewimandina li peyvên Kurdî ku bi dehan salan li gund asê hatine hiştin û wek şûngehê (mekan) xetimanîna zimanê Kurdî, bûye zimanê malê û gund, radibe; û çî gava helbesta xwe ava dike, digel ziman û poetîkaya xwe; a ku bi têgiha '*hişûbîra nehêsa*' **(3)** ava bûye, şûngehekê jî ji bo peyvên Kurdî dihi-



zire.

Çawa ku di helbesta wî ya bi navê 'Bajarekî Bê Navnîşan' de, bi tevî epîgrafa helbestê jî, bi me ve xuya ye, dixwaze şûngehekê ava bike bo helbesta xwe: û bi bibîrxistineke dîrokê, hewlê dide ku navekî li bajarê ku dê bibe şûngeha helbesta wî, deyne. Û berî ku ew bersîva xwe ya ron û zelal bi hêma û sembolîzekirinê di helbesta xwe de bi me bide zanîn, dixwaze em berî wî bersîvê peyde bikin; yanê dike ku wêjeya wî bi rola xwe ya ku li ser xîma 'wêje; ne ku bersîvê dide, pirsan diafirîne' ava bûye, rabe.

Bajar ji mîna mirovan dijîn û dimirin
Bajar ji xwedî kilamên serbixwe û taybet in
Bajar ji bi me re bi rê ketin
 Qewaqa cer çedikirin
 Bêrîvanan penêr
 Û giranî lîstika sereke bû li dîlanan
 Mala min ê vî bajarî

.....

Û her mêr
 Camêr
 Û mazûvanekî mir
 Lehengekî bêhempa bû
 Di şabaşa şoreşê de

Ev çendîn sal in
 Dipirsim ji mirovan, ji teyr û tilûran
 Diyar e gelo
 Navnîşana vî bajarî
 (Ji helbesta 'Bajarekî Bê Navnîşan') (4)

Lê ji ber ku Berken Bereh ji destpêka helbest û helbestkariya xwe de şûngeha evîn û helbesta xwe li ba xwe diyar û aşkera kiriye, bêtî ku serî li peyvan bade, zûka diyar û aşkera dike şûngeha helbesta xwe.

.....

II
 Hêlîna me talan kirin van bêbavan
 Cara çendemîn e bizanin
 Neviyên 28 raperînan

III
 Hêviyeke ji pola ye
 Ew bajarê malmîrat
 Çi qasî tê kuştin
 Ew qasî xweşik dibe

IV

Ew bajar lê
 Qirşan berhev dike
 Li ser guliyên dengê xwe
 Hembêza xwe dixemilîne bi binefşan
 Da aştiyê bihebîne
 (Ji helbesta 'Ew bajar') (5)

Belê ew şûngeha ku em li benda avabûna wî ne; Kurdistan bi xwe ye.

Lê tiştêkî dîtir û rajortir heye ku; ev şûngeh têra Berken Bereh nake û ew dixwaze bila şûngeha helbestê wî bibe 'BAJAR'; loma jî şûngeha helbesta Berken Bereh, ne wek şûngehekê ye ku bes ji axê pêk tê; lê belê ew bajarê xwe; wekî şûnewarekî jiyînê, ku lê; dîtîr, hewandin, navlêkirin, qebûlkirin, rapirsîn-vepirsîn, jêfamkirin, hejlêxistin, veavakirin, guhertin, xurtkirin, veguherandin û geşepêdan, li dar e -ku ev hemû taybetiyên 'bajarîbûnê' ne-; xeyal dike, difikire; û ava dike.

Her wekî tê zanîn, kesayetiya nivîskaran parîkî be jî di berhemên wan digere û mirov çiqasî bixwaze wan bi bêhneke dîtir bixwîne jî, dîsan hilma kesayetiya wan û lîstikên wan jê difûre. A Berken Bereh jî her wisan; ew wekî helbestkarekî xwedî kesayeteke ranerm û aram, gozegirên hûr û barîk û nazenîn li honaka helbesta xwe dide û; ew peyvên Kurdî ku wekî kan û jêder, gihajî (ayîdî) çand û jiyana gundewariyê ne, di nermahiya zimanê xwe î xweser de cî bi cî dike; wan peyvên, digel peyvên dîtir ên ku dê karibin şûngeheke bi hişûbîr û fêmbariyê avabûyî, -yanê şûngeheke bajarî- binin bîra me, bi kar tîne û peyvên Kurdî dike xwedî şûngeheke bajarî.

.....

Kor bûm
 Heta ku min ji te hez nekir
 Tu caran nediguherî demsal
 Daran xwe nedixemilandin
 Bi pelg û kulîlkan
 Germ nedikirin
 Bajar, kolan û zevî
 Jiyan wiha têrtehm û
 Ne xwedî wate bû
 Niha har û dîn im
 Ji bo evîna te
 Ey welatê nav li min kirî

.....

(Ji helbesta 'Heta ku min ji Te hez nekir') (6)

.....

Rûyê bajêr çîlmisî
 Deng di zinaran de wer bûn

Bûn agir û pêt
Bi kilaman tenûr dadan

.....
.....

(Ji helbesta, 'Çiyayên Serqot') (7)

Ku em piçekî dî jî pê de herin, bi şîroveyeke ne rapir, bi ravekirina M.H.Dogan, dikarin bêjin ku Berken Bereh, 'gava ku helbestê dinivîse, tu tişteki venabêje bo me, tu tişteki napeyitîne. Brevajî wê, dixwaze şanî me bide, me pê vehisîne; û belkî jî hin tiştên ku heta vê hingê şaş hînî me hatine kirin, biguherîne, veguherîne û hejê li wan xîne.' (8) Û em bi vê yekê re jî guh bidin, Schiller ku dibêje, 'Ziman her tiştî bi term û tîgehên aqil vedibêje. Herçî helbestkar e, bêgav e her tiştî bi term û tîgehên hêza aşopa xwe bibêje' (9) em hin peyvên li gorî ciyê ku tên şandin û car dî li şûna xwe vedigerin, hildin dest; em ê karibin vê şîroveyê bikin li ser zanîn û raveya jorîn.

Kor bûm/Heta ku min ji te hez nekir: Dîtin û hezkirina ku çêbûye û qebûlkirina wê.

Tu caran nediguherî demsal/Daran xwe nedixemilandin/Bi pelg û kulîlkan: Guherîn, veguherîn û geş bûn.

Bajar, kolan û zevî/..... Rûyê bajêr çil-misî/...../Bi kilaman tenûr dadan: Peyvên ku wek şûngeheke jiyînê, gihajî bajar û gund in, digel hev hatine bikaranîn û ev yek jî bi me dide nîşan ku şûngeha xewna Berken Bereh, ku dixwaze di helbesta xwe de ava bike, ne çêkirî ye; û ne veguherîneke zimanî ye jî; lê belê, ew sazîkirin, ew avaniya hundirîn e ku rasteqîna ku bi demê re diguhere û hîşûbira wî zextê lê dike.

Bi şîroveyeke ku dixwaze hêz û destpêkîbûna helbestê bide der, ji alî hin dahûrînerên helbestê ve tê gotin ku helbest qîrîn e; loma jî helbestkar diqîre, dike barebar. Tew hin kes jî dibêjin, helbest berhemê, afiraneke barbar e. Lê ev yek bo helbesta Berken Bereh, netê ye; ew di helbesta xwe de naqîre, nake barebar; loma jî mirov dibêje qey Berken Bereh bêdeng dimîne. Naxêr. Ew bi me re diaxive; û tu xemeke wî tune ye ku bi hêz û zexta qîrîn û barebarkirinê helbesta xwe bi me bide qebûlîkirin; loma jî ew bi tîgeha 'hêza aşkerabûn û şilftiyê (şilftiya peyvên)' û 'hêza dilîni û hizirî' bawer e; ew wê gava ku bi me re diaxive, di nav kêferatekê de ye ku bo dengê xwe jî şûngehekê ava bike. Şûngeheke wisan ku; nehêle ku dengê wî yî xweser di nava xirecira dengên de bifetise û karibe xwe heyî bike. Û Berken Bereh, di vê hewldana xwe de bi ser jî dikeve. Piştî ku ji bo helbesta xwe, wekî şûngeh, bajarekî ava dike; di kolanên bajarê xwe de, ger û doşên nermik dide xwe; û dengê xwe peyv bi peyv terbiye û kemlan dike (em ji bir



nekin ku tîgehên wekî; perwerî, hêvotin, dabûnerî, pîr û pergal, dinyadîtî û hwd. Jî gihajî 'çanda bajarî' ne); da ku evîna xwe jî bêşûngeh nehêle; û çî gava em û wan di hev de derdikevin, bi nermayî li me dibişîre; ku em xwe lê daneynin jî, xwe naxeyidîne û ew hêz pê re heye ku karibe bi me re biaxive; wisan jî dike.

Peyvên helbesta Berken Bereh, kirasên rengîn û gulgulî –belê ne kirasê lêqewmî û mezlûman- li jîyan û serboriya mirovên xizan û çewisandî dike; wan jî hest û reaksiyon û daxwaza serhildanê bêpar nahêle; loma jî wan nake lêqewmî; û bi bişîrîna xwe ya nermik û nazik êş û azarên mirovan û berxwedana wan, di guhên me de dipistîne û dibêje:

.....

.....

Bi me re xweş e bîranîn delala min

Mirin bi me re xweş e

Li ser çiyayekî

Di grevekê de

Di dil de evîn

Li ber xwe dayî heta êvarê

.....

.....

(Ji helbesta 'Mirin bi me re xweş e') (10)

.....

.....

Ku ez te derxim
Çi dimîne ji vî bajarî
Dildarên wê çûbin
Xizaniyê konê xwe vegirtibe
Mirinê zarok dabe ber lehiya xwe
.....
.....

(Ji helbesta "Tixûbên êşê") (11)

Helbesta Berken Bereh, evîna xwe berev derveyî xwe navirvirîne û bela sebeb namezixîne; loma jî nihêrîna wî ya li evînê ne ji awirê rojavayî ya kapîtalîst e ku; evîn li xwe dike 'tişteki daxwarin û mezaxtinê'; û di şert û mercên êşkêşan û jiyandina evîn û hezkirinê de, xwedîtî lê nake û qîmeta wê ne di wexta jiyîna wê de, lê piştîre dizane...; belê, Berken Bereh, ji awirê rojhilatî ve li evîn û hezkirinê dinihêre û xwedîtî lê dike; evînê bi wêrekî di dilê xwe de dihevinê; û di her helûmercê de, di hemû diwariyan de bi demê re dikeve diberdaneke jiyânî û bi qîmeta evîna xwe dizane. Û digel ku şûngeha evîna xwe şanî me dide, wiha dibêje ji me re:

diyarî bo wan kesên ku dane dû bayê dilê xwe
Dilê te êtûna helandina tirsê
Rûyê te tavehevî bû di şevê de

Her ciyê ku evîn lê tê çandin
Te welat hesaband
Jiyan şêrîn bû û bi çêj bû
Di hembêza te de
.....
.....

(Ji helbesta Bê Nav) (12)

Evîna helbesta Berken Bereh dixwaze qad li xwe firehtir bike, xwe ji dayîn û wergirtina adetî û sakar bîrî bike û ji tîl û gazên ku berê evînê didin zimagan, bibore. Û wer bike ku êdî şûngeh bi xwe jî têrî evînê neke û belkî ji ber wê yekê şûngeh hesûdiyê jê bike (û ji hesûdiyê xwe bikuje). Lê tevî ku Berken Bereh naxwaze bajarê xwe î bo helbesta xwe ava kiriye, bihesidîne jî, evîna wî û şûngeha ku wî ji evîna xwe re ava kiriye bilindtir û rajortir in bo wî; ji ber ku ew dixwaze di her rewşê, di her şert û mercê de evîna xwe û şûngeha wê derbasî qad û şûngehên bilindtirin û rajortirîn bike; loma jî di dil şûngeha evîn û helbesta xwe de nayê û wiha dibêje ji me re:

.....
.....
Kingê ku em bêne ba hev rû bi rû
Em neyên ba hev çêtir e
An
Wekî berfa tawdîtî bihelin û bimirin

An jî
Ji hesûdiyê dê ev bajar xwe bikuje
(Ji helbesta Kingê ku em bêne ba hev) (13)

Berken Bereh evîn û helbesta xwe bêcîwar û bê-şûngeh nahêle; ji ber hindê jî, berî her tiştî tîl li bedena helbesta xwe digerinê; gazî me dike û dibêje; **'ger we divê, fermo werin têkevin nav bajarê min û têra dilê xwe di kolanên ku gerînek didin xwe de doş bibin û ji vê şûngehê, şûngeheke dîtir ava bikin bo evîna xwe.'**

Perawêz:

(1): Mebest ji bikaranîna lêkera 'gotinê' ev e; helbest ne şêweyekî vegotinê, lê belê şêweyekî gotinê ye.

(2): Dîl Denen Mucize (II) (Derhozeya Navê Ziman Lêkirî (II): Walter Porzig, Türkiye Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, 1994, Ankara (Weşanên Wezareta Çand û Turizmê a Tirkiyeyê, 1994, Enqere.)

(3) 'Hişûbîra Nehêsa': Hegel: Ê ku radiguhezîne J. P. Sartre; Aydınlar Üzerine, Can Yayınları, 1994, İstanbul (Raveyên derbarê Rewşenbîran, Weşanên Can, 1994, Stenbol)

(4): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

(5): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

(6): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

(7): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

(8) Tekrarın Tekrarı, M.H.Doğan, Y.K.Y, 1999, İstanbul (Dubarekirina Dubarekirinê, M.H.Doğan, Weşanên Y.K.Y, 1999, Stenbol)

(9) Ê ku radiguhezîne; Ernst Fischer, Sanatın Gerekliği, Payel Yayınları, 1995, İstanbul, (Ernst Fischer, Dîvêtiya Hunerê, Weşanê Payel, 1995, Stenbol)

(10): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

(11): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

(12): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

(13): Hemû Berhem, Berken Bereh, Weşanên Lîs, 2011, Diyarbekir

Têbînî: Ev gotar, di Fuara pirtûkan a li Stenbolê (2011) ku li ser sî û du saliya helbestkariya Berken Bereh hatî lidarxistin de, hatiye pêşkêşkirin.

Hesretên “tu li ku yî?”

Rêdûr DÎJLE

*di peyaseya êvarekê de,
bi hemû bedewiyên xwe, te xwe jî min dizî;
li ser lêvan bi tenê dewsên çerixîne û hesretmayî hiştin...*

I.

Tu qet bi êşa hesretê,
hesretên avîsî ketiyî?
An jî tu di hicrikên dilî de,
bi hesretan qet avis bûyî?

ê min bixwe...

Êdî,
nameyên min betilîn di riyan de. Hibir hişk bû di gewriya pêûsê min de. Li deşt û
zozanên min keriye kulan û xeman dimeşin. Li aşê min jan tene hêrandin. Sebrê
mehde li min tîrş kiriye; dil tîrş bûye bi havênê hesretmayînê.

Lewra;
li van deran Xwedaxêr nemane, mizgîna xêrê bidin...

II.

Tu qet di hicrikên dilî de,
nolî vîrusekê,
leqayî keftûlefa hesretên mefredkirî hatiyî?
An jî şepêlên hesretî,
qet li keviyê dilê te çerixîne?

ê min bixwe...

Êdî,
mecal di min de nemaye,
lewra di asoyên hesretmengenî de her roj dilê min tê ecîqandin
û teraş kirin

III.

Û
tu qet di hicrikên dilî de,
di formula “hesret = tenêtî”yê de,
li bersiva “hesretên ‘tu li ku yî?’ geriyayî?

2007 Bismil

Demsala xeyalan

Ehmed BELEK

Min te li hemberî xwe da rûniştandin
Û wekî zarokekî listikxwaz
Ketim xwezaya çavên te...

Demsal bihar bû
Di çavên te de
Û tîrêjên sor belav bûbûn
Mîna tîrêjên tava biharê
Ez li çavên te dinêrim
Û min diguherin
Ez dibim zarokek
Di bişirînên bihuştî de
Dibim ciwanekî dildar
Ligel dibim bav dibim kal...

Min li çavên te nêrî
Û ez kor bûm!

05/03/2011

Bêdengi qêrîn e

Salih BADILÎ

Rastî ez nizanim gelo pêdivî bi vê heye yan na. Lê çi bikî, dema bavê min girîng bibîne ka ez dika-rim li hemberî wî tiştêkî bibêjim. Dibû ku min ji bo bavê xwe îqna bikim hewl bida û bûyî nebûyî li hev sîwar bikirana, min ê ew pê bida bawerkin lê min nekir. Bi ihtîmaleke mezin min dixwest bi vê ceri-bandinê hinek behreyên şanogerî dîsa bidest bi-xista. Min dixwest bizanibim ka ez mirovên li hemberî xwe bi çi û çiqasî didim bawerkin.

Ber bi êvarê piştî ku bavê min kartek kire kefa destê min, axaftineke kurt kir. Dixwest dilê min aram bike. Piştî çend bêhtengiyê min serê xwe te-wand.

Li ser kartê navek, di bin de navê pişe û navnî-şanek hebû.

Bavê min çavên xwe yên di bin birûyên stûr de kutan çavên min û got; “lawo ji bo qenciya te.” Ez difikirim; “belê, ji bo qenciya min, ne wisa?”

Dema ez derketim der, roj diçû ava. Min destê xwe bilind kir û texsiya ewil li ber min sekinî. Min navnîşan da şofêr û piştî xwe siparte paldankê; tî-rêjên rojê yên dawîn xwe digihandin avahiyên bi-lind û di nav rengên reş û sipî de qeratiyên reş î dirêj ên tirsnaq derdiketin holê, siyên avahiyên di ser hev de werdigeriyan. Avahiyên biçûk di bin siyê de winda dibûn, diketin bin şevreşekê. Darên li kêleka rê her diçûn gewr dibûn. Lê nivro çiqasî şîn dixuyan. Dar heman dar in bêşik, lê tîrêjên rojê bi me dilîzin. Tîrêj her kêmkirî dibe û êdî mêjiyê me bi rengên cuda me dixapîne. Û em dar û beran gewr dibînin.

Heger mirov bipirse bê aliyê zanebûnê yê xerab çiyê, ez ê bibêjim; dibe ku kûştina meraq û kelecana ku ji nezaniyê pêk tê ye. Dema sêrbaz ji kumê xwe kerguhê derdixe, hema dimîne ku em zimanê xwe daqurtînin. Ji ber ku ev yek ji fêrbûnên me vaja dike. Lê dema ku em hîn dibin bê ev ji teknîk, lêz-gînî û malzemeyan pêk tê, wê demê bişirîneke bi zorê li ser lêvên me diyar dibe, matmayîna berê ji difire û ji holê radibe.

Her çiqas di dirêjahiya rê de ajokar çend caran ceriband ku bi min re têkeve tîkiliyê jî, ji ber ku min bersiv nedayê, wî ev hewildan weke “pêşbira tîkiliyê” şîrove kir û dengê xwe birî. Piştî demekê texsî hêdî dibe û disekine. Şofêr; “navnîşan va ye” dibêje. Bêyî ku binêrim ka ku der e, derdikevim û pereyê şofêr didimê. Ez dizanim min zêde dayê lê

ew nizane. Çawa ez peya dibim, ew heman dajo û bi dûr dikeve.

A niha ez li ser kolaneke pîr qerebalix û li ber avahiyeke deh qatî ya şanedar im. Li hêla pêşîn çend tabelayên daliqandî diqelibin çavên min, ku kar û pişeyên cûrbicûr diyar dikin. Çavên min bi qasekê li tabelaya mirovê ku li hêviya min e, digere. A ha li wir qata herî jorîn e. Yeqîn asansor heye!

Piştî ku korîdoreke dirêj dimeşim, li zengilê deriyê ku derdikeve hemberî min dixim. Demek derbas dibe, keçeke ciwan û xweşik a ku berçavkeke gevez li ber çavan e, derî li min vedike û min pêş-wazî dike. Ez navê xwe dibêjim. Serê xwe bi erênî dihejîne û cihekî rûniştinê nîşanî min dide. Ber bi maseya li kêleka derî ve diçe û çend kaxizan tev dide û piştî cardin ber bi min ve tê. Bi nermî xwe ditewîne û bi awayekî şîrîn dipirse gelo ez tiştêkî vedixwim an na. Ez vê eleqeya wê zehf zêde û çêker dibînim. Bi kurtî; “na” dibêjim. Hê ku bi dûr di-keve, ez di çavên wê de hewla lêgerîna nexweşiya xwe dixwînim.

Gava ez her xwe di paldankê de mîna zarokên anîsas dilerizînim, çirkeçirk jê dihê. Nizanim çima, bi qasî sih kûrsiyî biçih kiribûn. Li navê li ser çend sêpiyên şûşe rojname û kovar hene. Mirovekî navsal î qelew di televîzyonê de jiyana sewalan temaşe dike. Ez bawer dikim ev polês an leşker e. Teqawît e û jina xwe dikute. Çend mezin û xatirbilind ketine navbeyna wan û ev mirov şandine vir.

Heya demekê çavên wî qelibîn ser min. Difiki-rim, ger ez çavên xwe jê nerevînim, dê rabe û xwe rikêvî min bike.

Cara ku ez ketim hundir jî min tê derxistibû lê min newêribû lê binihêrim. Niha heman dem e! Serê xwe ber bi aliyê çepê dizivîrinim, sê çar kursî wêde jinek pîr serê xwe bi tevgerên bi pîvan hevraz-berjêr dihejîne. Di her hejîne de porê wê yê zerîn rûyê wê dinuximîne û cardin rûyê wê yê gilover derdikeve holê.

Çi derewan bikim, tenê carekê be jî min ne dît ku ew li min dinihêre û ne jî hîs kir. Bi hevalên xwe yên xeyalî re lîstika ‘serhejandinê’ dilîst.

Li diwaran wêneyên însanan û sewalan ên ku rewşa wan a herî xweşik nîşan dide, daliqandiye. Rêzkirina wan, mezinahiya wan a li hevhatî, bigire heya boyaxa li diwêr di min de şikeke li ser fikrî afirand.

Bêhna min her diçe teng dibe. Belkî ez ji vir derkevim, dawiyê li vê lîstikê bînim, dê çêtir be. Lê wê keçika hanê ya ku li ser maseya kêleka derî rûniştiye û di bin wan berçavkên gevez re bi awayekî watedar li min dinihêre, çi bikim? Serê carê berê xwe dide odeya hundir û cardin vedigere ser maseyê.

Herî dawî dora min hat. Derê odeyê hebekî vedibe û mirovekî ciwan serê xwe dirêj dike û navê min dixwîne. Dema ku dibîne ez ber bi wî ve diçim, bişirîneke xweşik di rûyê wî de cih dibe. Hema dimîne ku ez têkevim hundir, ez bi yekî re rûbirû dimînim. Bi awirên xembar li min binihêre. Ew kî ye? Ew çav, poz, ew birûyên stûr... Xwedêyo, ew ez bi xwe me. Dema karê min qediya, ez ê ji wan bixwazim bila wê neynikê ji wir rakin.

Ev salona fireh jî ji xeynî çend detayên cuda heman mîna odeya din e. Dîsa paldank, sêpî û wêneyên ku dîwaran dixemilînin.

Li hêla çepê dolabeke pirtûkan a ku li dîwêr hatiye sipartin, akvaryûm û kulîlkin hene. Çend paldankên sivik li kêleka dîwêr hatine rêz kirin, digel van çend jî danîne nav odeyê, hedar û xwedî konfor...

Li arîk bi dehan lempe bicih kirine û ji ber xurtbûna ronahiyê tu tişt bi siya xwe re nakeve nav lîstikê. Her tişt di nav rastiya xwe ya resen û zelal de ye.



Mirovê ciwan çawa ber bi min ve hat, heman min têderxist ku wî jole li porê xwe daye. Vê şabûneke ecêb di min de afirand. Tê bêjî qey min aliyê reqîbê xwe yê lawaz dîtiye. Ciwan û çiqas bibêjî lehatî ye. Li kursiyê li hemberî min rûdinê. Bi awirên xwe min dişopîne. Ez têderdixim ku ew berçavka li ber çavan ne ji ber nexweşiya çavan e. Ez bîbikên çavên wî kite bi kite dibînim. Ew berçavk ji ber daxwaza ku bibe desthilatdar û cidî bixuye daye ber çavên xwe. ‘Dek û dolabên derûnzanan ên biçûk’...

Destên xwe dide ser hev û dibêje; “çawan i?” A niha difikirim, gelo bersiva vê pirsê ji rêzê jî normal be an? Lê dîsa jî bila ji min re bigota “çawan in, an jî cenabê te çawan e.” Lê dibe ku xwestiye bi min re têkiliyeke aram dayne. “Herkes li hemberî vê pirsê dibêje, baş im, ez jî yek ji wan herkesan im, ji ber vê jî ez jî dibêjim, baş im” ez weha dibersivînim. “lê baweriya we li min nayê”. Bi awirên matmayî li min dinihêre, paşê dikene. Dibêje; “bavê te ji min re gotibû, te felsefe xwendiyê.” Mîna ku bibêje, “ez dizanim lawaziya te çi ye.”

Lê ne bavê min ne jî bijîşkê min î niha dizanibûn ku eleqeya min ji Arîsto zêdetir li ser Freud bû. Belê, di sêrî de min ji felsefeyê hez dikir lê ‘her tişt diherike’.

Dema ez li zanîngehê hê di pola yekemîn de bûm, mîna bawermendên xaçperest ên ku gunehên xwe ji keşeyan re diweşînin, min jî serî li derûnzanan akademîsyen dida û piştî ku wan teşhîsa bihîstiyariya zirav a asta bilind dadanîn, pirtûkên min ên li ser derûniyê her diçûn zêde dibûn. Her çiqas doktor dest bi aşkirina bêhîskirinê kiribû jî êdî ji ber xapandinê ez di nav zewqeke bêhempa de bûm. Ji ber dermanên ku didan min, carinan ez nedigihîştim waneyan. Xeweke şîrîn bi ser min de digirt û bi dirêjahiya rojê ez radizam, bêtî ku tiştêkî hîs bikim an bifikirim. Ez çawa ji vê tesîrê difilitim, min destpê dikir, lêgerîna derûnzananê nû dikir.

Yekî nûgihîştî malbata min weke sedem nîşan dida. Min gotê, “dayika min mamoste, bavê min jî endezyar e”. “Lê binêr, çawa difikirim, wisa ye, qeyrana derûnî ya bûrjûva” dibêje û mijarê sererast dike. Yê din ceriband ku têkeve bin hişê min û mijarê zelal bike. Dawî pêşniyara hevaliya bi keçikan re kir. Lê wê deme keçeke hevala min hebû. Piştî hefteyekî em ji hev cihê bûn û êdî hevala min çenebû; min nexwest, ji ber ku herî dawî dema ku ez nêzîkî wê bûm min şûna evîne kerx hîs kir.

Hûn jî jin in, dibe ku hûn bifikirin bê min neheqî lê kiriye lê ne wisa ye. Belê ew jî yê din cuda bû lê ez jî wisa bûm. Mîna dû sewalên ku ji birên xwe veqetiyane, em pêrgî hev hatin. Di nav wê rewşê de ewil me gelek tişt parve kirin. Lê mîna her tiştê ku tu her dizanî û dibe tiştêkî ji rêzê, em jî çi-

qasî hînî hev bûn, nakokiyên me derketin holê. A rast me dinya mîna hev şîrove nedikir. Tê bêjî qey em dijberên hev bûn. Ew li aliyekî ez li aliyê din...

Dawiya heftiyê pirî caran ez li ba zarokên sêwî bûm. Axaftina bi wan re, sitandina diyariyan a ji bo zarokên ji hemû temenî û cinsî û ji coxrafayên cihêwaz ez kêfxweş dikirim. Ev tenê ne mijara kêfxweşiyê bû, berpirsiyariyeke wijdanî jî bû. Vegotina vê derûniyê ji bo min zehmet e. Bavê min ji ber çûna pereyên zêde tengazar dibû. Lê dema durojan bi qumarê nelîsta, min dikaribû dirêjahiya du hefteyan ew zarok serfiraz bikirana.

Tişt ku ez di çavên wê keçikê de biçûk xistim jî ev bû. Bi ya wê ev hewildaneke bêwate ye. Frensî zîmanê arîstokratan û Îngîlîzî zimanê bûrjûvayan e. Lê dîsa jî diceriband ku fêrî bibe. Ger zarokên wê hebin nedixwest ku têkiliyan van zarokan bi wan re hebe. Di her nîqaşê de ez bi ser diketim lê ev ne girîng bû. Bi ya wê ez biyaniyê xwezaya xwe me.

Bi ya min, keçika ku derûnzane reben pêşniyar kir, ev nîn bû. Biborin, ez hevalkarê we wiha binav dikim xatûna xweştivî, lê bi ya min be, yê ku di kûrahiya kitekitan de wînda bibe, nikare rastiye ji her hêlê ve bibîne. Mîna ku mirovên kor filekê bidin nav xwe û bi destên xwe wê vebibêjin, ne wisa?

Doktorê min ê nû digihîşt dawiya axaftinê, ji ber ku amadehiya dawiyê dikir. Li ser deftera xwe hin tiştan dinivîsî. Herî dawî got; “hevalê hêja, têkeve nav civakê, mîna herkesî û rê û rêzikan tev bigere”. Paşê jî reçeteya nivîsandî dirêjî min kir. Dibe ku vî jî pênaseya ‘sosyopat’ bi min ve kir. Baş e, ev tiştekî nû ye! Dibe ku mirov bêhnfireh bibe, piştî ku yên din weke ‘nevrotîk, psîkotîk, şîzofren’ binav kiribûn



ev şîr û şekir e. Yekî jî gotibû, ji ber ku tu ji malbatê bi dûr dijî, dibe kû pirsgerêka anksiyete be.

Belkî jî ez paşê diyardeyên cuda nîşan bidim da ku hin navên derûnî yên din li min bikin.

Doktor bi nazîkî ez heya ber dêrî birim. Dema ez derketim min ji wî xwest ku bila wê neynika li kêleka derî ji wir rakin. Bi awirên matmayî li min nihêrî. Min berê xwe da deriyê der. Keçika berçavk gevez derî li min vekir. Gelo masajê li stûyê doktorê westiyayî dike, an carinan doktor dest davêjê. Kî dizane.

Li ser kolanê min cardin li tîrêjên avahiya bilind nihêrî. Doktor ji min xwestibû ku ez dem bi dem serî lê bidim, lê encax piştî şeş mehan bi darê zorê ez hatim ba wî. Di vê navberê de min bi awayekî cidî hewl da ku tevli jiyana civakî bibim. Min çend caran karê xwe guherand. Serê carê bîzê min li hev ket û ez jê derketim. Ji xwe li ser van pîşeyan di dosyeya min de agahî hene lê ya ku hûn nizanin ev e; cihêwaziya navbera tiştên îdeal û tiştên rast. Em rojnamegeriyê têxin mijar, min çend mehan ceriband. Zêdetir êdî min nikaribû.

Mîna herkesî min jî wer hîs dikir ku ev karekî civakî ye, venêrîna saziyên civakî li ser navê gel... hêza çaremîn felan fistan. Di sêrî de belkî, lê a niha na...

Dema min têderxist ku mîna rêxistina mafyayê dixebite, bi kasêtan şantajê û çavtirsandinê dike, ez serobino bûm û jê veqetiyam. Kitekit hene lê ne hewce ye.

Du hefteyan şûnde ez bi ser xwe ve hatim. Ya rast ez ê zêde têtetama bin bandorê lê ji xwe min dizanibû. Min xêzeke stûr kişande ser hêza çaremîn lê qet nebe bila hersê hêzên din pak û paqij bibana. Rojên dîtirê min bihîst ku yên berpirsiyar ên herî bilind ên van hêzan jî mîna pelgên daran diweşin û bi gû ve dilebitin. Min jî li hemberî van nexweşiyên teoriyên nedîtî afirandin. Nakevim kûrahiyê û naxwazim vebêjim lê hûn xatûna xweştivî, ji ber ku bi we bawer dikim, bi kurtasî bibêjim. Navê wê teoriya QA-DA-RE ye. Qanûnê li hemberî qanûnçêkeran bê derxistin, yên darizandî bîr darizandin û yên rêvebirî bîr belawelakirin. Dibe ku hûn bibêjin ev teoriyeke jiber girtî ya îhtîlaxwazan e. Lê ger we kûrahî bizanibûya ev fikra we dê biguheriya. Û ez niha nikarim têkevim kûrahiyê. Dibe ku paşê.

Tesîra gelek tiştî li ser çêkirina vê teoriyê bû. Min carinan berê xwe dida nav qelebalixa şênî yê ku li kolanan digeriya. Min ew temaşe dikirin û çavdêriya wan dikir.

Bi ya min ew berçavkên reş ên ku didan ber çavên xwe ne ji tîrêjên rojê lê ji ber veşartina çavên xwe yê tirsak û xemgîn bû. Ger hûn jî mîna min xwedî behreyên şanoger nîn bin, ew çavên we xem

û metirsiyên we bêfîkar, bi hemû zelaliya xwe nîşanî mirovan didin. Carinan min li çavên mirovan dinihêrî û kar û pişeyên wan pêş didît. Ew li ban-kayê dixebite, ev teqawît e, ev xwendekar e. A rast min şewazê meşa wan, kincên wan û temenê wan jî weke hêmanên alîkar bikar dianî.

Ev mirovên ku cot digerin, destê hevûdin digirin. Ger karekî wan ê dinê tune be gelo heya ku hev hevraz berjêr kaş dikin, çima naçin cihekî tenha û tiştên xweş ji hev re nabêjin an hev ranamûsin?

Carekê hebekî durrî min bû teqereq. Herkes ber bi wî aliyî ve reviya. Min jî cî bi cî bi çavên xwe bûyer dişopand. Bi qasî bîstekê hinekên kincên reş li wan dabûn pey çend ciwanan û di kêleka min re derbas bûn. Yekî jî wan kaskê serê xwe di pey ciwanan re wer dikir. Ciwanek dema direviya lingê wî li dezgehekê ket û xişir, gustil û moriyên ser rijayan erdê. Paşê yekî kêmendamiyê kursiyê xwe bi zorê daket erdê û ew tiştên belavbûyî dan ber hev. Di awirên wî de kîneke bêdawî dihat xuyan. Ew ên kinçerê xortek tengav kirin û kêmendamiyê me jî li erdê holo-molo bû.

Yek li ser serê min sekinî. Heya demekê bi hûrbînî li min nihêrî. Nizam çima, paşê mîna hevalên xwe yên din da çargavan di nav kolanan de bera ciwanan da. Min awirên dîname xistin bîbikên çavên xwe û ez di nav gel re derbas bûm, min berê xwe da malê.

Dema ez hatim malê, dayika min jî nû hatibû. Bi bedena xwe ya qelew ji salonê ber bi mitbaxê ve diçû, ji wir jî derbasî odeyeke din dibû, carinan xwe dida ber neynikê li porê xwe yê nû boyaxkirî mêze dikir, be ka lê hatiye yan na. Firaqên ku nû kirîbû, bêyî ku ji qutiyê derxe, li mitbaxê didan ser hev. Yê îşev dîsa li kêleka min rûnê, bi awirên xemgîn li min binihêre û xem û qurfên xwe di dilê xwe de mezin bike.

Piştî çend rojan bavê min navnîşanek li ser kaxizê nivîsî û dirêjî min kir, gote min ku ez li vir di karim mamostetiyê bikim. Ez çûm û min dest bi kar kir.

Ji vir jî mîna karên din bi lez veqetiyam. A rast di serî de xwendekarên min lomê min kirin lê paşê hedî hêdî hînî min bûn, bide aliyekî, ji min hez kirin. Di navberan de jî li ba min bûn, diketin milê min û bi min re diaxivîn. Ji ber ku pirî dema min bi destbelaşiyê beguneh bi wan re derbas dibû, ez jî zêde nedifikirîm û nediketim nav tevgerên nelêhatî. Lê carê, keçeke çavşîn a ku 'libîdo'ya xwe cara ewilîn hîs dikir, bi gotegotên durrî û dirêj qala tiştên vala kir û paşê li xwe mikur hat ku ji xortekî fêrgeha li kêleka hez dikir. Wisa şîrîn bû, kela dilê min tije bû. Min dest pê kir qala evînê, qîmetdanê, hezkirinê kir. Hema rasterast. Mamosteyê nobedar bi awirên

xayin li me dinihêrî. Piştî demekê, wisa bû ku ez di bin awirên mamosteyên din ên watedar de diketim dersan. Du roj şûnde gerînendeyê dibistanê gazî min kir. Ez bi îdîaya 'destekdana hezkirinê' darizandim û sûcdar dîtîm.

Aha hatina min a cem doktor piştî vê bûyerê qewimî. Bavê min dîsa qala qenciya min kir, dayika min bêdeng bû.

Vê carê min ew keçika berçavk gevez bi çarçoveyên reş dît. Porê xwe kurt qusandibû. Doktor jî xuyanga xwe guheribû lê ya herî girîng tevgerên wî li hemberî min hişk û sar bûbûn. Dibe ku doktor agahiyan derbarê min de bi keçikê re parve kiribû, keçik jî sar û bi pîvan bû.

Min digot qey dê cilên dînan li min bikin, milên dirêj li bedena min bialînin û min girê bidin, lê nebû. Du mirov hatin bi awayekî nazîk ketin milê min û ez ber bi erebeyê ve birim. Wekî din hûn dizanin, a niha jî ez li vir im.

Dema ez qala van serpehatiyên xwe dikim, keçika asîstana wisa dikeve bin bandora gotinên min, heger hinekî dîsa dramatîze bikim, gunehê xwe bikim, dê bêje qey xeletiyek çêbûye û yê dest bi lêpîrsîne bike. Wîha çiqas reben dixuye.

Demekê şûnde yekî rû rehman î kal dikeve hundir. Paşê çend xwendekar bi mêzerên spî... Asîstana li hemberî min rûniştî radibe pê. Kalê dibêje, "mêvanê me îro çawa ye?" Keçika reben hewl dide ku tiştê bibêje, lê kalê dikeve navberê, dibêje; "belê, lebe, pir tevlihev dixuye lê yê vereşe". Dike ku derkeve, vedigere; "eleqeyên mantiqî yên xurt datine, ne?" dipirse. Asîstana me bi dengêkî nizim, ku bi zorê tê bihîstin dibêje; "belê". Derdikeve, piştî jî xwendekarên vî nêriyî.

Ev çend roj in di navbera min û asîstanê de peymanekê nenivîsî heye. Dema karê xwe diqedîne, ez pîrsekê jê dikim ew jî bi nazîkî bersivê dide min. Dîsa dipîrsim; "li der hewa çawa ye?" Hinekî disekine, difikire, paşê bi dengêkî bihîstiyar dibêje; "tu were ku şer derkeve."

Wê çaxê divê ez teqawîtbûna wî xinzîrê qert hêvî bikim, an jî mirina wî. Bila ev keçika nazîk derbasî meqamî wî bibe. Dibe ku heya wê demê şer û pevçûn jî bi dawî bibin.

Stenbol-2001

Tûzik

Omer KURT

Vê şevqê min serê xwe ji xweliyê derxist.
 Rohnahiya rojê xwe li çemika hestûyê min xist.
 Vê şewqa tava germ, ji min re baş bû lê ne bi dilê min bû.
 Ez pê pir aciz dibûm.
 Direvim.
 Min serê xwe yek carek xwar kir ku ez birevim.
 Serê min êdî nediket binê erdê.
 Ez heyirî mam.
 Min dixwest ku ez birevim, ez herim.
 Min xwe ji jorê de kaş kir, bi çepê de tehm da, bi rastê de şidand.
 Lê nikaribûm derkevim derve.
 Min digot qey yekî/ê bi çîmên min girtiye.
 Min ji xwe re digot ez nikarim li vir bimînîm.
 Ez naxwazim li vir bim.
 Ez ê ji erdê derêm û baz bidim.
 Bi bayê re kêfa xwe biweşînim.
 Nedibû.
 Lê ev neheqîbû.
 Min didît ku hemû kesan baz didan û dileyîstin.
 Lê min çima nikaribû ji xweliyê derkevim.
 Min li dora xwe mêze kir giran giran.
 Li derve gelek kesên xerîb.
 Min li cem xwe, ji nişka ve ecêbek tiştên serê wan kesk dîtin.
 Xwe nîşan dan û derketin ji erdê ew jî.
 Ew jî wek min bûn!
 Serê xwe yê kesk ji xweliyê derxistin derve hêdî hêdî.
 Ê ku derdiket matmayî li min dinihêrt, şaş dibû, heyirî dima û dikeniya.
 Min nizanibû ew kes bi min dikeniyên an bi xwe?
 Hînkirina vî tiştî zehmet bû.
 Ez di derdê derkatina ji erdê de bûm.
 Lê ew kesên dora min qet ne xema wan bû.
 Ji xwe re dikeniyên.
 Lê ez dizanim ku em bibin yek em ê karibin ji vir derkevin.
 Êdî ez ji rihê xwe acis bûbûm.
 Min gohê xwe dabû van kesan.
 Dengek hat min, ku navê min Tûzik e.
 Min navê xwe jî ji wan hîn kir.
 Çi navekî min ê xweş hebûye: Tûzik.
 Din nav van derd û belayan de serê min serê teşqeleyan bû.
 Min dev ji navê xwe jî berda bû.
 Nizanim ka Tûzik çî ye û çî nîne.
 Êdî qet ne xema min bû.
 Ji bo min a herî muhîm derketina min bu ku ez ji vir derêm û xelas bibim.
 Hema min dî ew wext kesek xerîb kişiya û hat ba min.
 Da min tişteke nermochaqî, tişteke şilek.
 Ez bi navê vî tiştî hesiyabûm.

Av bû.
 Êdî ew wext min zanibû ku ez birçî me.
 Ê ku avê da min û yê ku li dora min diçû û dihat,
 Ew mirov bû.
 Kêfa min jê re hatibû.
 Her çiqas jî kêfa min ji şekl û şemalê wî re nedihat jî.
 Ez ne hewce bûm.
 Bes bo ku wî zikê min têr dikir û avê dida min.
 Ez hatim jêkirin.
 Di germahiya havînê de, ez şefeqê hatim jêkirin.
 Min jê kir.
 Wî yê ku min wek bavekî je hezkiribû.
 Wî yê ez pê xapiyabûm.
 Ez ji hevalan dûr ketim.
 Ez ji mala xwe dûr xistim.
 Zalim bû mirov.
 Ez li hev ketim.
 Nizanim çi hat serê min.
 Ez nizanim ku ez rastî çi hatibûm.
 Pîsîtiya destê mirov qirêj qirêj êdî ketibû mêjiyê min.
 Qêrînî ji dilê min diçû.
 Min kirin kîsikeke reş ê gemarî.
 Bi deng û hewara min tu hevalê min nedihiya.
 Tu kesî/ê gohê xwe neda min.
 Hemû kes ji halê xwe kêfxweş bû.
 Henekên xwe bi min dikirin.
 Tim ji min re digotin
 ‘Yê mehdî wî tîrş’.
 ‘Yê serhişk ê bieks’.
 ‘Yê sermezî’.
 Lê min ti car ji wan re negot
 Ku ez ji derê tariyê ditirsim.
 Wan bi min qet nizanbû.
 Min nedigot.
 Min nedixwest ku ez li ber çavên wan biçûk bikevim.
 Min qenc kir ku min negot.
 Ez ê rezîl bibûma.
 Kesên li dora min.
 Ji hev re qenc bûbûn heval.
 Di nav hev de ji xwe re komên hevalan jî çêkiribûn.
 Min ti car nedikirin nav xwe.
 Ez li ber xwe diketim.
 Ez acis dibûm.
 Tirsên min zêde dibûn qat bi qat.
 Wan jî jêkirin.
 Ew qas tişt qewimîn.
 Di nav wî wextî de hemû hevalên min jî wek min rakirin ji erdê.
 Kirin kîsikê reş ê gemarî.
 Anîn ba min.
 Wexta ku me dikirin kîsik jî.
 Nazikbûn.
 Nedixwestin ku em biêşin.
 Hesabûn.
 Ew wext jî zû qediya.

Fêrbûn.
Mirov.

Êdî em di tariyê de mabûn.
Di tariya vê sermaya ziravqetî de.
Em bêçare mabûn.
Me nizanibû em êdî çî bikin.
Xedariya van hevalên min xwe li vir jî da nîşandan.
Min jî hevaltiya xwe heram kiribûn.
Kîsik sarbû û pir sar bû.
Em dicemidîn.
Hevalên min xwe li hev pêçandibûn.
Xwe germ dikirin.
Bi tenêbûm ez.
Kesî min tunebû.
Ez dicemidim.
Tu kesî/ê li min xwedîtî nedikir.
Hemû kesan min terikandibûn.
Ez û bextê xwe em bi serê xwe mabûn.
Ez bûbûm bextreş!
Tenêtiya min tirsên min zêde dikir.
Tenêti jî bi safikirina hesabê emrê min firsetekbû.
Êdî ez li bersivan digirim.
Di serê xwe de kesk bi kesk.
Çima jî min re dibêjin Tûzik?
Çima haya min jî emrê min tune ye?
Min dibin ku derê, çima ez nizanim?
Mirovê ku min dixwe ka ez pê re dijîm an na?
Ez bi tevahî tiştek çawan im?
Çima nizanim ez?
Bavê min kî ye û diya min kî ye?
Mervatiya min bi kê re çiqas heye?
Wek vana û gelek gelek pirsên din
Ez li bersivên xwe digirim.
Hevalên min ti car bi min re xeber nadin.
Ez bêçare mame!
Beriya ku ev mirov min bixwin
Hewce ye ku ez jî van pirsên xwe re bersivan peyde bikim.

Û TÛZIK HAT XWARIN!

Nîşe: Ev, adaptasyon e ji "Bîr brokolînîn oykusu" ku di kovara "Kul Oyku"yê de hatiye weşandin

Sanikê binî dêsî

Îsmail GUVEN

Cayêk beno, cayêk nêbeno. Yew kêna û dadîyê xo benê. Rojan ra yew roj kêna û hevalê xo binê yew dêsî de yenê pêser û xo rê puçan, lapikan virazenê. Mîyanê sohbetê înan de, înan ra yew tîzêke keno. Pêro zî vanê ke mi nêkerda. Peynî de biryar danê ke serê birayê xo de sond biwanê. Heme kê-nayî vanê: “Serê birayê min a mi nêkerda.” Labelê wexto dore yena kêna, a vana: “Serê golikî min o xaçin a, mi nêkerda.” Kênayê binî vanê: “Qey to serê birayanê xo ya sond nêwend.” Aye vana: “Birayê min çinî yê.” Cinîyêke bena, biney dûrî kênan de ronîşte ya û vengê kêna şino aye. Na cinî vana: “Senî birayê to çinî yê? Hewt birayê to estê û hê serê filan koyî de û filan koşke de ciwîyenê.”


Nê qiseyanê cinî ra pey kêna bi vazd şina keye. Hal û hewal dadîya xo ra vana. Vana: “Cayê birayanê min, min rê bivaje ez zî şina verê înan.” Dadîyê ci, ci rê pîcikan ra yew her virazena û ti ra vana: “No herî nişe, her to beno verê koşke. Her wext herê xo ra vaje deh. Kam wext ke ti rasaya verê berî koşke ew çax vaje hoş.” Kêna vana, tamam. Nişena herî û vana, deh. Hetanî ke rasena verê koşke vana, deh. Labelê hema tam bi verê berê koşke nîna, kêna lez kena û vana, hoş! Bi vatişê na qale her şîyeno we û kêna xo koşke ra zaf dûrî de vî-nena. Newe ra ageyrena keye û dadîya xo ra hal û hewal vana. Dadîyê ci, ci rê yewna herî virazena û ti ra vana: “No herî nişe, her to beno verê koşke. Her wext herê xo ra vaje deh. Kam wext ke ti rasaya verê berê koşke ew çax vaje hoş.” Kêna vana, tamam. Nişena herî û vana, deh. Hetanî ke rasena verê koşke vana, deh. Labelê hema tam bi verê berê koşke nîne, kêna lez kena û vana, hoş. Bi vatişê na qale her şîyeno we û kêna xo koşke ra zaf dûrî de vî-nena. Newe ra ageyrena keye û dadîya xo ra hal û hewal vana. Dadîyê ci, ci rê yewna herî virazena û ti ra vana: “No herî nişe, her to beno verê koşke. Her wext herê xo ra vaje deh. Kam wext ke ti rasaya verê berê koşke ew çax vaje hoş. Bizane ke no hero peyin o. Eke no her zî weşîyo êdî ez nêşkena yewna herî bivirazî.” Kêna vana, tamam. Nişena herî û vana, deh. Hetanî ke rasenê verê koşke vana, deh. Na rey kêna diqet kena û hetanêke nêrasenî verê berê koşke nêvana hoş. Wexto tam yenê le-veyê sikulfêrê berî vana, hoş. Bi na qalê kêna, her şîyeno we û kêna xo sikulfêrê berî de vînena.

Kêna şina zereyê koşke.ewniyena ke her ca tê-

mîyan de yo. Firaqî û kincî heme nişte yê. Kêna zereyê koşke weçînena, firaqan û kincan heme şî-wena, dormaleyî koşke riwena. Dima ra seba birayanê xo şamî kena hedre. Wexto gureyê xo qedînena, ewniyena ke êdî wextê ameyîşê birayan o. Lezûbez heme gureyê xo qedînena û şina verê estunê mîyanê eywane û estune rê vana: “Ey estune, ti abê û mi bigeyrê zereyê xo ke ez zereyê to de xo binimnî.” Senî ke vatişê xo qedînena, estune qilaşî-yena û kêna xo zereyî estune de nimnena. Tam a game, hewt birayî kêneke zî rasenê keye. Ewnîyenê ke her het weçînayeyo, kincî û firaqî şîwîyayê. Şame înan hedre ya. Cewabê no rewşî nêvînenê.

Mîyanê şewe, wexto hewt birayî zî rakewteyê, kêna estune ra vejîyena û şina qibe. Seba birayanê xo sipare kena hedre. Firaqê ke şand ra mendê şî-wena. Karê xo qedînena û yena verê estune û estune ra vana: “Ey estune, ti abê û mi bigeyrê zereyê xo ke ez zereyê to de xo binimnî.” Senî ke vatişê xo qedînena, estune qilaşîyena û kêna xo zereyê estune de nimnena. Birayî serê sibayî warzenê ke çi bivînenê. Rewşê şandî dibare bîyo. Tewê nêvanê, sipareyê xo wenê û kewenê teber.

No rewş hîrê roj dewam keno. Rojê hîrêyin birayo pîl, birayo ke çar çimê ey estê ra vano: “Çarçim, ti emşo bi di çimanê xo rakure û bi di çimanê xo zî aya vînde. De biewne, kam yeno keyeyê ma û mîyanê şewe karê ma keno.” Çarçim qeblul keno. Mîyanê şewe vînenê ke estune abena û kênayêka rindeke estune ra vejîyena. Kena şina qibe, firaqan şîwena, sipare hedre kena. Karê xo qedînena û yena verê estune û estune ra vana: “Ey estune, ti abê û mi bigeyrê zereyê xo ke ez zereyê to de xo binimnî.” Senî ke vatişê xo qedînena, estune qilaşî-yena. Kêna tam kewena zereyê estune, çarçim zît beno û çengleyê kêna tepîşneno. Birayî binî zî benê aya û kêna ra vanê: “Ti kam a, ti seba çi ma rê ardim kena?” Kêna vana: “Ez waya şima ya. Hetanî nika mi nêzanayêne birayê mi estê. Rojêk ez û hevalê min, ma binê dêsî de ronîşte bî. Mîyanê ma de yewî tîzêke kerde. Her kesî va, ez serê birayê xo ya sond wanena ke mi nêkerda, mi serê golikê xo yo xaçin de sond wend. Kênayan va, qey ti serê birayanê xo de sond nêwanena? Mi zî vat, birayî mi çinî yê. Oca de cinîyêka extiyare estbî. Aye vat, qey birayê to çinî yê. Hewt hep birayê to estê û serê filan koyî de, filan koşke de ciwîyenê. Ez şîya keye û mi



dadîya xo ra vat. Aye zî ez rêkerda verê şîma.” Qiseyanê kêna ra dima, birayî waya xo ra vanê: “Ma nêzanayêne waya ma esta. Dadîya ma, ma ra nêvat.”

Û êdî her roj, wexto birayî ke şiyêne sayd, kêna keye de karê keyeyî kerdêne. Nê rewşî wina dewam kerd. Rojêke birayê pîlî, waya xo ra vat: “Wayê ma ewro şînê bajar. Ti çi wazena vaje ma to rê biyare.” Kêna vat: “Mi rê tewê lazîm nîyo. Labelê şîma ke şînê sayd keye de ez tena ya, hewîya mi nîna. Ez wazena şîma min rê pisingêke bîyarê û ez pê hewîya xo bîyarî.” Birayî vanê, temam. Şande ageyrenê, çarçim waya xo rê pisingê gêno, birayo pîl ci rê yew fistane gêno û ey bînî zî waya xo rê çiyêk gênê. Êdî, wexto birayî şînê sayd, kêna bi pisingê xo kay kena.

Rojan ra rojêke, kêna ewnîyena ke pixêrî de adir çînî yo. Nat ewnîyena, wet ewnîyena adir nêvînena. Ganî hetanî şand, birayanê xo rê şamî hedre bikera. Vejîyena leweyî banî, ewnîyena ke dûrî ra, peyî hewt koyan ra du ho beno berz. Pisingê xo ra vana, pisingê mi ti tîya de vinde ez nika yena. Şîna, şîna, şîna. Peynî de rasena bano ke lojinê ci ra du vejîyeno. Şîna zerre ke çi bivîno. Dêwêka hewt sereyîne rakewta, her yew sereyê xo zî serê yew çaqeyê kêna-yêka rindeke de nawo ro. Kênayî vanê: “Heuş bike, vengê xo meveje. Eke dadîya ma aya bo û to bivîno, to wena. Lez tîya ra dur bikewe.” Kêna vana: “Adirê mi qedîya, ez ewnîyaya ke peyê hewt koyan de du esto û ez ameya tîya.” Kênayê dêwe vanê: “Şo pixêrî ra adir bigere. Eke dadîya ma aya bo kewena to dima. A to rê, na gace layî û no şaneyî û na qalibê sabunî bigere. Eke dadîya ma rasay to înan ra yewî xo dima bierze.” Kêna vateyê înan kena û lezabez kewena teber. Mîyan ra demêko kilm vêreno, dêwe bena hîşar. Kênayanê xo ra vana: “Boyê merdîman

ha yena mi. Qet merdimêk ame tîya?” Kênayî vanê, nê dayê kes tîya nêameyo. Ew çax dêwe ard de la vî-nena, ke gace ra abîyo. Layî tepîşnena û teqîp kena. Vejîyena teber û kêna vînena. Pêra kewena kêna dima, kêna erzîyena. yew koyî derbaz benê, dêwe rasana kêna. Kêna gacê destê xo erzena. Her het beno la û lingî dêwe mîyanê layî de manenê. Kêna newe ra kewena dûrî. Hetanî ke dêwe layî ra qedîyena, kêna gelek kewena dûr. Dêwe ancîya pêra kewena dima. Wexto tam rasena kêna, kêna sabunê destê xo erzena. Her het bena sabun û dêwe rehşikena, ginena aro. Hetanî ke dêwe sabunî ra xelîşiyena, kêna gelek kewena dûrî. Newe ra pêra kewena kêna dima û wexto tam rasena kêna, kêna şaneyê destê xo erzena. Her het bena teleyîn û şîno linganê dêwe wa. Hetanî ke dêwe şaneyî ra qedîyena êdî kêna rasena koşkê xo. Pisînga xo gena û vazdena zere. Dêwe yena verê berê koşke û kêna ya vana, ber ake. Kêna anêkena. Dêwe vana: Ti ber kena a ber akere; nê ez fiş nane bera, ber şiknena, yena to wena. Û bi no qêde kêna tersnena, labelê kêna ancîya ber anêkena. Dêwe ewnîyena ke kêna ber anêkena, vana ez aye bixapînî. Kêna ra vana, engîştê xo ya qilunce* bîyare, ez gişane dekirî. Kêna pê yêqî kena û qulikê berî ra giştê xo vejena teber. Dêwe engîştê kêna.

kena fekî xo û sipena. Wina sipane ke rengê kêna şîno, bena sey yew merdeyî û xo ra şîna*. Dêwe vazdena û koşke ra kewena dûr.

Wexto kêna bena şîyar êdî wextê ageyrayîşê biraranê ci yo. Labelê tede hal nêmendo. Şande birayê ci yenê û aye o rewş de vînenê. Waya xo ra vanê: “Wayê se bîyo bi to wina, rengê to vurîyayo.” Kêna vana, tewê nêbîyo. Labelê birayê ci zaf cîrr* kenê, peynî de kêna vana: “Adirî mi qedîyabi, ez ewnîyaya ke peyê hewt koyan ra dûyêk bebo berz. Mi pisingê xo tîya de verday û ez şîya. Mi dî ke zere de dêwêka hewtserîye rakewte ya û her yew sereyê ci zî leweyê çaqeyê yew kênayê aye de yo. Kênayan min ra vat, vengê xo meveje. Eke dadîyê ma hîşar bo, to wena. Min zî vat, ez ameya seba adirî. Kênayan vat, şo pixêrî ra adir bigere û na gace, şane û sabun zî bigere. Eke dadîya ma hîşar bo kewena to dima. Tam ke rasayê to înan ra yewî xo dima bierze. Min adir û gace û şane û sabun girewtî û ez kewta teber. Ez gelek şîya, mi dî ke dêwe ha mi dima. Ez vazdaya, wexto tam rasayê min, min gace xo dima eşte. Her het bi la û lingê dêwe mîyanî layî de mendî. Ez ti ra kewta dûr newe ra. Ez gelek şîya û min dî ke dêwe newe ra ha bi vazd yena. Wexto tam rasay min, min sabun eşt. Her het bi sabun û dêwe rehsikey. Û ez gelek şîya, mi dî ke dêwe newe ra ha mi dima. Wexto tam rasey mi, mi şane eşt xo dima. Her het bi şane û ez newe ra kewta dûrî. Êdî

ez kewta nêzî koşke. Min pîşînga xo girewt û wexto tam ke dêwe rasayê min, min berê koşke qefelna. Aye teber de mend. Min ra vat ber ake. Min anêkerd. Bagê va, ti ber kena a ber ake, nê ez fiş nane ber a, ber şiknena, yena to wena. Ez tersaya; la mi ancîya ber anêkerd. Dima ra min ra vat, engîştê xo ya qilunce qulikê berî ra biveje teber, ez gîştane kena de. Min yeqî kerd û mi engîştê xo vet teber. Dêwe engîştê mi girewt xo fek û sipit. Hetanî ke reng min de mend, sipit. Dima ra ez xo ra şîya.” Birayê kêna vanê, ganî ma şî û dêwe bikişê. Siba dî-yeno, birayî kêneke ramenê serî dêwe. Dêwe kişenî û kênananî dêwe zî xo rê mare* kenê. Her yew bira yew kêna de zewcîyeno.

Labelê kênayê dêwe, kêna ra hes nêkenê. Xo mîyan de vanê, a bîya sebeb ke dadîyê ma merda. Rojêke kêna înan ra awe wazena. Ey zî lîrî marî kenê zereyê mesîne û mesîne danê kêna. Kêna wexto awe wena, lîrî marî zî şîno war. Û no lîrî marî kaşê kêneke de beno pîl, wextêk ra pey kaşê kêna masena. Kênayî dêwe yenê pêser û merdeyanê xo ra vanê, biewnêne waya şîma se kerdo, aye bikişêne. Birayî kêneke ver kenê*birayî qijî û ti ra vanê, siba aye bere serî koy û bikişê. Cigerî ci zî ma rê bî-yare ke ma bizane to kiştê. Rojo bîn birayo qij wayê xo ra vano, wayê bê ewro ez û ti ma şî sayd. Kêna vana, tamam. Û her di şînî sayd. Geyrenê û birayo qij vano, wayê ez qefeliyaya. Bê ma tîya de rakure. Birayo qij seke rakewto, çîmanê xo qefelneno, wexto vînenno ke wayê xo rakewta wazeno biwarzo. Vînenno ke perçeyê paçî xo binî wayê xo de mendo. Seba ke waye hîşar nêba, ew parçeyê paçî xo bi kerd a ti ra keno. Labelê wexto ewnîyeno wayê xo ra destî ci çek nêşînê ke wayê xo bikişo, nêşkeno xo rey de bero keye zî. Wayê xo weyra de ca verdeno û cîgerê yew xezale beno keye, mojneno birayanê xo.

Wexto kêna bena hîşar êdî taştare yo. Ewnîyena ke birayê xo çin o, tenya parçeyê paçê ci esto. Ew çax fam kena mesela û birayê xo yê qijî rê zewt dana, vana: “Wexto serê sibayî to solî kerd xo pay, tede teleyêk bibo û şoro gîştê to wa. Ti hekîman bigeyrê û Dêdê xo rê dare nêvînê. Dermanê derdê to, destanê min de bo.” Kêna geyrena, hêgayêk de rastî yew mêrikî yena. Mêrik ho hêga de xelet çînenno. Kêna mêrikî rê rewşê xo vana. Mêrik aye beno keye, varayêke sere birnenno, sole keno û heme dano kena werdiş. Û ti ra vano, desta* ti awe mewerê. Rojêke vêreno, kêna zaf bena teyşan. Rojê dîyîne, mêrik mîyanê eywan de kêna linganê ci ra aleqnenno û binê sereyê ci de zî testê awe nano ro. Mêrik awe çelqnenno. Kaşê kêna de mar zaf bîyo teyşan, wexto vengê awe şîno ci, demîş nêbeno û fekê kêna ra vejîyeno teber, xo erzeno zereyê testî. Mêrik weyra de marî kişeno. Mêrik kêna de mare birnenno, pîya ze-

wijîyenê. Di gedeyê înan benê. Wextêke ra pey nê gedeyî benî pîl. Yew beno des serre, ew bîn heşt serre beno. Dadîya înan, înan ra vana, wexto şîma teber de merdimêko lingpişte û hernişte dî, xebere bidêne min. Û no vateyê xo her wext înan ra vana.

Wexto kêna hewn ra bena aya û birayê xo nêvî-nena, birayê aye şîno keye. Cîgere xezale mojneno birayanê xo. Zaf kêfê kênananê dêwe yeno. Rojo bîn, serê sibayî wexto birayo qij solê xo keno xo pay, teleyêk şîno linga ci wa. Û sekeno zî nêşkeno bivejo. No tele roj ra roj beno gird. Zîl dano, qame erzeno. Birayo qij, welat de hekîm nêverdeno şîno verê înan. Labelê yew hekîm zî ci rê derman nêbeno. Xora wext derbaz beno û tele beno gird, beno sey yew dara qijkeke. Êdî birayo qij bin de nêşkeno şoro rayir ra, bi herî geyreno.

Rojan ra yew roj gedeyî kêneke bi vazd yenê verê dadîya xo û vanê, dayê teber de yew merdimî lingpişte û hernişte esto. Kêna derzîna xo gena, rîyê xo bi qent a nimnena û seke cinîyêka xerîb a şîna verê birayê xo. Û ti ra vana: “Bira ti verdenê ez zî bi-ewnî linga to ra.” Birayo qij vano: “Ti ça ra fam kena. Hekîman min rê dare nêdî.” Kêna vana: “To dî Homayî destî min to rê kerd şîfa.” Û senî ke derzîna xo verdena teleyî, tele gîştê ra gineno arr. Waye vana, bê ewro mêmânê ma bi. Bena keyeyê xo û weyra de vana birayê xo ra her çî vana: “Ez waya to ya. Kênayanê dêwe lîrî marî bi xape* da min werdiş û to zî ez serê koyan de ca verdaya. Min ew roj zewte day to rê û zewtê min qebl bî.” Birayo qij waya xo virard keno, şîno keye birayanê xo ra hal û hewal vano. Birayî warzenê, kênananê dêwe rê vanê, rasta zî mesela wîna ya. Kênayê dêwe vanê, ê ma yew xeta kerd ma ef bikêne. Labelê birayî kêneke, înan ef nêkenê û hewt heme kênananê dêwe zî kişenê.

Sêvê

Tahir URPER

Sêvê!

*Çûyina te; di nav dilê min de
Bêkesî afirand*

Ferhan

Di bin barana payîzê de rondikên çavên pîr û kalan, di nav heriyê de belav dibûn. Ji aliyê başûr ve zilma reş li ser xelkê hilweşiyabû. Gelê neserfirazbûyî li hemû sînorên ne sînor tevlihev bûbû. Nizanim çawa behs bikim, lê rêza merivan nêzikî çemekî dibû û Ferhan bi hawara wan ve diçû. Ji aliyekî ve jinikek diket erdê, ji aliyekî ve zarokeke pêxwas diqirîya, ji aliyekî jî zilamekî kal dihênijî.

Ferhan, diwestiya û bi qehrên xwe ve diket ser berekî. Berê xwe dida rêza mirovan. Dergevanên ku xwe xwediye vî welatî didîtin, nedihîştin ku penaber derbasî wî aliyê çemî bibin. Xirecira wan diçû û ha diçû. Wê çibike Ferhan? Li dîroka xwe bizivire; dê xwe di nav bêkesiya Sêvê de bimîne. Li dîroka welatê xwe bizivire; dê tivrên serhildanê yên faşîlbûyî bibîne. Wê çibike gelo?

Li nik merivên vî welatê hizir, bûye behreke bîbînî. Çiqas difikirî û çiqas xwe vir de wir de dida, dawîya dawî diket ser bextê Sêvê. Bext halekî ne xweş e, halekî bextreşî ye, halekî tenêti ye. Bi tenê di destên Ferhan de hêviya dimênê ku Sêvê bihatana mabû. Hêvî tişteki herî zor e, elem e û xwelîserîbûneke. Lê dîsa di dilê wî de, kamraniyek hebû û kute-kuta dilê wî bû.

Êdî baran di nav tariya şevê de dibariya. Malmîrata Çemê Hêzil nedihîşt ku mirov derbasî wî milî bibe. Leşkerên ku xwe xwediye vî welatî dihesibandin jî pira darîn ya li ser çem girtibûn.

Ferhan xwe li ber agir germ dikir. Dengê penaberan jî wî milî çem dihat û dihat... Lê çavên wî diket bédengiya dilê hêviyên şikestî de. Êdî bêhal û bêmecal dibû. Şeveke wisa dûr û dirêj tu carî wî hizir nekiribû. Tu carî heydedaneke merivên wisa nedîtibû.

Ferhan, xwe li ber agir dirêj dikir û xeweke giran diket ser can û cesedê wî.

Di sihara rojê de çavên xwe vedikir û li çemê Hêzilê dinêrî. Çem har bûbû û bayê bezê li xwe dida û dibezî. Pêlên xwe direqisand û dîlaneke ecêb dikir. Ji robara nesekînî re Ferhan tif û nifiran dikir û diket nav xirecira mihaciran. Bi alikarî bi hêstiyarî gavên

xwe di avêt.

Rêza mihaciran zêde dibû, girî û hawar jî û gazindên ji Xwedê re jî zêde dibûn. Rastî jinekekê dihat. Jinikê du zarokên xwe li bedena xwe şidandî bûn û dida girî. Zarokek biçûk bû û yê dinê jî li ber şîr bû. Hawara wê diçû û ha diçû. Porên wê yên zer xingal bû. Kemga wê bi ser porên wê de ketibû ser milê wê. Ferhan nêzikî jinikê bû û digot:

“Xweha min çi daxwaza te heye, ka ji min re bêje?”

Jinikê serê xwe li Ferhan rakir.

Qîrînek ji devê Ferhan diratbû.

“Sêvêêêê!”

Sêvê, bi giriyê xwe yê şewat bi dengê nizm got:

“Ferhann!”

Ferhan, zarokên di destê wê de hilgirt û got:

“Sêvê! Li pey min were?”

“Ferhan, ez pir tehnim, ji min re avê bîn e. Zarokên min jî birçî ne.”

Bi hev re gihîştin kêleka Çemê Hêzil. Berê xwe dan avê. Li wî milê çem leşker hebûn û pir jî girtî bû. Sêvê digot:

“Ferhan, ez tî me”

Çemê Hêzil şêlû bû. Ferhan li çem nêrî û paşeroja wî dihat eqlê wî û li Sêvê zivirî.

“Sêvê, ez jî, ji te pirr tehnim”

Gum guma çem dihat. Çiqas çem har dibû; evîn parçe dibû welat ber bi xewnan ve diçû. Xewnan ciwaniya Sêvê peyda nedikir. Ferhan, di dilê xwe de di agirê xwe de di rêwîtiyeke bêdem de bû êdî.

Çem şêlûbû û sînorekî kujer ava dikir.

Lawêsîna kevokan

Kurdjan SORÎ

“Ew kuşt in!
Hawar e! gundîno hawar e!
Ew kuşt in!
Delalê li ber dilê min, roniya çavê min, hiş û he-
damê min kuşt in!”

Dayika dilşewitî, welê diqêriya. Ji kezebê, ji dil û hinavan diqêriya. Ji rikê, ji kînê diqêriya. Diqêrî û digiriya. Qêr û girî... Piştî demekê, hêstirên çavên wê ziwa bûn û bi çavên sor weke meşka li dar, dikeli, dikeli û dikeliya. Pey re ewil bi nalenal, paşê bi zarezar, pişt re jî bi qêr û hawar, dest bi lorînê kir:

*“Haware gundîno!
Ez ê çi bikim? Çi bibêjim?
Ez ê şûna hêstiran
Ji çavên reş û belek
Xwîna sor dirêjim.
Ez ê li vê dinyaya bêbext de
Derd û kul û keserê xwe
Ji kê re bêjim?”*

*Kuro, lawo!
Di wan şevê reş û sar de
Min ê mehitika te hejandî,
Min ê bi şûrê bedena xwe, wek berxikê tu mijandî
Gelo van guran çi ji me xwestin?
Dil û kezeba min û te pijandî.*

*Kuro lawo!
Xwezî ez teyrek bûyam, teyrê bazî
Min ê şev û roj li kurdan bikira gazî
Min ê rim û mertal hilda, şûrê tazî
Min ê ewda we vekira,
Ji van zaliman re bigota:
Hûn çi ji me dixwazî?
.....”*

Lawêsîna dayikê didomand û hinavê wê diqicqî- çîn. Lê ew, ne bi tenê bû. Bi sedan jin digiriyan û dilorandin. Dapîr, dê, xwîşk, jînheval, destgirtî, metik, xalet, dotmam, jinmam û jinjal diqêriyan û dilorandin. Qêr û hawar û zûrbelên, li çiya û geliyan ketibû û olan dida. Lawo.. lawo.. lawo...

Sih û çar cenaze li erdê bûn, sih û çar tabût. Sih û çar law, sih û çar mirov, sih û çar beden, sih û çar can. Sê sed û sih û sê kul, sê hezar û sê sed keser. Sih

milyon jan, sih milyon nifirîn! Sih milyon pêlox, di nav sih milyon dil de! Axîn, nalîn, lawêsîn, kul û keser...

Dayîka Sosin, weke pelçimê li ber bayê ketî dihejine û dinale. Di nava cîhana di hindurê xwe de winda bûye. A niha, cohtek beran dan axa sar! Ji bo wan, gelo çend şevan mabû bê xew? Di wan şevên zivistanê yên sar û reş û tarî de, çend şeva dergûşa wan hejandibû? Şevê çend caran rabûbû ser mehtika wan? Ji bo ew necemidin, nexweş nekevin, gelo çend caran ew cemidîbû û nexweş ketibû? Ji bo ew nemînin birçî, wan rojên tengî û tirsî de gelo çend şevan birçî razabû? Hêca di zikê wê de, her dem ditirsiya û ji xwe re digota: “Heke tişteke bi wî were, ez ê bimirim.” Ji beriya du salan rojekê, yê mezin nexweş ketibû û pey re yê dinê. Du rojan heta sibehê li ber serê wan sekinîbû û bi şev heta sibehê li ser wan giriya bû. Paşê hêdî hêdî çavên xwe bel kiribûn, baş bûbûn. Hingê, heçko herdu jî nûka xwedê dabîn wê, welê keyfxweş bûbû. Û îro? Ew çûn! Ew winda bûn! Ew tune bûn. Di nav vî agirî de, di nav vê pêta şewt de vaye sê şeve xew neketî çavên dayîka Sosin. Va ye sê şev û sê rojin bi tenê dilorîne û digirî. Hayê wê ji dinyayê tineye. Ewqas mirov tîne diçin, ewqas qelebalix û deng lê ew ti dangan sehnake, ti tiştî û ti kesî nabîne. Bi tenê hundurê xwe de dikele û difûre. Carna jî bi herdu kurên xwe re diaxive. Tiştên li ber çavên wê re diborin, kîjan rast e û kîjan xeyal e nedi-yare. Her tişt têkilhev bûye.

Zivistan e. Dayika Sosin cemidiye û nexweş e. Azad, dibêje:

“Dadê, ka ez te muayene bikim.”

“Kurê min, tu yê min çi muayene bikî? Wextê min hatiye. Êdî ez ê bimirim!”

“Na dadê, mirina çi? Ka piştî xwe veke.”

Azad, siteteskopê dide ber guhê xwe û bi xurtî dêya xwe muayene dike. Dibêje:

“Dadê, qet netirse! Tişteke te tine. Tenê tu piçekî cemidiyî. Ewqas.”

Ji çeltikê xwe hinek derman derdixe, iskanek av tîne û dide diya xwe. Dibêje:

“Tu sê çar rojan van dermanan bixwî, tişteki te namîne. Vêca heke tu destûra min bidî, çend nexweş li hêviya min in. Ez ê herim li wan binêrim û werim. Tu bêhna xwe veke heta ez bêm.”

“Here kurê min, oxira te ya xêrê be. Xwedê kir ku

tu bûyî nojdar. Her roj tu li ewqas mirovan vedinêrî û wan derman dikî, Xwedê ji te re çêke. Ew jî her tim ji te re dia dikin.”

Azad, çeltikê xwe yê hekîmiyê digire destê xwe û derdikeve. Diya wî Sosin, wê nexweşiyê ve radibe ser xwe. Ji xwe re dibêje: “Ez ê rabim ji hekîmê xwe re xwarineke xweş çêkim. Ez ê ji delalê dilê xwe re kurtikan çêkim.” Derî vedibe û Paraz dide ji dêrî ve. Dayika Sosin ji keyfan nexweşiya xwe ji bîr dike:

“Kurê min tu bi xêr hatî. Ser çavê diya xwe hatî.”

“Dadê mizgîniya min li te.”

“Bexê min! Te zanîngeh qedand?”

“Min qedand dayê. Min destûrnameya xwe ya parêzeriyê jî stand.”

“Pîroz be bexê min. Lê xwezî tu jî weke kekê xwe bûbûyayî nojdar. Her roj bi sedan kes dua jê re dikin.”

—Dayê bi qeweta Xwedê, yê ji min re jî bikin. Pê-diviya gelê me ji nojdarên jî pêtir bi parêzeran heye. Evqas kuştin, evqas girtin û evqas neheqî heyî ma bê parêzer çêdibe? Ji bo dadmendî pêk were ji me re parêzer lazim in.”

“Bila bexê min. Pîroz be.”

Xumxum û xuşxuşa balefirên şer, guhan ker dikin. Pey re terqênîyek tê, çiyayan dihejîne. Teqînek din, yeke din. Li pey hev çîzên û xumxuma balefiran û teqîna bombeyan niv saetê didome lê ew niv saet ji wan re weke salekê dirêj tê hîskirin. Ji ber birqa deng, xanî dihejîne, şingêşinga camên pence-reyane. Ji kujûrkan ax dikeve ser mehfûr û berik û ser û piştê wan. Herdukan hundurê malê de li ber diwêr xwe devikî dirêjkirî ye. Piştî deng kêmbûn, radibin ser xwe. Pê li ser darîstana pesarê pêşberî gund ketî ye. Û dû. Dûyek reş û şîn hildikişê ezmên. Sosin dibêje:

“Azad! Azadê min!”

“Dadê ne tirse, tiştê tine. Yê Azad jî niha were.”

Refek kevok bi ber pencerê re difire. Dudo ji wan, di pencereya vekirî re tene mal. Rengê wan spî weke berfê ye. Belkî ji berfê jî spîtîr. Dayîka Sosin bêhemdî xwe ber bi cem wan ve diçe. Herdu li ser girika milên wê datînin. Yek li ser milê rastê, yê din li ser milê çepê. Dayîka Sosin, li Parêz dizivire:

“Ka binêre kurê min, çiqas delal in?”

Lê Parêz naxweye. “Ji xwe re dibêje ev bi ku ve çû?” kevokê li ser milê çepê diaxive:

“Dadê, tu li min digirî? Vaye ez li vir im.”

Pey re yê din:

“Em herdu ji li cem tene dadê.”

Dayika Sosin dîsa li kevokan dinêre. Dibîne ku wa herdu kurê wê ne. Herdu çengên xwe vedike, ku wan hembêz bike lê dîsa kevok pir didin û di pencereyê re difirin. Herdu destên ji bo hembêzkirinê vebûyî li singa wê dikevin. Destê wê dimîne bi dilê wê ve.

Deng, tene guhê Sosinê:

“Ay dadê! Ax birawo!”

“Ay bêmirado! Yê çûbûya fakûlteya tibê, bibûya nojdar. Yê birînên me bikewandan...”

“Yê bibûya parêzer, gelê xwe biparasta...”

“Ma ne bese?!”

“Çavê xwe bel dike!”

“Hişyar bû, hişyar bû!”

Dayîka Sosin, li dora xwe dinêre. Herdu keçên wê û çend kesên dinê yên xizmên wê û cîranê wê li dorê kom bûne. Hêca jî nizane çi bûye, çi qewimî ye. Dibêje:

“Keça min, ka avekê bide min. Kezeba min şewitî!”

Binefs, avê jê re tîne. Piştî avê vedixwe, dipirse:

“Çi ji min hat? Çi qewimî ye? Ev qelebalixa ji derve tê, çi ye?”

Şûna bersivê, ji çavên hemûyan rindik gêrî dibin û pey re dîsa qêr, hawar û girî. Dayîka Sosin, nûka hişyar dibe. Kevokên spî tene ber çavên wê. Rastiya reş, ji nû ve çavên wê tarî dike. Ne Azad bûye nojdar û ne jî Parêz bûye parêzer. Herdu jî bûn kevok û firîn, çûn. Hêca zarok, hêca simbêlê wan xwêdan nedayî. Bûn du kevokên spî û tevî refê xwe bûn û çûn. Sih û çar kevok bi hev re, sih û çar kevokên spî... Dîsa agir tavê hinavê dayîka Sosin, gewriya wê ziwa dibe, zimanê wê dîresise, lêvên wê direcifin û qûdûmên wê dişikîn. Weke qurmê dareke hişk, li ser cihikê xwe dimîne sekinî. Piştî demekî du dilop hêstir ji çavên wê diherikin. Lêv dilepitin û dilorîne. Ewil hêdî hêdî û bi nalenal, paşê bi qêr û girî:

*“Xwedayê mezin du kevok ji min re şand in
Van zaliman çeng û perê wan şand in
Xwudê xerabike mala Romê û va xayînan
Dil û cerg û hinavê me pijandin.*

*Haware gundîno! Hûnê lezkin, bilezîn in
Rabin, pêşeng û rêberê Kurdan bicivîn in
Firaxalîs û parsekan ji nav xwe derîn in
Da ewda Azad û Parêzê min hilînin
Wey lê lê, wey lê. Ez rebenê we me.
.....”*

Heke rojekî rêya hewe bikeve herema Bohtan dora gundê Roboskêyê, çavên xwe bigrin guhê xwe bel bikin. Teqez, dê dengê qêr û lawêsinên Dayîka Sosin were guhê we.

Girêşîra

Rêbendana 2012'an

Ez Cizîr im, dayîk im

Bahadîn ROBAR

Navê min jin û jiyan bû/ navê min ax bû, dayik bû/ wateya min av û çandinî bû/ navê min Înanna bû, Zîn bû/ ez gund, bajar û şaristaniya yekem bûm/ ez Mezopotamya, Mîtanî û Med bûm/ ez dergûşa şaristaniyê me, dayik im Cizîr im.

Ji berî deh hezar salan min, mirovahî, jin û jiiyan di malzaroka xwe de xwedî kirin. Hê ez ezeb, derdor ezeb û heft tebeqeyên erd û asîmanan ezeb bûn. Min her tişt (giyanewer û têkber) di zikê xwe û di hembêza xwe de mezin kirin û parast. Ji ber ku ez dayik bûm min jîn da wê û meş, xwarin û nêçîrvanî û sinc nîşanî wê da. Min bi keda xwe ya bi hezar salan hûn hînî axaftin û parastinê kirin. Min hûn hînî çêkirina cer û şerbik û alavan kirin. Min ji vê sînga (bedena) xwe şîr û şerbet bi ser we ve kir û hûn mijandin. Min cotkirin û hilkirin çand û komkirin hilanîn û hilberîn hînî we kir. Ez bi tenê bûm. Ne Grek û Roma ne Efrîka û Hindistan ne jî Ewropa û Emerîka hebûn. Ji ber ku ez dayik im û hûn ên din (şaristaniyên hemû deman û hemû aliyên cîhanê) zarokên min in. Ez Mezopotamya, Mezra Botan û Cizîra Botan im. Ez dergûşa yekemîn û keştiya Hz. Nuh im. Ji bo avakirina gund û bajar û şaristaniyan min cî û rê da mirovahiyê, baweriyê totem û mîtoloji û avakirina civakê cara yekemîn li ser sînga xwe ya destlêneketî afirandin. Min hema deşt û çiya çem û robarên xwe ji we re kirin qadên jiyanê. Ji ber ku ez dayik im, ax im û jin û jîn im. Ji hemû hêlan ve heta bêdawayî min daristanên xwe berû û mazî, bax û bostan û dar û fêkî hemû pêşkêşî we kir. Min xezal û piling û pez-kûvî, şêrên çiyar li hev civandin û li çiya û çemên xwe çêrandin. Min jin û jîn pîroz kirin ligel xwe. Li rex min şer û ceng, xwîn û mirin, zilm û zordarî nîn e. Min mijokdarî qet nasnekiriye û dijarî qet qebûl nekiriye. Min zarokên xwe tu caran nekirin bin yek qalibê qanûnên netew-dewlet, di tofanê de ez ne xeniqîm û min serê xwe hilda û li ser çiyayê Cûdî li kepiyê “Sefineyê” rawestiyam, dîsa bûm giyan û jiyan pîroz. Ez dayik im û min tu caran koletî li ser xwe û zarokên xwe rewa nedîtiye. Qebûl-nekiriye. Min sinc, civakbûnî, berxwedanî û mirovahî hînî tevahiya cîhan û gerdûnê kiriye. Ez Kardû-Bakarta, Bazîbda (navên Cizîrê ên kevin) û El-Cezîre me. Mezra Botan û Mezopotamya me. Min jiyan hînî mirovahiyê kir. Ji Hindistanê heta Îngilistanê ji Afrîka heta Amerîka ez bûm pira ci-

vakbûnê, ez bûm çand, ez bûm ziman û belav bûm. Ligel her qenciyeke min a li vê Cîhanê, lê we nexwest hûn min bibîrbînîn û min nas bikin. We ez herdem kuştîm û mijîm. Ew qadên jiyanê yên ku min ji bo jiyanê ji we re vekiribûn we tim tevqîrîrin. Tunekirina zarokên min li min dan temaşekirîn. We her mirovahî û xweza sotin, mirov bi zincîran êşkence kirin. We civak ji hev veqetandin û hinek kirin serdest û hinek jî koledar. We dayika pîroz avêt ber piyên mîrên xerab û weke milk û mal lê nihêrî. We li ser sînga min evîn, jin û jîn lewî-tand. Ez Selma bûm û min nîşanî (Melayê Cizîrî) ji dîl talan kir. Ez Çemê Dicle me, min Feqî kelimand, ez bû Xanî min eşq û evîn ji nû ve cebirand. Min mîr, beg paşa û xwedavend mijandin. Min ji bo we evîn bêmîrin kir. Mem û Zîn navê evîna min bû. Ji ber ku evîn watedar bibe min Beko afirand, min li ser sînga xwe dîrokek zêrîn nivîsand û raberî we kir. Min klan û qebîle şaman û rahîb, kral û xwedavend, pêxember û împeretor, serok û rêber, li gorî dem û dewranê ji we re ol û netewe, bîrdozî û netewe hizir û raman afirand. Min mîtoloji, çîrok, nivîs û ziman, çand û huner, di hembêza xwe hînî we kir. Min tim û tim rê nîşanî we da û ji bo we qencî, başî, sinca civakî da pêş. Ez bûm baran, ax û roj, min demsal guhertin û bûm hilberîn. Ez dayik im, lê we ez êxsîr (dîl) kirime û ji çar hêlan ve êrîşî bedena min a betilî dîkin. Bi zayîna min çemê dicleyê çêbû û jiyanê dide we. Min berxwedan û serhildan, azadî û pîrozî hînî we kir û min lal bi ziman kirin. Ez bûm Arî û Medî, ez bûm Îbranî û Sumerî, ez bûm Kurdî, Tirkî, Suryanî û Farişî û di navbera we de ez bûm têkilî û aşî. Lê îro hûn her roj zarokên min li ser sînga min dikujin û qet dayikbûna min bi bîra xwe naynin. Min gotibû dayik pîroz e, lê hûn min fêm nakin. Ez jî dayik im. Jîn im û jin im, dilê min dişewite. Çiyayên min dişewitin. Ey zarokên nankor! Ma we zîndan ji bo çî çêkirin? Qey min qet tiştêkî wisa çêkiribû? We qet bihîstîye ku min keç û kurên xwe, Mizgîn û Dîlanên xwe Nazdar û Bêrîvanên xwe, dildar û robarên xwe zincîr kirin û avêtin zîndanên dojahî. Ma hûn nizanin ez Kawa bûm û min Dehaq pelixand, ez Mûsa bûm, min Firawûn şewitand, ez navê kurd bûm min Sedam daliqand. Qey hûn nizanin min pêta agirê Newrozê ji bedena Ehrîman afirand. Ez azadî me li Amedê, li Mêrdînê, li Çewligê û li Cizîrê dîl namînim. Ez



giyan im, exlaq im û zîhnîyet im ji bo mirovahiyê. Ez jêderka hemû heyber û ruhberan im. Ez Dîcle me, û Birca Belek her gavê silav dikim. Xemgîn û melûl dibim. Şahidê dijwarî û zilma li ser kelehên mirovahiyê me. Dibim hêsirên çavan û ber bi Mezo-potamyaya Jêrîn ve biçim. Rezê mîran bi hesreta Mem û Zînê min hişk û ziwa bûn û Birca Belek her roj parçeyekî ji bedena xwe winda dike. Ev wesîyet û emanetên min ê ku min radestî we kiribûn. Lê we bê pîrs û bê pîrsiyar emanetên min û zarokên min qetilkirin û avêtin bîran. Bi min re cegera dayikê evîna dayikê û germahiya dayikê heye, ma min hûn wisa perwerde kiribûn? Ma dayik tê şewitandin? Lê we her roj ez şewitandim, çiya û zozanên min qedexekirin, we jiyana min a xwezayî komik û koçerên min belavkirin. We îxanet li min kir. Ma mirov îxanetê li dayikan dike? We ez anîm asta îsyane û ev jî îsyana min e. We îxanet û dayik-ax-xwedawend-dayik-çand-dayiksalarî û dayik hilberînê kir. Hewar dikim û dibêjim, min şer û ceng, xwîn û zilm navêt, ez dixwazim li Kaniya Qesaran Newrozê li kêleka Çemê Dîcleyê daweta Estelê, li kêleka Cizîrê evîna Zînê pîroz bikim. Ez qewalê Êzîdî bi Laleşê, ez hehamê Cihû bi Kenîşeyê, papazê Îsevî bi Dêrê, melayê Îslam bi Mizgeftê, rahîbê Sumerî bi Zîgû-ratê, Bûdîst bi Magbetê û pîrê Elewî bi “Mala Cem”ê dixwazim. Ji ber ku ez dayika hemûyan im. Min kurd, tirk, ereb, ecem, laz, asûrî, sûryanî, rûs û

hînduyî anîne ser rûyê cîhanê. Bi min re dilê dayikê heye. Dema hûn hev dikuvin kezeba min dişewite, her roj ez tîm şewitandin. Kî dizane niha dayikên vê xakê û dayikên girtiyên ramanê, dîlên azadiyê û dayikên bîyolojîk yê vî erdnîgariyê çî qas dişewitin. Çem û robarên min her çar demsalan xwîn diherikin. Ez îsyane dikim û dibêjim; destên xwe vekêşin ji ser bedena min a ku hûn mijandî û gi-handî, bila robarên dilê min azad û bêxwîn biherikin. Bihêlin bila pêl li ser pêlan bikeve û melodî û lorînên azadiyê gêlgêl bikin. Rê bidin da ku robarên dinê xwe zûka bigihînin çemê Dîcleyê û biherike Mezopotamyaya Jêrîn. Hewar hewara min bibihîzin, hûn bi qedrê Îsa û Mihemed kin. Nekevin xwîna hev, min her gav û her dem nesojin. Ez dayik im, ax im, li cem min tîra we hemûyan evîn heye, havîn û payîz, zivistan û biharên min hene. Min evîn di Mem û Zînê de, hezkirin di evîna Melayê Cizîrî de, di Selm(w)ayê de pêşberî we kiriye. Ez Karda-Bakarda, Karzu-Bakardabazîbda û jî dîrokê ve Cizîr im. Silavan dişînim ji Mem û Zîn, Xanî û Melayên hemdem re. Ya min ne eşqa text û pere, hêz û desthilatdarî ye. Ya min make-evîn e. Ji ber ku ez dayik im ez jin im, jîn im, vejîn im û mirovahî me.

Ez Cizîr im Cizîr...

Gola Xezalan

A. Selam BARAN

Gola Xezalan li ser pişta gund di binê berwara du giran de bi qasî sê sed gavî fireh bû. Ji ser giran kortaleke weke tasakê xuya dikir. Dema berf û baran dibariya, ji ser giran av tev diherikî binê wê û di wê kortalê de kom dibû. Lê hingî kortika golê biçûk û teng bû pirî caran av û lîlav xwe nedigirt û ji ser kortikê diavêt. Ji ber vê jî derdora golê tev di nava herî û çiravê de dima. Tenê ava nîveka wê zelal û paqij dima. Dema havînê jî av ji ser kêmbû, vê carê jî ji german çirav û litava dora wê tev ziwa dibû û axa wê tev diqelişî, qeliştokî dima. Îcar bêhnêk nexweş û giran bi derdora wê diket û ji mêş û kelmêşan mirov nikarîbû serê xwe rakira... Di wan rojên germ de gundiyan pez û dewarên xwe dibirin ser golê av didan. Ji çiyê jî ajalên kovî dihatin ser av vedixwarin. Lê ew jî bi hezar zehmetî...

Rojekê bi ber biharê ve xezalek û karika xwe hatin ser golê. Karika wê hîna çend hefte bû ku çavên xwe vekiribû. Ji kêfan û nasîna derdora xwe lotik diavêtin û xwe ji ser kevirekî dipengizand ser kevirekî din. Bi vê coşê hatin heta ser golê. Diya xezalê li ser heriya hişk dimeşîya bi zimanê xwe jê re digot: "li du şopa min were, xwe nede ciyekî din." Dema xwe gihand ber qiraxa avê hingî tî bûbû gotinên diya xwe ji bîr kiribû. Çawa jî ser şopa diya xwe derket berî ku xwe bigihîne avê heta pişta xwe din ava litava herî û çiravê de çû. Tenê stûyê wê yê ziravok û serê wê li derve mabû. Dayika wê hat ber, lê ew jî heta ber zikê xwe bi heriyê de çû. Bi zimanê xwe ser û çavên karika xwe alast, lê dikir nedikir nedikarî karika xwe ji nav çiravê derxîne.

Ew jî bextê xezalê bû. Wê kêliyê Mihoyê Sermezin, ji ser zêviya xwe ber bi golê ve dihat. Dema guhên wî bi virçe virça heriyê bel bûn û çavên wî bi xezalan ketin, hema berê xwe da wan. Dema makexezalê Mihoyê Sermezin dît, bi taqeta xwe ya dawîn hewl da xwe ku karika xwe ji nav lepê heriyê xelas bike. Her ku serê xwe li bin teriya karikê dida, ew jî hîna bêtir din av çiravê de diçû.

Miho, yekî wekî rewtekî dirêj û weke gayekî qelew bû. Dest û piyên wî stûr û gelekî xurt û dagirtî bûn. Zikê wî weke meşkekê timî werimî bû. Hingî serê wî mezin bû, gundiya jê re digotin, "Mihoyê Sermezin". Ji kişandina cixareyê diranên

wî tev zengirtîbûn û her du tiliyên destên stûr, mîna ku hatibin hinekirin ji dûmana cixarê zer bûbûn. Wexta devê xwe vedikir diranên wî wekî hesinê zengarî xuyanî dikirin.

A rast jî ber xisletên wî gundiyan zêde jê hez nedikir. Yekî cirnexweş û şerûd bû. Herkesî hifza xwe jê dikir. Hingî wisa çikûs û bêrehmbû, gunehên xwe bi deyn nedida kesekî. Ango mîza wî derman bûya bi tiliya tu kesî ve mîz nedikir. Jê bihata nalên kerên mirî jî wê ji lingên wan derxistana.

Miho, çavên xwe li xezalan reşkir. Ji kêfa kef bi ser devê wî ket. Lez kir ku her du xezalan bi hev re zeft bike. Sola xwe ji lingê xwe derxist, devdelingê pantorê xwe heta ser çogan li hev pêça û zend û bendê xwe li hev bada û berê xwe da xezalan. Makexezalê bêçare karika xwe berda û hinek jê dûr ket. Dema makexezal ji nav heriyê derket û ji destê wî filitî, kêfa Sermezin li ser lêvên wî cemidî. Mehdê wî tirş bû û di ber xwe de mirmirand. Xezalê bi çavên xwe yî xemgîn û melûl, kalîn û nalîna wê bû. Mîna ku lava dikir da ku tiştêkî bi karika wê neke. Xwe bi vir û wir de dibir û dianî. Serê xwe dihejand û lavayî ji Miho dikir. Lê ka ew dilrehmiya ki ji zimanê xezala reben fehmi bike! Bi wê hêrsa ku makexezal ji dest revandiye, wekî gurekî ku xwe bavêje ser pez, xwe gihande karikê û stûyê wê yê ziravok girt û ji çiravê derxist. Karika reben, ji tirsê dilê wê wek defa hawarê dikir tepe tep. Sînga wê ya biçûk radibû û dadiket. Kalîn û nalîna wê dilê mirovan dişewitand.

Miho karik anî ber qiraxa golê û kêr danî ser qirikê! Çavên karikê fireh bûn, carek du carên din jî kalîn jê hat û xwînek sorî zelal li ser axa reş herikî. Di wê kêliyê de serî ji cendek avêt û hema li wir gurand. Ji kêfan çav li serî direqisîn û devê wî diçû ser hev. Mîna ku soworî li ser simbêlên wî bilîzin, di nav coş û eşqê de bû. Di ber xwe de digot: "Ji vî goştî xwarinek xweş çêdibe. Ez ê îşev kêfa gurenê pîr bikim." Geh digot "ez ê deynim ser girarê" û geh digot "na na, ya baş ez bikim şîş û kebab!"

Makexezal hîn bi kalekal bû. Çavên wê hîna li ser karika wê bû. Nerînên wê şil û tije lavabû. Lê êdî wê jî fêmbû kiribû. Hêdika dengê wê qut bû û çend dilopên girs ji çavên wê rijîyan. Wisa bi wî halî li cendekê karika xwe, ya di nav destên Miho de



qetqetî bibû temaşe dikir.

Wê sibehê Zîwer jî diçû ser zêviya xwe. Dema dengê kalînekê bihistî bala wî çû ber bi golê ve. Her ku nêzik bû, dîlzîziya deng, wî ber bi xwe ve dikişand. Ji dûr ve baş nedidît lê gava nêzik bibû ev qewimandin, tev dîtibûn. Çavên wî jî hev vebûbûn. Heta ku xwe gîhand ser golê, Miho karik qetqetî kiribû. Ew jî xemgîn û dilkeser bibû. Heyfa wî pir li karikê dihat. Pir jî xezalan hezdikir, lê tişt ji destên wî nedihat. Bi wê êşa ku agir bi dilê wî ketibû hat ber Miho û bi acizî jê re got:

“Apê Miho, ma ne guneh bû te ev karik ji maka wê veqetand û serjê kir? Ma goştê wê çi ye, nakeve ber diranên te!”

Miho bi awirên gefxwarî lê nihêrî û mîna ku wî bi tişteki hesab neke:

“Ji te re çi? Bi serê te ketiye ez ê çi bikim an nekim! De biqêşit kulekê heram! Ma ne tu jî ew sêwiyê ber dîwaran î!”

Zîwer, ciwanekî zeîf û zirav bû. Bi ser de jî lingek wî jî yê din kintir bû, ango lingek wî kulek bû. Heke hêz û qaweta wî têrê bikira di wir de wê têketa ser dilê Miho û têra wî lê bidaya. Lê Mihoyê Sermezin girs bû, wekî gayên çolî dagirtî û bi dest û lep bû. Lê cardin jî Zîwer, xwe jê neda paş û gotina xwe teksîr nekir:

“Ma ne eyb e, tu van gotina ji min re dibêjî. Gurzek simbêlên te heye. Ev gotin li te nayên.”

Bi vê gotinê Miho hîn bêtir bi hers bû û bû mîna

jehrê. Weke ku li mêşekê bimeyzîne hate ber Zîwer û şîmaqek weşand bin guhên wî. Ji ber ku ev tişt hêvî nekiribû likumî û çend gav bi paş ve çû. Zîwer, bi vê şîmaqê pir êşiya, lê ji xwe bêhtir bi halê xezalê diêşiya. Lewra diya wî jî dema ew pir biçûk bû wefat kiribû û bê dê mezin bûbû. Ji ber vê jî dilê wî pir li ser xezalê mabû. Li du Miho nihêrî û ehd da xwe ku vîna jê re nehêle. Çi dibe bila bibe wê rojekê heyfa xwe jê bistendaya.

Makexezal, bêçare li cendekê karika xwe ya di nav destê Miho de mabû temaşe dikir. Dema cendek hilda û çû, makexezal hate ser xwîna karika xwe, bêhnkir û bi dilkovanî û bi çavên şil berê xwe da çol û çiyê.

Zîwer, piştî vê bûyera ku hatibû serê wî û xezalê, pir li ber xwe ketibû. Êvaran her ku serê xwe datanî ew dîmenên xezalan dihat ber çavên wî. Îcar kul û keser li ser dilê wî rûdinişt. Ji ber vê jî sozek dabû xwe ku wê golê ji herî û çiravê xelas bike û veguherîne cihekî dilxweşiyê ku êdî tu xezal neyên êşandin. Ji wê rojê û bi şûnde bi ehd û hewldanek mezin her roj dihat ser golê û derdora wê sererast dikir. Di serî de çû ava ku ji jorê dihat ser golê qut kir. Berê wê bi cihok û kanalan da cihekî din. Dema ku av ji ser hate birîn dora golê hêdî hêdî hişk û ziwa bû. Heta wê rojê tu kesî bîr nebirişû ku vê golê sererast bike û ji çiravê rizgar bike.

Zîwer, dema li ser golê dişixulî herkesî qala wî dikir. Dema ku jê dipirsîn, “tu çima bi vê gelê wisa

mijûl dibî” digot “ji bo ku pezên me rihet werin avê vexwin û ji van mêt û çiravê em xelasbibin, ez çêdikim. Heta em pez tînin gund li me dibe dereng.” Pêşiyê bawer nekirin ku dê Zîwer çirava golê bimîçiqîne. Lê her didîtin ku bi xîret û dilsozî xwe didayê, di taliyê de wan jî baweriya xwe pê anîn. Pêşiyê zarokên gund hatin alîkariya wî. Zîwer, mîna fermanbarekî li ser serê wan disekîn û dê kê li ku/kê çi bikirinan ji wan re digot.

Nava wê hîn kurtir kirin û li qiraxên wê ferş û kevirên mezin danîn. Derdor bi darên spîndaran kirin şînahî. Bi gul û kulîlkan xemilandin. Paşê jî du sê cîhokên nû vedan. Û ava golê berdan ser. Êdî ne çirav mabû ne jî bêhna genî. Ji derdorê bêhna gul û sosinan difûriya. Gundî ji berê bêhtir dihatin ser golê û bêhna xwe vedidan û heywanên xwe bi rihetî li wir av didan.

Li gel vana, Zîwer şîmaqa Mihoyê Sermezin û êşa xezalê jî dilê xwe neavêtibû. Hîna hêrsa wê rojê di dilê wî de geş bû. Lê hayê kesî jî vê tune bû. Jixwe Miho piştî xwarina karikê ev bûyer jî bîra kiribû. Lê tahma goştê karikê jî bîr nekiribû. Ji ber vê jî her ku keys didît, bi hêviya xezaleke din dihat ser golê. Lê dema her ku dihat reng û dirûvê veguherandina golê didît, ji hêrs û kerba dibehecî û çavên wî tarî dibûn. Nifir li Zîwêr dikirin jê re xeber didan û digot: “Ne ev kuleke sêwî bûya belkî min ê çend xezalên din jî bi dest bixistana.” Loma qet tu carî nehişt zarokên wî tevî zarokên din biçin alîkariya wî.

Çi bi êş û çi bi eşt, zeman meşiya û wext û dewran çerxa xwe li hev diqeliband. Rojekê berdestê sibehekê jî nişkê ve qijînî bi nav gund ket. Hawar hawara gundiyan bû. Herî zêde jî Miho xwe diqehirand û xwe li erdê dixist. Zeviya wî ya titûnê di nav tofaneke nedîtî de mabû.

Tu nabêjî wê şevê, hinekan çend heb bîhok di nav zevîya wî de bi cî kiribûn. Ji ber bêhna bîhokan birek beraz jî çiyê xwe berdabûn nav zevîya tûtînê. Dema berazan xwe dabûn ser bêhna bîhokan, bi şîrn û qîlên xwe yê dirêj zêvî jî serî heta binî li bin guhê hev xistibûn. Hingî berazan şîrnên xwe xistibûn bin axê û li bîhokan geriyabûn, mîna ku zêvî bi gîsin hatibe cot kirin hemû tayên titûnê jî binî ve hatibûn hilkirin. Êdî wisa li zeviyê hatibû ku şaxek titûnê jî li ser koka xwe nemabû. Tev hatibûn rûçikandin û hilqetandin.

Ji ber vê jî dema çavên Miho li vê ecêba nedîtî ket hiş di serî de nema. Çavên wî wekî yên gayekî fireh bibûn û ji qehran hilma xwe jî qûna xwe berdida. Mîna ku ispîrto vexwaribe çavên wî jî xwînê sor bibûn û agir jê dipekiyan. Ji kerba porê xwe dirûçikand û êdî nizanibû ka ew ê çi bike. Hew mabû ku dil jê biçe.

Kesî nedizani ka ev xezeba ecêb çawa hatiye serê Miho. Her kesî digot: “Xwedê jê stendiye, ev tev belayên gunehên wî ne!” Bi rastî jî gunehên wî ne hindik bûn, êdî qûş lê qetiyabû. Gotina, “tu çi biçînî, tê wî hilînî” ne dûrî rewşa Miho bû. Îcar hîn ji ser vê bûyerê zêde wext nebihûrîbû ku felekê berên tîrên xwe carek din da ser Miho û kumê xwe li serê wî çep vegeand. Şevê deriyê axur û kozika wî hatin vekirin û pez û dewarên tê de tev berdan nav bexçe û bostanên wî. Her mîhekê bi aliyekî ve da nav bostan. Çawa ku çav li bostan xist xwîna canê wî tev di cî de cemidî. Mîna ku marek pê vedabe dinya li ber çavên wî zivirî. Ji êşa dilê xwe wekî hirçekî birîndar qareqara wî bû. Ji hêrs û aciziyan qiyamet radikir û kirasê xwe diçirand û bi kulman li serê xwe dida. Geh li du pez baz bazdida ku wan derxe û geh jî wekî hirçekî êrîş û rikêfî jin û zarokên xwe dikir û diket ser dilê wan. Wekî tenê sucdar ew bin, xezeba xwe bi ser wan de dibarand.

Heke ne ji çavnebarî û tîrsa malê dinyayê bûya dê di wê kêliyê de tevahî pez û dewarên xwe bidana ber devê kêran. Lê ji bar ku miriyê malê xwe bû ev jî jê nedihat. Hingî bêhna wî teng bû hêrsa wî jî dilê wî difûriya. Êdî hew dikaribû xwe bigirtiya. Di dawiyê de bi wê hêrs rahişt kevirekî û bi şid avêt nav pez ku wan jî nav bostan derxe. Lê bi weşandina kevir re çû li golikê ket. Çaxa borînî bi golikê ket fehm kir ku lingê wê şikandiye. Vêna ew hîn bêtir qehirand û qapaxa serê wî avêt. Wekî cin lê ketibe kef bi ser devê wî ket.

Kesî nizanibû ka ji ber çi ev bobelat tev tîr serê Miho û kî vana ji bo çi dike. Lewra ji ahê hinan bêhaydar bûn. Nizanibûn ku xwedî û tîrxwarina goştê karxezalê di qirika wî de dimîne. Pêşyan beleheq ne gotibû, “ahê bizina kal, ji bizina bi qiloç re namîne!”

Wexta hîn zeraqa tavê neavêtibû, Zîwer berê xwe da nav rezên xwe. Riya wî bi ser golê diket. Dîtina ku dît, ji dûr ve xezalek û li pey wê jî du karxezal bi nazenîn ji jor ve xwe berdidin ser golê. Zîwer, di ciyê xwe de rûnişt û kete temaşeya wan. Di ber xwe de got: “Xwedê kir ku me ev gol ediland, heta niha navê wê “Gola Heriyê” bû, lê êdî navê wê bûye “Gola Xezalan” û keneke zirav li ser lêvên wî peyda bû û dilxweşiyekê xwe bera nav dilê wî da.

23 Rêbendan 2011



Dengvedana heyamekê

Şivan ZEREN

di leylana hişê min de
zarokek dimeşe li Gulxaneyê
di bin siya çinarên ku bi hev re qayîşê dikişînin
li ser riyeke ku her du aliyê wê bi beybûnên biharê,
bi binevşên narîn,
bi şilêrên rûbişîrîn
û bi gulên reng bi reng xemilandî...
bi avzêlekê re diherikin
xeyalên jengirtî
xeyalên tehma şekirên pembîşokê...
dengê bavê min ku ji mûsikaya tirkî
olan dida
her beyanê
bi kêfeke mezin min berkêşka xwe vedikir
xarên biriqok, hesteyên muxtaran, poşetek mûz, rismên lîstikvanên fûtbolê,
kevirên behrê...
yanê tevliheviya hêwirze bû gencîneya min
bêhneke têkilhev dida der
bi min pir xweş bû...

li baxçeyê pişt xaniyê me
mîrûyên ku bi rêz dimeşin
li ser qaşûla dara hiliyê
di nav geliyekî de rêwî ne...

amadekariya lîstika ximbil
li pişt qotîkê
û li pêşberî;
li ser axa maliştî
bi rêz rûniştibûn temaşevan
ez
ew
em
di bin siya darê de
bayekî bikelecan
baz dida...

Bizmarên li kolanan
 ku şimika min qul dikirin
 me di berdêla Coca Colayê didan hev
 bi kulekî,
 bi kotekî dimeşim
 ber bi mal ve
 nazîna min
 girîna min zêde dibû.
 di aşxaneyê de
 tiliyên diya min direqisîn
 di nav hevîrê kutilkan de
 bi tehma kedê...
 bapîrê min dihat malê
 bi teybetî jî di biharan de...
 şelwarekî reş lê,
 berçavkeke stûr li ser difnê,
 qeramaç di dêst de
 ez
 û
 ew
 li hember hev
 kaxiz diçûn û dihatin
 lê zêde fêlbaz bû
 ku biviya seh dikir
 neviya ker bû.

carinan saeta xwe ya kostekî derdixist
 lê dinêrî
 û dîsa dixist berîka xwe...

bi destekî bi guhê xwe dileyîst
 bi destê dî jî
 lingê xwe datanî ser çonga xwe,
 û difirkand
 îca dest bi çîroka jiyana xwe dikir
 hiş û dilê min ê biçûk dibir
 Cizîreke xeyalî,
 bajarekî;
 dûr
 û
 rengîn.
 filehên wê demê,
 jinebiya binîq,
 eşqiyayên li kêleka çiyayên Dicleyê,
 mirovên cur bi cur ...
 di perdeya sînema mejiyê min de
 dibûn dîmen.
 min dixwest qala bavê min bike
 îcar serê xwe dibir û dianî
 'Bavê te!...zehf serhişk bî..'

şev diket...
 li serê bîn
 doşeg datanîn,
 lihêf û balîf rast dibûn
 herkes diket nav nivînan
 jî bilî xweha min a ku çûye qedeh û silhiya avê bîne
 û galegalê dest pê dikir...

jî mizgefta ber mexberê
 banga melê dihat
 bi bêya hênîk re
 bi taya mirinê diketim
 çavên min li ezmên diman
 pê re
 du stêrk dibiriqîn
 'Leyla û Mecnûn'...
 çîroka wan digot diya min
 mîna findê ditemiriyên,
 xew li min giran dibû
 diqûtifim
 di himbêza diya xwe de

di xewnê de dibûm serdarê leşkeran
 bi serbilindî
 û
 bi cegereke pola
 min zîq li artêşa dijmin dinêrî
 ku bi hezaran kom bibûn li qada şer...
 bi awirên tûj min berê xwe dida mîrxasên pişt xwe
 û min dilîland
 kitê jî wan nehêlin!!!
 pey re
 li sihareke nûbişkivî
 şiyar dibûm...
 bi dengê dozerê
 û bi giriyê zarokekî re
 ditevizîn
 derbên birîna daran,
 perçiqîna beybûnan
 jiyana
 ku di nav baxçeyî de
 bêhn dida,
 difetisî...

dizanim jî wan heyama dûr ketime
 ber bi zemanekî bi heytehol
 û zemanekî bêhnçikiyayî ve
 bi xwe dihesim
 dişidînim hevsarê hespê zemên
 û ber bi çiyayên asê ve
 dibeznim...



Xaçepirsa dengbêj û dengbêjiyê

Amadekar: Hîlmî AKYOL

1- Ji dengbêjen jêr yê pêşîn tê zanîn kîjan e?

- a) Evdalê Zeynikê
- b) Dengbêj Gulê
- c) Dengbêj Ferzê
- d) Izêrê Mico

2- Izêrê Mico di nava gel de bi kîjan navî tê zanîn?

- a) Mîrê Stranê
- b) Mîrê Heyranokê
- c) Pîrê Stranê
- d) Pîrê Payizokê

3- Izêrê Mico ji kîjan herêma Kurdistanê ye?

- a) Herêma Serhedê
- b) Herêma Behdînan
- c) Herêma Botan
- d) Herêma Xerzan

4- Izêrê Mico dengbêjê kê bûye?

- a) Mala Cemîl Paşa
- b) Kor Husêyn Paşa
- c) Sêvdîn Paşa
- d) Bedirxan Beg

5- Destana bi nav û deng a kurdên Şengalê kîjan e?

- a) Binefşa Narîn
- b) Mem û Zîn
- c) Siyabend û Xecê
- d) Derwêşê Evdî

6- Evdalê Zeynê dengbêjê kîjan paşayî bûye?

- a) Kor Husêyn Paşa
- b) Mala Cemîl Paşa
- c) Surmelî Memed Paşa
- d) Sêvdîn Paşa

7- Evdalê Zeynikê ji bo kîjan dengbêjê/î çûye Rojhilat?

- a) Dengbêj Ferzê
- b) Dengbêj Gulê
- c) Şêx Silê
- d) Dengbêj Birê

8- Bajarê Cizîrê bi kîjan destan tê nasîn?

- a) Fatima Salih AXa
- b) Teyar û Derwêş
- c) Sêva Hecî
- d) Mem û Zîn

9- Çîroka Senem Xanim Li kîjan bajarî qewimiye?

- a) Bajarê Amedê
- b) Bajarê Mêrdînê
- c) Bajarê Mûşê
- d) Bajarê Rihayê

10- Li bajarê Farqînê bi navê Zembîlfiroş çi tê binavkirin?

- a) Taxa Zembîlfiroş
- b) Kaniya Zembîlfiroş
- c) Girê Zembîlfiroş
- d) Birca Zembîlfiroş

*Bersivên xaçepirsa ziman û rêzimanê kurdî:
1.C, 2.B, 3.C, 4.A, 5.C, 6.D, 7.A, 8.D, 9.B, 10.B,
11.C, 12.C, 13.C, 14.A, 15.B*